

# ANTOLOJIYA HELBESTÊN CÎHANÊ

Wergêr û Amadekar  
Xidir ÊSO



**ANTOLOJIYA  
HELBESTÊN CÎHANÊ**

---

**Wergêr û Amadekar  
Xidir ÊSO**

**Berg/Rûpelsazî**

Xidir Êso

**Çap/Weşan**

Arşîva Kurd

2016

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)

**XIDIR ÚSO**; di 01.04.1959'an de, li gundê Qanûn yê navçeya Qosara Mêrdînê ji dayik bûye. Dibistana seretayî heta pola çaran li gund, ya çar, pênc û dibistana navîn û amadeyî li navçeya Qosar qedand. Di 1976'an de ket nava rêxistin û tekoşîna rizgariya netewaya Kurd. Piştî derbeya leşkerî ya îlona 1980'yî li Tirkî çêbû, ji alî hêzên cûnta ve hat girtin û ji alî dadgeha leşkerî ve, bi dayina cezayê sermedî (muebbet), 7 sal li zîndana Amed û 8 salan jî li zîndanên Tirkî, bi giştî 15 salan di zîndanên de hat girtin.

Li zîndanê ji bo şermezerkirina bûyerên li Kurdistanê, bi taybetî êrîşa li ser Licê û şewitandina rewşenbîrên Elewî yên çep ku li Sêwazê qewimî, ket girevên birçîbûnê; pê re daxwiyaniyên çapemeniyê û yên li hember rayadarên dewleta Tirk bû egerên dozvekirinê. Ji bo ku li hember dozger û dadgehan parastina siyasî kir, du caran ceza xwar. Ji bo ku neçû leşkeriya Tirkî û cezayên xwe yên nuh ku li dadgeha bilind hat pejirandin ranezê, demekê li Tirkîyê firar ma, pişt re derket Ewropa û serî li mafê penaberiyê da.

## NAVEROK

**Pêşgotin/10**

**Pêşgotina Wergêr/12**

**A. Kadîr – Xem, Destên Te/13**

**A. Hîcrî Îzgoren – Qîrîn/14**

**Abdel Basit El Sûfî - Vî Mirovê Bi Kerb/17**

**Adnan Yucel - Zarokên Agir û Rojê/20**

**Adonîs (Alî Ahmadî Saîdî Eşber) – Aştî/25**

**Ahmed Arif - Li Girtîgehê Zû Dibe Êvar, Sî û Sê Gulle/27**

**Aiz`ing - Ji Hîroşîma re/33**

**Aleksa Şantîç - Welatê Min/35**

**Aleksandr Sergejevîç Pûşkîn - Di Kûrahiya Kanên Sibîrya de/36**

**Ali Bîçer - Li Çiyay Navnîşana Rojê Heye/37**

**Antonio Jacinto – Monangamba/43**

**Archibald Macleish - Miriyê Îspanî/45**

**Arthur Rimbaud – Ofelia/47**

**Atila Josef - Niştîmana Min/48**

**Augustîno Neto - Xatirxwestina Berî Veqetinê/50**

**Aziz Nesin – Bibexşîne/52**

**Baba Tahir Uryan – Dubeyt û Çarîn/53**

**Bekir Meriç - Li Te Geriyam, Ez Evîn im, Hevalê Aram Sitranekê Bêje Lo!/59**

**Bertolt Brecht - Pesnê Diyalektîkê, Gava Şer Dest Pê Dike Yên Li Dûr Agir Dipên, Karkerekî Xwende Dipirse, Qencî Bi Kêrî Çi Tê, Stran Ji Bo Yên Li Ber Wendakirina Dîlaweriya Xwe/65**

**Bêkes – Lawanên Welêt, Ey Mang, Nesrîn/69**

**Bulent Haydarî - Poşmaniya Yê Xwefiroti/72**

**Can Yucel - Gotina Bi Şewat/74**

- Cegerxwîn – Kîne Em/75**
- Cemal Sureyya - Ev Ya Me/82**
- Cesare Pavese - Dawiya Xeyalê/84**
- Charles Baudelaire - Mirina Evînan/86**
- Daniel Viglietti – Nasname/87**
- Dildar – Ey Reqîb, Mindalê Hîva, Lawê Kurd/88**
- Dogan Ceren – Nebê Hiş Ji Min Re/95**
- Edgar Allan Poe – Xeyalek/101**
- Edip Çelîk - Paceyên Mawzeran Xemgîn in, Xaneyên Deftera Min/102**
- Edîp Galin – Strana Azadîyê/106**
- Edith Thomas - Rabe û Bimeşe/108**
- Eduard Cote Lamus - Ji Bo Gundiyekî Mirî Dûrik/110**
- Ehmedê Xanî – Şîreta, Helbest, Her Dinalim, Textê Dîlber/111**
- Emer Xeyam – Çarîn/115**
- Emily Dickinson - Piraniya Şêtiyan Têgihîştina Herî Pîroz e, Mejî Ji Ezman Firehtir e/117**
- Ernesto Che Guevera - Ne Tişteki Din/119**
- Federico Garcia Lorca - Ji Bo Ava Dengizê Belîte, Hozan û Mirin/120**
- Feqiyê Teyran – Dîlber, Ez/122**
- Ferûh Faroxzad- Sitrana Evînê/127**
- Georgi Cagarov - Piştî Lêpîrsînê/130**
- Guillaume Apollinaire – Girêdan/131**
- Gunnar Ekelof - Ya Bi Payizê re hat/133**
- Hasan Huseyin - Tehlî Bi Me Bû Hingiv/135**
- Hejar Mukrîyanî – Her Kurd im, Strana Şagirtan, Firmêsk û Mey, Ferxika Niştîman/137**
- Ho Chi Minh - Ji “Rojaneya Zîndanê”/140**
- Îlya Ehrenburg - Li Nagazakî Baran /142**
- Îtalo Volpe - Alên Aştiyê/144**

- Îvan Vazov** - Tenê Ronê ye Ya Bêdawî/**145**
- Jacques Prevert** - Hezkirin Dibişire/**147**
- Janis Raynis** - Kaniya Taqeta Min/**148**
- Jaroslav Seifert** – Bênav/**149**
- Javier Heraud** - Gotina Gerîlla/**150**
- Johann Wolfgang von Goethe** - Nêzîkbûna Yarê/**151**
- Jorge Carrera Andrade** - Ji Bo Çivîk Bi Kar Bînin Serpêhatiya Jiyanê/**152**
- Jorge Rebelo** - Helbesta Tekoşerekî/**154**
- Jose Marti** - Dixwazim Bi Yek Hêsanîyê Bimirim, Gava Bimirim/**156**
- Joseph Kessel – Maurice Druon** - Partîzanino / Strana Rizgariyê/**157**
- Konstantin Kavafis** – Dîwar, Li Hêvîya Barbaran/**159**
- Kurt Tucholsky** - Aramî û Sazûman/**161**
- Langston Hughes** - Reşik im Ez/**163**
- Lokman Kurtay** – Gotin, Mirin/**165**
- Louis Aragon** - Di Bin Îşkencê de Balada yê Stranê Dibêje, Afîşa Sor/**167**
- Louise Gareau Des Bois** - Welatê Min Yê Rojane/**171**
- Luis Nieto** - Ev Stran Ji Mêrxasên Şoreşê Re Hatiye Gorîkirin/**173**
- Mahmûd Derwîş** - Strana Kûba/**175**
- Mahmûd Sobh** - Êvarî Gundê Min/**177**
- Marcos Ana** – Jiyan, Şîrove Dikim/**179**
- Mazîsî Kûnene** – Qîrîn/**182**
- Mbella Sonne Dîpoko** – Jan/**183**
- M. Can Azbay** – Name/**185**
- Melayê Bateyî** - Zembîl Firoş, Qiblagaha Aşiqan/**187**
- Melayê Cizîrî** – Dil Ji Min Bir/**191**
- Mela Mehemed Koyî** – Destê Hev Bigirin, Jin, Qezenca Şêxê Me/**196**
- M. F. Dei Anang** - Berbi Kîjan Çarenûsê Ey Afrîqa/**199**
- Mîgjenî (Millosh Gjergj Nikolla)** - Em Zarokên Vî Qirnê Nû/**202**

- Miguel Hernandez** - Bayê Gel Min Hildigire/**204**
- Mûhammed El Feytûrî** - Bû Sibeh/**207**
- Muslum Yucel** - Binêrim Li Te, Kendalên Nêrgizê/**209**
- Nalî** – Eger Nemirim/**213**
- Nazim Hîkmet** - Li Ser Serketinê, Strana Yên Royê Vedixwin/**214**
- Neofîtos Talyotîs** - Lêvegerînên Li Neşe Yaşîn/**219**
- Nikola Vaptsarov** - Berî Mirinê, Sitrana Evînê/**221**
- Nîkolay Nekrasof** – Bizarvan/**223**
- Nordahl Grieg** - Stûna Ala Merasîmê/**222**
- Octavio Paz** - Kûzê Şikestî, Jbîrkin, Li Dernê ji Evînê jî Wêde/**226**
- Orhan Velî** - Ji Bo We/**232**
- Osman Sebrî** – Merşa aşîtiyê, Durû, Newroz, Ala Rengîn/**234**
- Otto D`sola** - Berî Hatina Firokên ku Bajar Şewitandin/**239**
- Otto Rene Castîllo** - Welatê Min Ka Em Biçin/**240**
- Pablo Nerûda** - Hin Tiştan Eşkere Dikim, Di Dil de ji Spanya, Lîwaya Navnetewî\* Ya Ketina Madrîdê, Hertim, Strana Genim, Yên Neyar/**242**
- Paul Eluard** – Azadî, Gabriêl Perî, Ronahî, Xwişkên Hêviyê/**251**
- Paul Verlaine** - Ezman Werê Şîn/**256**
- Paul Valery** - Daristana Dost/**257**
- Pîremêrd** – Newroz, Şehîd Hatin, Tenê Dilsozî, Besteka Kurdî/**258**
- Pîr Sûltan Abdal** - Vebin Zîndan/**261**
- Qadir Koyî** – Heta ku li Hev Neyên Qebîlên Kurdan, Tu Werê Hînê Fen Be, Her Kurd e Qisa Bavê Xwe Nizane, Her Kurd e Li Nav Hemû Milet, Hakim û Mîrên Kurdistanê/**262**
- QedrîCan**-Dadê, Reşbelek, Gula Sor, Karwanê Me, Zîndana Mezê/**266**
- Rabîndranath Tagore** – Ji Min Re Bêje Hêsiro (Lawij), Stêrk, Wendanebûn/**272**
- Rainer Maria Rîlke** – Roja Payizê/**274**

**Refîk Durbaş – Qelaço/276**

**Renas Jiyan – Janya/277**

**Rene Depestre - Cewherê Reş/279**

**Resûl Riza - Ji Destê Min Bê/281**

**Robert Desnos - Kulîlkên Heyva Gulanê/283**

**Samîh El-Qasim - Ji Rojanê, Di Sedsala Bîstan/284**

**Suleyman Danişman - Ji Nuva Dengê Lîngan/286**

**Şêrko Bêkes - Helebçe, Evîna Mezintîrîn, Bajar, Hejmartin, Evîn, Ji Bo 8 ê Adarê, Şîret/288**

**Shlomo Tannî - Yên Birîndar/292**

**Şêx Riza Telebanî - Li Bîra Min Tê, Qehpejineke Mamê Min/294**

**Şêx Selam Ahmed Azebanî – Kizîna Derdê Cotkar/296**

**Vaselîn Andreyev – Raman/298**

**Victor Hugo - Ji bo Mirov Bigirî Divê Ji Çavan Hêsir Bibarin?/299**

**Vladimir Vladimiroviç Mayakovsky -Ewrekî Bi Derpî, Gohdar Bike!/300**

**Wefayî – Ji Dîwanê/303**

**William Blake - Ax Berbiro/305**

**William Shakespeare– Ditirsîn/306**

**Xelîl Cibran - Strana Mirov/307**

**Yannîs Rîtsos – Aştî/309**

**Yevgenî Yevtuşenko - Kulîlk û Gulle/312**

**Yilmaz Guney - Canê, Yarê, Dilê/315**

**Yilmaz Odabaşı - Hey Jiyan/316**

**Yusuf Hayaloğlu - Êşên Mezin/118**



## PÊŞGOTIN

### Mirov bi tenê xwe najî

Bilindbûna çand û dewlemendiya zimanê neteweyekê, tenê bi afirandina zargotin û hunermendiya nava wê neteweyê nayê pîvan û nayê ravekirin. Pîvana bilindbûna çanda neteweyekê hinekî jî; bi çanda gelên din re çiqas xwe gihandiye hev û bûye yek ve girêdayî ye. Tu gel nîn e ku li hember çanda gelên din guhên xwe girtîbe û di warê çandî de karîbûye pêşveçûnek grîng xuya bike.

Di dîroka cîhanê de çand, bi pêşveçûna sermiyandariyê re geş- bûnîya xwe ya herî xurt xuya kirîye. Her çend sermiyandariyê vêya bi armanca mijokdariyê pêk anîye jî, bi daxwaza xwe an bê daxwaza xwe, di navbêna gelan de, dibe mîna guhêzkarekî birin û anîna çandê. Çimkî sermiyandarî, di navbêna parzemînan, welat û gelan de, torek ragihandinê bi xwe re anîye. Êdî her gel an her kes, tiştêkî ku li rûyê cîhanê hatibe afirandin, ji pêwîstîya ku wî tiştî ji nû ve biafirîne xelas dibe. Dibe xwediyê hêjayiyên ku li derên din hatine afirandin. Loma qeysa ku tiştêkî nîn e biafirîne û li berhemên cîhanê afirandinên nû zêde bike bi dest dixe.

Mîna gelekî ku îro tekoşîna rizgarîya xwe ya neteweyî dide, ku gelê Kurd hêjayiyên xwe yên neteweyî û navneteweyî bi hev nekelîne, gihîştina serketinek payîdar zehf zahmet e. Ji bo ku mirov xwe bigihîne hemdemîyek cîhanî û wê zevt bike, ji pergala herî girîng yek jê jî bêşik çand e û ya din jî huner e. Ji alîkî de, gava ku em hêjayiyên xwe yên çandî û hunerî li cîhanê belav bikin, ji aliyê din ve jî divê em çand û hunerên cîhanê pêşkêşî bîr û bala gelê xwe bikin û bi wî awayî jî, divê em hêjayiyên xwe yên estetîk û neteweyî dewlemendtir bikin. Lewra T. Mann dibêje: "Mirov, bi tenê jiyana xwe ya ferdî najî, di heman demê de, bi zanîn an nezanîn, jiyana dema xwe û jiyana hemdemên xwe jî dijî." Gelê Kurd ku tekoşîna serxwebûnê dide, ji vêya jî wêdetir, jiyana yên berî xwe û yên wê piştî wî jî bijîn, bi awayekî dijî.

Belê, gava ku ji aliyekî ve em çanda xwe ya xwerû biafirînin, ji alî din ve jî, divê em çanda gelên din bikişînin nava xwe. Rêyek ji rêyên sereke jî, bêşik ku berhemên wan yê hunerî û zargotinî ku em wergerînin zimanê xwe.

Xasma, bi wergerandinên Firat Cewerî yên hêja ku ji zargotina Rûs bi xebata xwe ya ku dixwaze çand û zimanê Kurdî dewlemend bike, bi vê antolojiya helbestan ya wergêriyê ya Xidir Êso jî kûrahiyek bêtir qezenc kirîye.

Bêşik ji alî her xwendekarî, bi hêsanî wê bê têgihîştin ku ev antolojiya di destê me de ye, weke ewçend tê xwendin bi hêsanî nehatiye amadekirin. Lê di demajoya vê xebatê de, tengasî û zahmetiyên ku Xidir Êso kişandiye, ji vê têgehîştinê bi gelekî wêde ye... Tê zanîn ku li cem me, bingehek wergêriyê ya rehdar nîn e. Mîna gelek

waran, di warê wergerandinê de jî bi destlepkê em pêşve diçin. Tevlî ku rewşa me werê ye jî, berhemên di vî warî de derketine holê, qet jî ne xerab in. Ma tahn û kêfxweşiya xwendina Çexof, Pûşkîn, Aragon, Nerûda û dêwên zargotinê yên mîna wan, bi Kurdî hûn didin bala xwe?... Her werger, (xasma di warê helbestê de) bi xwe re hinek pirsgirêkan jî tîne. Pirsgirêkên wergêrîyê bûyereke aşîkar e, ku li tevaya cîhanê gengeşiya wê tê kirin û tu demê jî safî nebûye... Hela ji bo yên mîna me ku hîn li destpêka vê xebatê ne, divê pirsgirêkên wergerandinê hîn xwezayî bîn dîtin.

Ev antolojiya wergerî, ku di nav wê de gelek helbest hene û pi- ranîya van helbestan jî, helbestên hozanên cîhanê yên sereke û bi nav û deng in, tam du sal û nîvê dostê min yê delal Xidir ÛSO sitendîye. Mîna ku bi diran û nenûkên xwe elmasekî bineqîşîne, hûrgiran û bi viyanek nebes xebitîye. Pêwîst dîtiye ku her helbestê gelek caran di çav re derbas bike. Vê xebata xwe, ne li odeyek germ û li ser maseya xwe, ji destê yara xwe çay an qahwe girt û pêk anî, li navbêna çardîwarên zîndanê û di hundir têkoşînek zehf dijwar de ajotîye. Ji bo ku ez li parekê vê xebatê bûm şahid, loma ez dizanim ku carina ji bo gotinekê an ristekê, bi rojan dihizirî û lêkolîn dikir... Di destê wî de xweşikî, ne helbestên wergerandî Kurdî hebûn ku ji bo bi wergerên xwe re beranber bike û ne jî ferhengê Kurdî ya bi naverok û berfireh hebû ku jê fêde bigirta.

Ked afirandêr e: di demajoya kedê de îlham jî, zanîn jî, yekûna zanîn û hostetiyê jî tê bidestxistin. Di vî warî de, beramberiya keda mirovê afirandêr, serfirazî jî bê şik e. Xidir jî di dawiyê de serfiraz bûye; bi Kurdiyê zelal û safî, li helbest û çanda Kurdî berhemek herî giranbûha zêde kiriye.

Bi gumana min, kêmasiya vê atolojiyê ya girîng, Xidir ev helbestana (ji xeynê yên bi Tirkî) ne rasterê ji zîmanê wan, lê mecbûr maye ku ji wergerên zîmanê dudoya wergerandiye Kurdî... Gotinek pêşiyên Rûsan dibêje ku; "Wergerandin mîna jinê ye, ya bedew dilsoz nabe, ya dilsoz jî bedew nabe." Belê piraniyên van helbestan, ji bo ku ne ji zîmanê xwe yên orjînal hatine wergerandin, texmînkirina dilsozî an nedilsoziya wan çetin e, lê bedewiya wan bê şik e...

Pûşper 1995

Ermenek

Alî BÎÇER

## PÊŞGOTINA WERGÊR

Gelî xwendevanên delal, min bi armanca salvegera çêbûn û sala pîrozbayiya helbestvanê nemir Ehmedê Xanî dest bi karê amadekirina vê antolojiyê kir. Rewşenbîr û hunermendên Kurd, bi çalakîyên çandî û afirandina berhemên zargotinî û pîşeyî, beşdarî pîrozkirina vê salvegerê bûn. Loma min jî li gorî hêza xwe, tevî hemû astengan, li gorî merc û derfetên zîndanê, bi amadekirina vê antolojiya helbestan, min xwest ez jî beşdarî pîrozkirina vê salê bibim.

Daxwaza min amadekirina antolojiyek taybet bû. Qonaxa ku îro gelê Kurd tê de ye, min da ber çavê xwe û loma min ji hozanên cîhanê yê hemdem û pêşketî, bi giranî helbestên di derbarên jiyana, evîn, kul û keder, têkoşîn, têkçûn û serketinên gelan û neteweyên çî azad, çî bindest hilbijart. Dibe ku ji xeynî vana, gelek hozanên hêja, bi nav û deng yê din hebin ku min di vê pirtûkê de cîh nedabe berhemên wan, lê ezê xebata xwe ya di vî warî de her berdewam bikim.

Helbet ji bo gelê Kurd û zimanê wî Kurdî pêşkeve, wergêrandina hemû berhemên cîhanê yê nivîskî pêwîst in. Ji bo pêşketinê, zanîn pêwîst e; ji bo gehîştina zanînê, zimanekî xurt pêwîst e; zimanekî xurt nebe, raman û xeyalên xurt jî nabin; ger em bê raman û bê xeyal bin, emê nezan û bê huner jî bin...

9 Gulan 1995

Xidir ÎSO



### **A.Kadîr**

1917 Îstanbûl – 01 Adar 1985 Îstanbûl Navê wî yê rastî Îbrahîm Abdulkadir Meriçboya ye.

### **XEM**

Qet tu azadiya me nîn e,  
 Qet tu azadiya me,  
 Ne xebat, ne axaftin, ne pevşabûn,  
 Tu li wira bi sînga xwe ve bidewisîne  
 Û bimîne xema herî mezin,  
 Ez li vira xema herî mezin bikişînim,  
 Pêwîstî nan, pêwîstî azadiyê, pêwîstî te  
 Tu li wira mîna zerdaliyek ji şaxa xwe jêkirî bimîne,  
 Ez li vira mîna şaxek bêzerdalî bimînim.


### **DESTÊN TE**

Ji destên min naçe şopa destên te  
 Gava li sîrenên xwe dixist tenêtî,  
 Hestên bê te jî bêwate ye  
 Çawa te xist nava me  
 Ewqas çiya deşt û derya  
 Li piyên min digerin hêsirên min  
 Hesret dîsa rêz bi rêz  
 Av naherikin

Pevşabûn naşewitîne canê me.

Ez nêçîrvanê xemê me tu zanî  
Van gazinan ji xwe dikim  
Tu dilê xwe negire  
Bi tenê jî pir dikim sirê  
Şev bangî min dike binêr  
Ezê niha têkevim rêgeh û kolanan  
Di dilê min de valahiyek derengmayî  
Li destên min şopa destên te.

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### A. Hîcrî Îzgoren

*Di 1950 de li Sêwregê ji dayikê bû. Li Amedê Enstîtuya Perwerdeyê beşa Zaniyariya Civakî qedand. Ji ber pirtûka wî ya pêşî "Aciyla Dîrî" hat weşandin, di 1981'ê de li Amedê hat girtin.*

### QÎRÎN

Ji min re mohrên bi xwîn man  
 Ji bazirganê wê dîrokê  
 Zinar, qîrîn û tarîfên mirinê

Ji hemû çîrokên min pê zanîbû jan civandin  
 Min bi beskura xwe daliqand

Min jiyana got jê re stargeh mijand  
 Min hemû bêje anî rû hev bi agir re  
 Min nikarîbû bigota dojecha rojan

Di nûçeyên ajansan de gemarî dibe mirovayî  
 Hemû şanazî di sêdarê de bi lez pîr dibin  
 Zarok

Evîna têkçûyî xistiye ala xwe  
 Şevan ji bîr kirine pevşabûnî

Ji bo di Xwedayan bigerînim vê şêtiya  
 Kun dikim gemaroya evînê  
 Ji nû de xwe davêjim rêyan

Bila ji canê te vemalin êdî qîrîn  
 Dikişînim dema niha hemû lêkeran  
 Di lênerînên te de min pir danî li zinaran  
 Dibim hevdeng û dikevim çavê dunyayê  
 Qîrînek taze me di vê demsala kontra de  
 Her kesekî ku hinekî "qisas" e  
 Ez cînayeteke "nediyar" im

Ji min re tevkujî man  
 Ji wî bazirganê dîrokê  
 Lorîn nefî û sûretê muxbiran

Hemû têkçûnên xwe min qeyd kir  
 Mirin bejin dide êdî  
 Li erdên bi xeyalên xwe min avda  
 Li çavên te min kilît kir hemû xem û xeyal

## SÛRÎYE



**ABDAL BASIT EL-SUFI**

1931 Humus -20 Tîrmeh 1960 Humus

### VÎ MIROVÊ BI KERB

Hûn dibêjin wî vala kir kîna xwe  
 Bi ba de berada zincîrên xwe  
 Hûn dibêjin ku bi zendên xwe  
 Da royê îşareta xwe  
 Û soza hevdîtîne  
 Li hêviya wî ye ro  
 Hûn dibêjin dîl wê karibe li mîr bixe  
 Li zinarê rastiyê  
 Biçike li hember wî  
 Ji tofanê bilindtir  
 Û wê karibe bistirê ji êgir nanê xwe yê rojane  
 Dibêjin wî çirand jana xwe  
 Ji perçên çirandî çêkir dilê xwe  
 Kerî  
 Wê çawa karibe şivanê xwe bibe selexanê  
 Dîl  
 Wê çawa karibe tariya kevn belav bike  
 Wê çawa karibe celladê xwe bide ber şîmaqan bi destên xwe  
 Di histuyê wî de zincîr



Li laşê wî sorahiyên kamçiyân  
 Kî kare serî hilde  
 Lê belê hosteyê tiştên nebûyî ye gel  
 Sazgêriya nav û deng e mêrxasiya wî  
 Merheba ji vî mirovê bi kerb re  
 Ji yê li çolên Cezayîrê re  
 Merheba ji kerba wî ya xuroşbûyî re  
 Ji serhildeyê Başûr re merheba  
 Ku zîn li hespê heyfê dixê  
 Merheba ji birîndarê Iraqê re  
 Şîlmaq davêt xwe firoşê Bexdadê  
 Ji bo safîkirina welatê xwe  
 Merheba ji zendên li hesin xistî re  
 Ji kerba hesinkar re merheba  
 Merheba ji dilên tije, xuruşî û coşiyayî re  
 Ji yên kêfa xwe li zinaran kirin girêk re merheba  
 Merheba ji palmiya pêşî hat çikandin re di xîzên kendavê de


Ji yê berê neviyên xwe ber bi pêşiyên Ereban vedike  
 Ji yê ji welatê bengî re gulan diçîne  
 Ji hozanê gulan dipêçe re merheba  
 Welat  
 Qîrîna wî ya pêşî qîrîna bi fêz bû  
 Welat  
 Tevgera wî ya pêşî sînorê xwe yê pişt asoyê kûr kir  
 Pêngava pîrozwer ya yezdanê bi tenê  
 Xaka bi xwîn raçandî  
 Xaka li pêşberî royê qutikê xwe vekir  
 Li ruyê te yê bîhnxweşik  
 Mêrgên te, gîhayên te yên teze  
 Bihara te, rêyên te yên hênik  
 Dawetan amade dikin ji bîhna xwe  
 Kaş dike sîdan perê lîça avê  
 Li zozanê te kûr kûr difikire gelî  
 Welat  
 Yên zarokên te bera heriyê dan  
 Tenê vî namerdî disitirîne Rûreş  
 Kefenê te lewitand  
 Rûreş neviyên te binêrd kirin

We xwest laşê we bibe zincîr

Di qirikê de bimîne strana mirovên azad  
Xwarî heriyê bibe eniya mirovê azad

Lê belê vay em  
Çiyayê bilind yê hilaw in  
Em zarokên neteweya nû ne  
Mîlyon can in em

Li ser kevirê qurbanê ku bayê zîz dimînin eniyên me  
Li dûrî birûskê tê hiskirin dengvedana dengê me  
Ji bo pevçûnê bangî bahozên har dikin destên me  
Destên me rêz dike  
Di dengiza serketinê de leşker  
Bibin agir emê di çavên tariyan de  
Di yên xerabiyê de ku herdem ji kokê tê birîn  
Hûn  
Di navbêna demên karbidest  
Ji mirovan heta mirovan  
Bi xwefiroşên xwe ve  
Di hişên gelan de  
Şev in hûn



**ADNAN yUCeL**

*27 Adar 1953 Alezîz – 24 Tîrmeh 2002*

### **ZAROKÊN AGIR Û ROJÊ**

Li xaka agir û rojê  
 Berî Adem jî diherikîn wan çemana  
 Zilamên li dûv Adem dimeşîyan  
 Hemû tiştên qewimîn gelekî pişt re dîtin

Berî ku bibin zarokên agir  
 Zarokên Şamaş bûn  
 Li alîkî xwêdan dikeliya li argûnê wan  
 Li alîkî jî di dilê wan de hogirî  
 Hatî li nava du çeman sekinîn  
 Ji her yekî re qursek por  
 Û qurbanek gorî kirin

Bûn robarekî ji rohnîyê  
 Ber bi derya gelan diherikîn

Ji çeman yekî tov dida axê  
 Yê din çiya quldikir rê vedikir

Û Şamaş li ezman şemlek bû  
 Di dilê hevbeş ê herdu çeman de pîroz  
 Di zimanê hevbeş ê herdu çeman de xawên bû

Çiya tunebû ku derkeve ser wî  
 Ji bo bi zimanê dar û pelan  
 Bersîv bidin dengê xwedê  
 Pêşiyên Medîyan ramiyan  
 Dengê xwe danîn ser bijiyê ba  
 Agedarî dan hemû gelan  
 Di rêûresmeke pîroz berî şevqê  
 Ji dilûcan bûn yek  
 Çiyayê çêkirî bilindkirin li rûyê erdê  
 Navê wan “zîgurrat” danîn  
 Hemî gelên nav du çeman  
 Bi hev re yek gotin gotin  
 Di her rêûresmê de Xwedawend Nînsûn  
 Wek qasid şandin ba Şamaş

Pêşiyên Medan ji ku zanîbûn ku  
 Çiyayên çêkirî naşibin yên rastî  
 Li çiyayên tazî çivîk bi hev şa nabin  
 Li xewleyên wan kulîlk bi hev nakenin  
 Li berwarên wan dar aj nadîn  
 Ji ku zanîbûn ku  
 Xwedayê hevbeş yê şeş gelan  
 Bersîv nade dengê çiyayên çêkirî

Ji bo Zîgurrat bişibe çiya  
 Ji bo Şamaş hêrs nebe û ronîya xwe nebire  
 Ji bo Nînsûn negirî û xema nexwe  
 Çinarên mezin çikandin li yekê  
 Li yê herî mezin ku li Babîl bû  
 Çamên gumreh  
 Hinarên ji rengê agir çandin

Zilamên li dûv Adem dimeşîyan  
 Vana tev pişt re dîtîn  
 Û ji çiyayê çêkirî re  
 Gotin “Baxçeyê Daliqandî yê Babîlê”

Ji wê rojê pêde pêşiyên Medan  
 Deng dan dengê Şamaş  
 Hezar dahol  
 Hezar zengil lêdan heta sibehan  
 Hêsirên Nînsûn sekinandin  
 Û bi Magiyê Med yê herî zana  
 Gotinên herî pîroz dan gotin

Ax Medya-dengê ar û rojê  
 Derya mîtolojîk ya robarê şeş gelan  
 Çend car tu zuha bû û ji nû de çoşiya  
 Tevlî çemên din bû û li xwe geriya  
 Tu bû Îskît  
 Tu bû Hîtît  
 Hespên Îşûva yên serberdayî digeriyan  
 Pêşî te bi wan dakişandin erebeyên şer  
 Te Baxên Babîlê yên daliqandî  
 Kelatên Ûrartû yên li çiyên ava kir  
 Û te li Asûr serî hilda li ber zulmê  
 Bi zimanê êgir serhildan xist dîrokê

Sedsal dilopek ji ava te ye  
 Êş û jan tev ristek ji destanê te ye  
 Bi şadî-evîn û kovanên xwe  
 Bi lorîn-lîstik û stranên xwe  
 Tu ye ku derya mezin ya gelan e  
 Piştî çar hezar sal jî Şamaş  
 Di zimanê te yê bêwar de hîna “şem” e

Ax olên wan delaliyan ji holê radikir  
 Cinên ku şûrê zordariyê xistin  
 Serdema zarotiya mirovahiyê  
 Yên li ser navê Xweda gel kirin bende  
 Û rikên ku keyxan kirin Xweda  
 Rûyê erdê sînor bi sînor  
 Rûyê ezman stêr bi stêr parkirin  
 Di rêûresma Xwedabûna her keyxanî  
 Bir bi bir mirov xwarin  
 Li navbêna du çeman  
 Heyv tarî kirin û roj vemirandin  
 Û sibehekê li Baxçê Babîl yê daliqandî

Xwedawend Nînsûn di tariyê de fetisandin  
 Di nava du çeman de ji bo hemû çeman  
 Cuda cuda ol dan wan  
 Û ji bo çemê Medya gotin “Zerduşt”  
 Li ser qehfikên bi navê “Awesta”  
 Rêûrêbazên bi navê “gatha” şandin  
 Ji dêvla rojê agir rêdan

Navbêna du çeman  
 Ji serî heta binî şewatek e êdî  
 Ji ku zanibin pêşiyên Medan  
 Nînsûn çeng bûye ji tariyan  
 Li serê pêlên bi kef siwar bûye

Di destekî wê de perê ezman  
 Di destekî wê de derya  
 Derketiye rêwîtiya Grek ya hezarsale  
 Di hezarsalî de çendîn Xwedawend welidand  
 Ji (a)stêrên perê ezman Asterte  
 Ji kefên deryayê Afrodit çêbûye  
 Ji Fenîke heta Troya hemû perav  
 Bi rohniya Şamaş ya venamire stiraye  
 Piştî hezar salî li Greka kevn  
 Ji pêlan pengiziye bûye Thetîs  
 Ji du çeman û ji Şamaş dût  
 Bi çendîn Xwedayan şîrejiyan mijandiye  
 Û li Olymposan gihîşt zîgurrata xwe  
 Yê li delavê Arşîpel bilind bûbû  
 Yanî li çiyayên rastî  
 Wê bilindiya Xwedayî ku rê nade kesî

Gava dengê du çeman li hewa bû yek  
 Ji erdê deng bilind bûn şevêkê  
 Li ser navê başî û xerabiyê  
 Efsaneyek ku ji qehfikan hat xwendin

Zerduşt rahîbekî Hurmuz bû  
 Mazda mirovekî zangirt nûsaz  
 Û Magiyê Medî yê herî pîroz bû  
 Di şerê bê dawî yê başî û xerabiyê de  
 Dengê efsûnî ji agir yê qenciyê bû

Bira raman baş bê ramandin  
Gotin baş bê gotin  
Kar baş bê kirin digot  
Pişt re mîna hatibû ji tariyekê  
Ber bi tariyek din ve diçû  
Û piştî her çûnê  
Ji bo ku tarî biçire li dûv wî  
Ber bi rojê de agirek bilind dibû

## SÛRÎYE



ADONÎS (Alî Ahmadî Saîdî Eşber)

1.1.1930 Sûrîye Lazkîyê Qassabîn

## AŞTÎ

ji rûyên di tenêtîya çolê pêşve diçin  
ji Rojhilata xwe bi gîha û agir pêçaye

ji axa ku deryayê şuştîye  
û ji evîna wê re aşî

baranên te dan min tazîtîya te ya sermest  
ji min re xwe dîke gorî brûsk  
di himbêza min de sitewîya zeman  
binêr va ye birqa Rojhilat xwîna min  
mîna avê min bikêşe û wenda bibe  
min wenda bike di kortên bi dengvedan û brûskê  
mîna avê min bikêşe bi laşê min binixume  
agirê min nîrengî ye û stêr e  
hêl birîna min e  
vekîte dikim  
stêrekê vekîte dikim  
wêneyê wê xêz dikim  
welatê min mişext e li welatê min  
vekîte dikim stêra wî xêz kir  
di şopên lingên rojên têkçûyî de



hey xwelîya gotinê  
ma di şeva te de  
zarokêî din yê dîroka min heye?

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



**AHMED ARÎF**

21 Nîsan 1927 Amed 1991 Ankara

### LI GIRTÎGEHÊ ZÛ DIBE ÊVAR

Li girtîgehê zû dibe êvar  
Ejderha be fêde nake.  
Ne di şer de hunerê te,  
Ne jî tu ciwanekî dil çetelî be,  
Fêde nake, ya hêdî hêdî nava te dadigire,  
Radihêje û dibe hesretê.

Li girtîgehê zû dibe êvar  
Dadikeve, heft şûrikên hesin,  
Li heft deriyan.  
Ji nişka de, kelogirî dibe baxçe  
Li hember jêrî dîwêr.  
Sê şax şahiya şevê,  
Sê kok binevşa belek...

Di yek evîndariya tirsehêz de ye  
Li ezman ewr, di şaxê de mişmiş.  
Dest pê dike diltengiya dîlbûnê.  
Bêhtengiya tarî...  
Bûka Kurdan dibêje yek di nêvkoyê de  
Ez jî di pêwanê de me li binya ranzeyan  
Û her tim tiştên ku nebin dihizirim,

Pêkenîn, xeşîm, naşiyane...

Bêm kuştin wenda bibim dibêjim,  
 Şilfitazî, di şerekî de.  
 Bi mêranî be dixwazim,  
 Dostanî jî, dijminahî jî.  
 Yek jê jî nabe, halbûkî,  
 Singo li devê tivingê dikevin.  
 Dest pê dike cendirme dewriyeya şevê...

Bi hêrs diçerxînim niftikê...  
 Di bêhna pêşî de nêvî dibe cixareya min,  
 Dûyekî distînim, bi giranî.  
 Zanim, tê bêjî "Ma tu jî?"  
 Lê li girtîgehê zû dibe êvar,  
 Ji te hez dikim,  
 Wek dîhnan...

### SÎ Û SÊ GULLE

1.  
 Ev çiya çiyayê Mengerê ye  
 Di cihê berbang lê dide li Wanê  
 Ev çiya çêlika Nemrûd e  
 Di cihê berbang lê dide li hember Nemrûd  
 Alîkî te aşît digire, asoya Qafqas e  
 Alîkî te secade milkê Ecem e  
 Li bilindahiyên goşiyên qeşê  
 Kevokên revok li serê kaniyan  
 Û keriyê xezalan,  
 Taximê kewan...

Mêrxasî nayê înkare  
 Di şerê yeko yeko de têk neçûn  
 Ji hezar salan û virde, gedê vira  
 Xebera werin em ji ku bidin  
 Ne refê qulingaye ev  
 Ne fala stêrê ye li ezman  
 Dilê bi sî û sê gulleyan  
 Sî û sê kaniyên xwînê  
 Naherike,

Bûye gol li vî çiyayî...

2.

Kivroşkek rabû ji binê kaş  
Piştta wê bozbelek  
Zikê wê şîrsipî  
Xerîb, ducanî, kivroşkek çiya  
Dil di dev de werê belangaz  
Mirov tîne tobeyê  
Xalî bû, xalî bûn dem  
Şeveqek şilfî tazî, bêqusûr bû

Nerî ji sî û sisiyan yekî  
Di zik de valahiya birçîtiyê ya giran  
Por û rîh bihustek  
Li beskura wî sipîh,  
Nerî milê wî birîndar  
Mêrxasekî dil dojah,  
Yek li kevroşka reben,  
Yek li şiparan.

Ket bîrê filînta wî ya narîn,  
Di bin balîfê de xeyidiye,  
Ket, caniya ji deşta Heranê anî bû  
Perçemê wê bi şînmorî  
Enîbeş  
Sê simên wê sipî,  
Meşa wê tolaz, çeleng,  
Hespa seglawî, şê.  
Çawa firiyabû li pêşiya Xozatê!

Aniha werê neçar û girêdayî,  
Werê li pişt wî lûlak sar  
Nebûwaya,  
Karîbû xwe bavêta bilindahiyên...

Ev çiyên biraçiyên e, qedrê dizanin,  
Xwedê heyê mirov fedîkar dernaxe ev destana  
Xweliya çixara vêketî, Zimanê margîskê,  
Ber taverajan çetel pirîsk vedidan,  
Bi yek derbê difirand

Destên bi huner...

Van çavan, carekê jî pê li feqê nekir  
 Qiyameta geliyên li bendî aşîtan  
 Bêbextiya nermik, bi berf  
 Ya zinaran,  
 Çavên berê dizanin...  
 Neçar  
 Wê bihata kuştin,  
 Ferman vebirî bû,  
 Bila çavên wî marên kor  
 Dilê wî teyrên berata bixwara...

3.

Birîndar im  
 Di talda geliyekî çıyan  
 Ji deman di nimêjek sibê de  
 Radizêm  
 Bi xwîn, zirav û dirêj...

Birîndar im  
 Xeyala min, ji şevan tarîtir  
 Kesek ji xêrxwaziya min re der nayê  
 Canê min distînin bê ecel  
 Di pirtûkan hilnayê  
 Ferman şîfre daye paşayekî  
 Hatime lêdan qet bêpîrsîn, bêdaraz

Kirîvo, halê min eynî werê binivîse  
 Rîwayet tê zanîn belkî  
 Ne çiçikên gulî ne  
 Gulleya domdomê  
 Di devê min de perçe perçe

4.

Fermana mirinê pêk anîn,  
 Dûyê çiya yê şîn  
 Ê bayê şeveqê yê nivşiyar  
 Di xwînê gerandin.  
 Dû re li wê derka tufeng sêpandin  
 Paşilên me hêdî hêdî pelandin

Û lê geriyan,  
 Hûr hûr seh kirin  
 Pişta min ya sor malê Kermaşahê  
 Tizbî û qutiya min wergirtin û birin  
 Hemî jî xelat bûn ji diyarê Ecemîstanê...

Em kirîv in, bira nin, bi xwîne girêdayî nin  
 Gundên li sikura hember, bi zomên xwe  
 Me keç dane hevdû bi sedsalan,  
 Cîran in em sikur bi sikur  
 Tevlîhev dibin mirîşkên me  
 Ne ji nezanî,  
 Ji xizanî,  
 Li pasportê rûneniştiye dilê me  
 Ev e tometa me sebaba qetla me,  
 Bi ser de, bi eşqiyatî dertê navê me  
 Bi mişextî  
 Bi keleşî  
 Bi xayîntî...


Kirîvo, halê min eynî werê binivîse  
 Rîwayet tê zanîn belkî  
 Ne çîçikên gulî ne  
 Gulleya domdomê  
 Di devê min de perçe perçe

5.  
 Lêxin lawo, Lêxin,  
 Ez bi hêsanî namirim.  
 Di tifikê de bizotê min yê bi xwelî,  
 Di zikê min de gotina min heye  
 Ji kesê bi rewşê dizane  
 Bavê min çavên xwe da li ber Ruhayê  
 Sê heb jî birayên xwe  
 Sê terhên narîn,  
 Sê perçê çiyarên nebûbûn ji temenên xwe  
 Ji bircan, ji giran, ji minaran  
 Kirîv, mirov, zarokên çiyar  
 Di berxwedan dorpêça Fransiyar

Hîn nû xwê dabûn simbêlên wî

Xalê min yê biçûk Nazîf  
Bedew,  
Sivik  
Siwarekî rind  
Gotiye lêxin birano  
Roja namûsê ye  
Û hespê xwe rakiriye ser pêyan.

Kirîvo, halê min eynî werê binivîse  
Rîwayet tê zanîn belkî  
Ne çiçikên gulî ne  
Gulleya domdomê  
Di devê min de perçe perçe



JI

### HÎROŞÎMA RE

Tê bibûya stargehek delal  
 Ji sê aliyan girtî bi çîyan,  
 Stargehek bi hêlek xwe li deştê dinere.

Belav dibe ber bi başûr tu mîna bajengekê  
 Bi heft çeman xwedî dibe delavê te  
 Li te dide bayên başûr yê hêmin, tîngerm,  
 Kevzên ku rêşî û rîçalên xwe belav dike  
 Bi mistdana kulîlkên peravê dixemilîne.  
 Hîroşîma, bajerekî kevn e tu  
 Yê ku bîhna dara sendalê jê tê.  
 Mirovên te ew hewandin

Xebitîn sal û midêr canê wan di diranê wan de.  
 Bi roj gurmegurma lotikan dihat û diçûn,  
 Bi şevên dirêj re hevaltî dikir stran û dûrik.

Tu kesî şer nedixwest.  
 Yên ji Nagazakî, yê ji Hîroşîma  
 Tu kes ji karkerên, ji cotkarên Japonî  
 Tu kesî, tu kesî şer nedixwest.  
 Bi nefret dinêrîn  
 Li Çînîyan, li Malayîyan.



Ne çikandin darek kaûçûk li Seylanê.  
 Ne Gûza Hindê li Cava,  
 Ne jî koloniyek li ser çemê Mekongê  
 Şer yê din qelew kir,  
 Ne wan.  
 Dîsa jî sibehekê  
 Herkes pekiya ji nav nivînên xwe bi dengê pîspîskan re,  
 Gurzek tîrêj bi bêdengî  
 Ezman jenand ji rojhilat ber bi rojava.  
 Tê gihastibû herkes, rûxandin hatibû û qewimîbû.  
 Yê bi şûnde man qop û seqet seranser,  
 Dibêjin û disekinin, mîna wêneyan,  
 Ji cîhanê re sawîriya wan rojan.

Ma ji çi tiştan re nebûn şahid  
 Ji çi şanogehan re. Tîrêj werê bi korkirin,  
 Ba werê gûr bû ku.  
 Bi teqînekê nihîtên latan hûr hûrî kir.  
 Bi teqînekê werîsên pola dibûn têlên ziravik.  
 Bi sedhezaran jiyar  
 Bi yek carê çû.  
 Evîn, pîşe, muzîk hemû  
 Bi yek carê can dan.  
 Kundan dixwend êdî li ser kaviîlê wî bajarî,  
 Ku rawestayay ew jan – ma li ku,  
 Dengên girî tî jî wira  
 Yê ku îro jî dişewitîne dilan,  
 Tevlî ku di navbêne re derbas bûye deh sal.

Şahid, rabe ser piyan!  
 Horîşîma, ji te re dibêmin li min gohdarî bike,  
 Binêr êdî dawîya rûxînê, janê.  
 Tu bû şahidê temamê zulma cengê,  
 Kî dikare ji te çêtir aştiyê biparêze?  
 Divê biqîre tu li tevê cîhanê  
 Divê bêje tu çawa mir, yê mirî,  
 Çawa ma, yê mayî.  
 Şahid, rabe ser piya.  
 Efendîno, ji kerema xwe re hişbin hinekî,  
 Wê Horîşîma bipeyive!

## SIRBÎSTAN



## ALEKSA ŞANTÎÇ

Di 27 Gulan 1868'an de li bajarê Mostar ji dayik bû, di 2 Sibata 1924'an çû ser dilovaniya xwe.

## WELATÊ MIN

Digirîm ji bo te erda feqîr!  
 Û ne tenê bi xwîna dilê min.  
 Bi hemû kedera gelê min yê xemgîn  
 Dil bi şewat im ez jî, bi parkirina çarenûsa wê.

Ew çî gavê hat kêmdîtî, biçûk xistin  
 Ez jî hatim kêmdîtî.  
 Û berdêla her lêxistina dilê te min bi xwînê da.  
 Xwîna min dilop bi dilop dinuqute ji destê dijmin  
 Û mîna mohrê disekine, li ser erda bi şewat...

Xwêya hêsirên din yê pîrozwer heye, di hêsirên min de  
 Digihêje hev li canê min jana bi sedê canan  
 Û xemgîniya wan e, dike zingîn di gazincên min de.

Li her cîhê ku ruhê Sirbî lê pêde dibe  
 Starekê dibînim ji xwe re  
 Bi coşîna bêhnvedana hewa welatê xwe yê pîrozwer.

## RÛSYA

**ALEKSANDR SERGEYEVÎÇ PÛŞKÎN**

Di 6 Pûşper 1799'an li Petersburg çêbû, di 10 Sibat  
1837'an de mir. Helbestvanekî Rûs yê bi nav û deng e.

**DI KÛRAHIYA KANÊN SÎBÎRYA DE**

Di kûrahîya kanên Sîbîrya de  
Rawestin, bêyî wendakirina sebra xwe ya bi şanazî.  
Vala naçe xebata we ya jandar  
Û armanca ramanên we yên bilind.

Xwîşka dilsoz ya bextreşiyê  
Hêvî, di zîndana we ya tarî de  
Wê zînde bihêle zîndetî û şadiyê  
Û ew dema tê hêvîkirin jî wê bê:

Wê bişikîne kîlîtan evîn û hogirî  
Wê bigihên ba we.  
Dengê min yê azad çawa  
Gihîştibe çaviyên we yên nefiyê.

Wê qeydên giran bikevin;  
Û di deriyên zîndanên bête rûxandin re  
Wê derbas bibe û bi şahî têkeve hundir azadî  
Û wê dirêjkin şûrên xwe birayên we.



**ALÎ BÎÇER**

1960 Kirdilim, Çekerek, Yozgat. Ji Kurdên Elewî niştecîyê Yozgatê ye.

**LI ÇIYAN NAVNÎŞANA ROJÊ HEY E**

I.

heval...

vay e bi "sî û sê gulle" yê xwe

sîpan

mengene

bi sî û sê hezar gulleyê xwe

herekol

cûdî

-botan-

agirî yê pispor

û dilê dêrsim yê bi xwîn: mûnzûr

bi zozanên xwe

bi zinarên xwe

bi deşt û beriyên xwe çîyan

li taldan dimeşe dengê postalan

serê her pêgê dikevin tetikê şop

di xwînê tê dan bédengî

bi qîreqîr hişk dibe gîha

li dû demê tevîhev dibe kurm û kêz

diqelişe erd

di berpala xwe de perçe dibe lat

tenikahiya wan ranagire xiyaneta dolên xwe

di firînên xwe dilên peresêlkan dikevin  
 ji derên xalî dertên  
     û  
     dicivin ser goştê hêviyê  
 cahşên noker...  
     wawîkên postên wan ketiye mazatê  
     xwediyê dilên nakin pênc pere

II.

heval...  
 tê xwe bispêre  
     bijiyê hespa beş  
     wê bide bezandin  
 şevêk bîst û yekê adarê  
     li kopên çîyan  
     gava rohnî bû cîhan  
 tê eniya xwe di pêtiyê sor bide  
     ji sura ba re lorîn  
     ji barana ewran re stran  
     biraçîne  
 tê têkeve xeyalan  
     rêl bi rêl  
     evîne bişitîlîne  
 heval  
     vane çîyayên  
     tê bîraderan lê têr bike

III.

di xopana serhildan  
     û nefiyan  
 hîn nehatiye vekirin  
 li çend warê korbûyî  
 cilên bi rehên azadî  
     hatin girêdan  
 her yek jîyanek bi xwîn  
 her yek hezar çîrok  
  
 ku di qetla rojê de be şev  
 stêr bi stêr  
     keç û law



bûk berî zavan  
     bi dîliyê re dikevin koziyê  
 zaroka wan ya pêşî şerê serxwebûnê ye  
 çawa hîn nebin  
     arpêçiyê  
         firokhelgirê  
 çawa hîn nebin  
 her şev di hêmbêza xwe bi tufengê şabûnê  
 xistina gulleyê ya malpêçiyê  
 vekirana gula xwînê li barîkatê  
 “şêr şêr e” di kevneşopiya eşîran de  
 “çi jin çi mêr e”  
 her can mewziyek  
 her can fişekek tijî  
 zanin ku  
     napalm  
         gaza xerdelê  
             gava bê barandin li erda wan  
 çi jin an çi mêr be  
 peresêlkek çêlî  
     an çinarek sedsale be  
 nîne cudahiya wan di zagonên qirkirinê de  
 zanin ku  
     kêlûn nabe ax û tov  
 aştî û serxwebûn  
     hîn bi sedsalan dûr e  
 av bê lixav  
     evîn bê birîn  
 nagehên miradên li çiyayên welatê xwe

VI.

li zîlana bi xwîn  
     nehrî  
         oramar  
             çemê serxanî  
 bêhn veda her kulîlka newrozê ya vedike  
 qîrîna komkujîyan dikeve  
     durûtiya şaristaniyê  
 di bin berfê ditevize tovê gelekî girsehêz  
 roj dibe  
 ji gundên xwe, ji malên xwe tèn qetandin û koçkirin

roj dibe  
     nexweşî, xela bi ser de tê  
             sipîtiya rojê dimire  
 hîna li baskê çûkê nûçe  
 di nava mar de hêrs heye  
 ji sedsalan di bin dagîriyê de ye jiyar  
 lê ne taqet  
     ne şer  
         ne zîndîbûna sibehê  
 ne qula kevirekî  
 ne darek  
 ne pelek gulê  
 ne jî perçakî piçek erd  
         hîştin  
 û di dilên xwe terk nekirin welatê medya  
 di şopa simên hespan rêçikên qaxniyan  
 bayê nefiyê xema reş rakiribe jî  
 dişewitîne cîhê koranî û tirs lê dikeve  
 di awirên zêravî de bi şûnde mane agir  
 bêkesiyê dide lêpîrsîn di têkçûna xwe de  
     di şevê bêheyv firar dike welatê xwe  
 bi hesreta pê re hevaliyê bike roj  
                     bi hêviya şahiyê

VII.  
 dipêçin çiya cendera sitemkariyê  
 mijokdariyê  
 gûr dibe agir  
 datê bi ser de mîrkuwê kawayê hesinkar  
 gava jan, ciyawazî û mirin bijî  
 wê bikeve qozê dehakan ê paşî  
 ji hevdeketî û genîbûyî

wê biqede zordarî  
 wisa meşiyar xortên kurdan  
 ser nînewa  
 werê bû sitran çar hezar sal  
 qorê şerekî nû yê pêşîn  
 û wisa pir dibe çêbûna çendîn lehengan

tevlî berbangê bûye coşînên wan ê bêdawî



li dîrokê bi tîpên zêr hatiye kolan  
hûnandinek navdar ya ji pola ye pêşmerge

çeka xeyalên me ya mêrxas û zarokekî bi tenê  
lorîna me ya azadiyê  
hesreta zarokan mîna ava zelal  
welatekî zincîrên xwe biqetîne  
bi ezmanekî şîn bêhn vede  
û karker  
helbet bi kêlûn di mil hev de  
destê me yên çekê digire  
digeheên sibehê  
ji birîna me vedibe destmala me

## ANGOLA



### ANTÓNIO JACINTO DO AMARAL MARTINS

Li bajarê Luanda di 28 Ilon 1924'an de çêbû, di 1991'ê de li paytexta Portekîz  
Lîsbon mir.

#### MONANGAMBA\*

Li vê çewlika mezin zad, ne baran

Xwêdana enîya min av dide

Li vê çewlika mezin qehwa gehîştî,

Qeresîyên sor hene.

Xwîna min dilop bi dilop xwedî kir, şîra nava wan.

Wê qehwe bê qelandin,

Bê kutan û hêrandin.

Wê reş bibe, wê reş bibe; wê bistîne

Rengê pale yê reş,

Rengê pale yê reş!

Ji çivîkên dixwînin bipirse,

Ji çemên bêxem difitilin û diherikin

Û bayê ji hundir ve, ji hundir ve tê:

Kî ji sibê zûde radibe? Kî tê rêkirin zevî?

Di rêyên dirêj de kî hildigire texterewanê axê?

Yê zad hiltîne kî ye, yê perê wî distîne kî ye?

Kî dijî bi garisê ifnikî, bi masîyê genî û bi biçûkxistinê

Di nav pertalan de, rojanek bi 50 Anglores\*\*

Lê kî ço dixwe gava serî hildide?

Kî?

Kî garis dide gehîştin,

Û kulîlk dide vekirin baxçeyên pirtûqalan,

-Kî?

Ji bo ku axa, otomobîlan, amrazan, mekînan,

Yarikan û birek navmalîyên reşik bigire.

Kî dirav dide pêdekirin?  
 Kî dide dewlemendkirin mirovê spî,  
 Kî dinepixîne zik û peredanka wî?  
 -Kî?

Û teyrikên dixwînin,  
 Robarên bêxem diherikin,  
 Û bayê tê ji hundir ve  
 Wê bersîv bidin:  
 - Serberdayên Gamba...  
 (-Monangambeeeee...)

Ax! Bihêlin, çet nebe bi darên xurman ez rapelikim  
 Bihêlin bikişînim ez, bikişînim şeraba xurman  
 Di serxweşîya xwe de bifetisim û ji bîr bikim  
 - Serberdayên Gamba...  
 (-Monangambeeeee...)

\*Monangamba: Zarokên Gamba  
 \*\*Perê Angola

## DEWLETÊN YEKBÛYÎ AMERÎKA



ARCHIBALD MACLEISH

7 Gulan 1892 Glencoe- 20 Nîsan 1982 Boston

## MIRÎYÊ ÎSPANÎ

Nehat xwestin hesabê vêya,  
 Hesabê hêstiran nehat xwestin,  
 Lê wê bê xwestin  
 Hêstirên Madrîd`ê, yên Barcelona, Valencia  
 Nehat xwestin hesabê van hêstiran\*

Hêstir zuha bûn li rûyan,  
 Zuha bûye xwîn li ser xîzan,  
 Nehat xwestin hesabê hêstiran,  
 Hesabê xwînê nehat xwestin  
 Wê bê xwestin hesabê vana

Lewra napeyivin mirovên Guernîca.  
 Zarokên Almerîa bêdeng in  
 Jinên Badajoz bêziman in  
 Bêziman in ew, dernayê dengê wan, dengê wan dernayê  
 Xetimandîye gewrîya wan xîza wira  
 Napeyivin, wê napeyivin jî û zarok  
 Zarokên Almerîa letan in  
 Nalivin, wê nelivin jî  
 Laşê wan şikandî, hestiyê wan şikandî, devê wan  
 Lewra mirînin ew, tev bêzimanin

Nexapin,

Guman mekin ku wê neyê xwestin hesab

Nexapin,

Ku hesabê xwîna rijîyayî nehatibe xwestin

Guman mekin ku wê neyê xwestin hesabê derewan

Nexapin,

Wê bê xwestin hesabê vêya,

Wê bê xwestin belê,

Wext hey e

Wext heye hîna,

Wextê mirîyan pir e, li van deran:

Li Badajoz, li Guernîca, li Almerîa

Karin rawestin wextê wan heye hîna,

Wext hey e

Karin rawestin hîna

\*Xwîna ku Almerîa, Badajoz û Guernîca rijand,

Nehat xwestin hesabê vê xwînê

## FRANSA



## ARTHUR RIMBAUD

Jean Nicolas Arthur Rimbaud li Fransa bajarê Charleville di 20 Cotmeh 1854'an de ji dayik bû û di 10 Mijdar 1891'ê de li Marseille jîyana xwe ji dest da.


## OFELÎA

Di ava aram tarî ku sitêran lê şewq vedida  
Ofelîa gewr ser avê mîna leylankek mezin;  
Ser avê pir hêdî, di nava bûkanîya xwe dirêj bûye...  
-ji dûr ve te karibû dengê hêlehêla neçîrvanan his bikira.

Ji bo Ofelîa ji hezar salî zêdetir xemgîn  
Derbas bû, ruhekî sipî, ket binê çemê reş î dirêj.  
Ji bo dînîkîya wê ya şêrîn zêdetirî hezar salî  
Sura êvarê strana wê nuhurand.

Ba sîngên wê maçî dîke û mîna çelengekî vedike  
Bûkanîya wê ya mezin li ba dibe û dikeve avê;  
Şaxên bîyan li ser milên wê bi girî dilerizîn,  
Xwe bera ser brûyên kevan î, efsûnî didin şax.

Leylankên avê li dora wê bel bûne dikin axîn;  
Carna ew bîhn vedide, di darek xilmaş de,  
Carna ji hêlînekê dengê li hevdana baskên biçûk tê;  
Ji stêrek zêrînî sirûdek bi xof tê xwarê.



### NIŞTÎMANA MIN

Maldar dilerize, li hember xizan, ji tirs  
Xizan dilerize, ji tirs, li hember maldar  
Lewra, ya rastî tirs e, di jîyana me de  
Û fenekî, lê nîn e li wira cîyê hêviyê

Yên diwerimînin zikên xwe, bi nanê gundî  
Ew ajotinin dervî hemû mafan  
Vê jina zahmetkêş, mîna erda beyar lawaz  
Li qunceke diqurnise, ji dêbla bigere li mafê xwe

Û gava zaroyên gel dertên rastê  
Ev hezar sal e meşiyaye di şiverê  
Li pişta wî, buxçikek hejar hey e

Ji bo xulamtîyekê bibîne, seranser tevdide bajar  
Û tiştê ku kari bike, bi darê destê xwe  
Lêdana gora ku hestîyê bavê wî tê de ye

Bi her tiştê xwe Macar, lê ruhê min yê nefiyê ji dil  
Hesretekê diqîre, bi hemû taqeta xwe  
Ji bo di dawîn de bibim kurê wî yê dilsoz  
Ji bo di dawîn de min himbêz bike, niştîmana min ya delal

Ji heywanekî zincîr li hustu hatîye xistin  
Dixwazim cuda be qedera min, jîyana bi mirovî, bi hozanî  
Û ez ferman dikim li dozger, qet nebe  
Bira neyê birîn pêûsa min ji perpitandinên xwe

Ax niştîmana min, te şand gundîyên xwe ji oqyanûsê wê de  
Jîrbûnîya erda Macar bide wan  
Aniha hestên mirovî bide mirovan

Bira nebe mêtingeha Alman ev welat  
Bira bi bêdawîyek ronak biçirise risteyên min  
Êdî bira dilşadî vede li stranên min



## ANGOLA

**AUGUSTINO NETO**

Angola Bengo 17 Îlon 1922 10 Îlon 1979 Rûsya Moskova

**BERÎ KOÇKIRINÊ XATIRXWESTIN**

Dayika min!  
 Kuştin zaroyên te  
 Ê te hînî aramîyê kirin.

Dayika min!  
 Salên jîyana te  
 Dişibihin hev  
 Mina kevirên goran,

Ê te hînî xemkêşiyê kirin  
 Hêvîgirêdana bi ezmana.

Lê çarenûsa kurên te  
 Bi awakî din bû.  
 Derizî kevirê sebrê  
 Ê derizî  
 Tovê xemê  
 Ê dara kerbê jê beliqî.

Ê hêvîya bi ezmana hat girêdan  
 Dawî hat.

Hêvî em in, em bi xwe!

Em ku,  
 Koleyên duhî;  
 Paleyên tazî  
 Di plantasyonên qehwê:  
 Em ku, herdem birçî,  
 Herdem tîh,  
 Em ku, ji rohnîyê  
 Bêpar;  
 Kor, nezan,  
 Û dibistana bi tenê em pê dizanin  
 Fermanên efendîyên me ne...

Em ditirsîyan  
 Ji meşa li ser erdê  
 Ya di bin de pêşîyên me razayî;  
 Me hez dikir ji te  
 Bi dizîka  
 Mîna bidizin malê yekî din;  
 Em ditirsîyan, wek dayik  
 Bangî te bikin...

Dayika min, welatê min!  
 Niha em hatin guhertin êdî.  
 Bi xwe rizgar kir me  
 Hustuyê xwe ji nîr  
 Û vegera ji vê rêyê nîn e êdî.

Ji jîyanê natirsin em  
 Ev, tê wateya ji mirinê jî natirsin em.  
 Em in hêvîya  
 Angola  
 Û şerê me  
 Ji te re  
 Wê şahîyê bîne!



**AZÎZ NESÎN**

20 Berfanbar 1915 Istanbûl – 20 Tîrmeh 1995 Îzmîr.

### **BIBEXŞÎNE**

Ya ez gelekî berî dema xwe tîm  
 Mîna ku hatime cîhanê  
 Yan ji demê pir dereng  
 Mîna ku di vî temenî de ji te hez dikim

Ji bo kamiranîyê tim dereng dimînim  
 Tim zû diçim nekamiranîyê  
 Ya her tişt qedîyaye ji zû de  
 Yan tu tiştêk destpênê kirîye

Di demek werê hatim jîyanê  
 Ji mirinê re zû ji şabûnê re dereng  
 Dîsa dereng mame bibexşîne yarê  
 Ji şabûnê re deh ji mirinê re pênc maye

## KURDISTAN



ARTHUR RIMBAUD

Baba Tahir Uryanê Hemedanî 935-1019 fîlozof, helbestvan.

## DUBEYT

Du keziyên te li ber ruwê te ne,  
 Gul û simbil li cem te bi hev re ne;  
 Dema tu keziyên xwe belav dikî,  
 Bi hemû mûyên wan dil bi dar de ne.

Tu ku qamnazenîn û dilruba yî,  
 Tu ku bêyî kilê çav bi kila yî;  
 Tu ku xwedyê du keziyên siya yî  
 Çer dipirsî ku çima awara yî.

Eger derdê min yek bûya çi dibû;  
 Ger xema min hindik bûya çi dibû;  
 Li kêleka min hebîb yan tebîbek,  
 Ji herduyan yek hebûya çi dibû.

Evîndar ew e ku herdem bi bela be;  
 Mîna Eyûb bi kurman muhtela be;  
 Weku Hesên binoşe tasa jehrê  
 Mîna Huseyn şehîdê Kerbela be.

Min bikujî b'zorê, tê j'kê bitirsî;  
 Biqewrînî b'xorê, tê j'kê bitirsî;

Ez bi vî nîvdilî j'kesî natirsim,  
Ey dilê du alem, tê j'kê bitirsî.

### ÇARÎN

Dilê şad agah ji dilê jar nîne  
Kesê xweş rewş agah ji bîmar nîne  
Ne b'nasê te ev wêneyekî kevn e  
Ku azad ji dîlî agahdar nîne.

Gulîstan cihê te ey nazenînim  
Ez di gulxen û xwelî de dirûnim  
Çi di gulşen çi di gulxen çi sehra  
Ku çavan vedikim her te dibînim

Bela wek remzekê ji bejna te ye  
Mecnûnî qismek ji sewda te ye  
Gumana min ev e ku xaliqê te  
Veşartîyî di temaşa te de ye

Dilêm ji derdê te herdem xemîn e  
Balîfêm kevir, doşekem zemîn e  
Sûcê m ev e ku min ji te hez kirye  
Ma her ê j'te hez dike dilbixwîn e

Alemê de kes nebe wek min, amîn  
Wek min kes nebe di ev dîn û ayîn  
Her ê ku bi halê min bawer nîn e  
Weke min be, weke min be, weke min

Her ew ku aşiq e ji can natirse  
Aşiq ji zencîr û zîndan natirse  
Dilê aşiq weke gurê birçî ye  
Ku ew ji heyheya şivan natirse

Ku dil dilber be, lexwe dilber kî ye  
Eger dilber dil be, navê dil çi ye  
Ez dil û dilber tevlihev dibînim  
Nizanim ku dil kî ye dilber kî ye

Biçim ez ji vê alemê bider çim  
 Biçim ji Çîn û Maçînê dûrtir çim  
 Ez ê j' dildar re peyamkê bişînim  
 Ku ger dûrî xweş e ez ê dûrtir çim

Eger destê bighê çerxa felekê  
 Ezê gelek tiştan bipirsim ji wê:  
 "Te bi yekî dayiye sed nîmet  
 Bi yê din jî nanê ceh tevî xwînê"

Îlahî biçim cem kê biçim cem kê  
 Ez ku bê dest û pa me biçim cem kê  
 Hemû min biqewrînin tême cem te  
 Ku ji te biqewirim biçim cem kê

### **Hin Çarînên bi zaravên Lûrî ve Kurmancî**

#### **Lûrî**

Me ger şîr û piling î, ey dil, ey dil  
 Be mu dayim be ceng î, ey dil, ey dil  
 Eger destem resed xûnet birîcem  
 Biwînem ta çi reng î, ey dil, ey dil

#### **Kurmancî**

Me ger şêr û piling î, ey dil, ey dil  
 D' gel min her dem li ceng î, ey dil, eydil  
 Eger dest im giha xûna te d'rêjim  
 Bibînim ka çi reng î, ey dil, ey dil

#### **Lûrî**

Dilem zar û hezîn e, çun nê nalem?  
 Wicûdem ateşîn e, çun nê nalem?  
 Be mû waçen kî çun û çend nalî?  
 Çu mergem der kemîn e, çun nê nalem?

#### **Kurmancî**

Dil im jar û xemgîn çawan ne nalim?  
 Canê min dişewite, çawa ne nalim?  
 Dibêjne min çawan û çend dinalî?  
 Ku merg im di kemîn çawan ne nalim?

**Lûrî**

Dilî şad ez dilî zaresî xeber nî  
 Selametrû zi bîmaresî xeber nî  
 Ne teqsîrî te î n resmî qedîm e  
 Kî azad ez giriftaresî xeber nî

**Kurmancî**

Dilê şad ageh ji dilê jar nîne  
 Kesê xoşrewş ageh ji bîmar nîne  
 Ne b' nasê te ev wêneyek kevn e  
 Ku azad ji dîlî agehdar nîne

**Lûrî**

Be şû mehwî ruxî mehpare hestem  
 Be roz ez derd û xem bîçare hestem  
 Tu darî der mekanî xud qerarî  
 Mûyem kî der cîhan aware hestem

**Kurmancî**

Bi şev mirîyê ruyê mehpare me  
 Bi roj ji derd û xeman bêçare me  
 Li şûn û cihê xwe te biryar heye  
 Ez im ku di cîhanê aware me

**Lûrî**

Dilî mû xeyrî te dilber nê gîre  
 Be cayî cewherî cewher nê gîre  
 Dilî mû sûte û mîhrî te azer  
 Bî nasûte azer der nê gîre

**Kurmancî**

Dilê mî' j' bilî te dilber na gire  
 Li cihê gewherê gewher na gire  
 Dil sotemenî û evîna te agir  
 Bê sotemenî agir her na gire

**Lûrî**

Bî te gulşen çu zîndan e be çeşmem  
 Gulistan azeristan e be çeşmem  
 Bî te aram û umr û zîndeganî  
 Hemu xwabî perîşan e be çeşmem

Kurmancî

Bê te gulşen wek zîndan e li nik min  
 Gulistan agiristan e li nik min  
 Bê te aram û jî û jîyana min lê  
 Hemu xewa perîşan e li nik min

**Lûrî**

Gulistan cayî tu ey nazenînem  
 Mû der gulxen be xakister nişînem  
 Çi der gulşen, çi der gulxen, çi sehra  
 Çu dîde wa kerem ciz te nê wînem

**Kurmancî**

Gulistan cihê te ey nazenîm im  
 Ez di gulxen û xwelî de dirûnim  
 Çi di gulşen, çi di gulxen, çi sehra  
 Ku çavan vedikim her te dibînim

**Lûrî**

Xûş an saet kî dîdarî tu wînem  
 Kemendî enberîn tarî tu wînem  
 Nê wîne xuremî her giz dilî mû  
 Me ger an dem kî ruxsarî tu wînem

**Kurmancî**

Xoş ew saet ku dîdara te b'binim  
 Kemendê enberîn tara te b'binim  
 Na bîne şadiyê her giz dilê min  
 Me ger ew dem ku ruxsara te b'binim

**Lûrî**

Bure, Bure kî cananem tu yî tu  
 Bure, Bure kî sultanem tu yî tu  
 Te xud zanî kî xeyr ez tu ne zanem  
 Bure, Bure kî îmanem tu yî tu

**Kurmancî**

Were, were ku canan im tu yî tu  
 Were, were ku sultan im tu yî tu  
 Te b' xwe zanî ku j' bilî te ni zanim  
 Were, were ku îman im tu yî tu



**Lûrî**

Bure rozî kî dîdarî te wînem  
 Gul û sumbul be dîdarî te çînem  
 Bure bunşîn berem salan û mahan  
 Kî ta sîret biwînem nazenînem

**Kurmancî**


Were rojek dîdara te bibînim  
 Gul û sumbul bi dîdara te çînim  
 Were rûnin nik min salan û mehan  
 Da ku têr te bibînim nazenîn im

**Lûrî**

Behar amed be sehra û der û deşt  
 Cewanî hem beharî bud û biguzeşt  
 Serî qebrî cewanan lale rûye  
 Demî kî mehweşan ayen be gulgeşt

**Kurmancî**

Bihar hat, hat ji bo çolê û der û deşt  
 Biharek bû, ciwanî hat, biguzeşt  
 Serê gora ciwanan lale zîl dide  
 Her li dema ku zerî têne gulgeşt



**BEKIR MERIÇ**

1960 Adana- 2014 Adana

### LI TE GERÎYAM

li te gerîyam ey azadî  
 çawa ku bi bezek bi helkehelk  
     ya bi şevan bi rojan  
 çawa di mexela newala Sefo ya zuha

yan jî  
     di mija Halepçe ya îperît de  
     dayikên zarokên xwe wendakirî  
     ji bo bikujin xwedayan  
 û çawa ku li hember dagîrîya hezar salan  
     dilê serî hilda

bi hesret li çekê bigere  
 werê gerîyam li te ey azadî  
 li te gerîyam  
     li Olîmpûs  
     li Sîon  
     li Golgotha  
     li Hira

li te gerîyam  
 gava hûr hûrî bû mejîyê min  
 di paxila dîrokê

di bixûrê  
 di neftê  
 li te gerîyam  
     di Komunê  
     di çiriya pêşîn  
     di atomê  
 li te gerîyam ey azadî  
 li çîyan  
     di birçîtîyê  
     di evîndarîyê  
 aleyan dikim gorî te  
 dilan pêşkêş dikim sîya te  
 dibe azwerîya min tu di her mirinê

Çile `90  
 Aydin

### **EZ EVÎN IM**

têm ba te  
 ji janan ji nebûnan  
 xemgîn im  
 gulîstana welatekî gul dernayên li axa wê  
 bi gulleyên eşqiyakî kunkunî, di lêdana çiyayê xwe de  
 terhên min yên şîn radizên bêcan  
 teyrik nagirîn  
 lûlak kerba xwe verşiyaye di teniştê min de bi lencîn  
 çeka dîyarekî me ez  
 temenê xwe nizanîm  
 hêvî hatin xencerkirin li çiyayên wê  
 diya egîtekî  
     lawijan bi xêlî dikim  
     haletê gundî  
 torna karker im  
 keçikek hesreta ji min dineqîşîne gergefa xwe  
 bi rewşek herî guhnedar ez heme di hêviya wê de  
 mîrê dilê te me  
 gîhayên te yên nîvşevî di ava revok  
 ristên sirûdan  
 neqaratên sitrana me  
 dîhn diherikim di mexelê xwe de

dibim robarekî bêgem, bêzîn  
 carcaran li çîyan vêdikevim  
 şevê rohnî dikim pêtî pêtî  
 carcaran bêdeng dimînîm  
 mîna berfa şeva zivistana bimirin  
 ji royê re çermê xwe pêşkêş dikim  
 carcaran dibim bûkek  
 ji genim re dibim simbil  
 bi baranê didim maçîkirin porê xwe  
 kes min nabîne  
 di çavên te şewq didim herdem mîna çirûskê  
 nan

av

ba

û illehî jî serxwebûn

dibim şewat di lêva yarê  
 gava tê kişandin dest û pê  
 radizêm ranazêm  
 dimirim û radibim bêdawî  
 dimînînin heyirî yezdan  
 carcaran çong didim ji agir re  
 carcaran dişewitînim pirtûkên pîrozwer  
 min dixapînin bi sozên bihuştê  
 ji axê bawer nakim êdî  
 ji min re dijmin e tirs  
 bi xwîna xwe av didim zevîyên xwe  
 li çîyan mesken digire bi min re namûs  
 mirin yarî ye  
 hezar xencer li pişt min didin  
 bergornên dilên xwe firotî  
 belê nizanin

ez namirim

nayêm kuştin

ji bêbextan re efsûn im

dibim Eyûb kurmî dibim  
 dibim Eyûbî hildipekim  
 dibim Yûsif li Gayya'n radizêm  
 gava halan hildidim dibe deşt li min çiya  
 kemîn naçar in  
 dikevim paxila keçên asê  
 şev bêagahin

bêarîn didizim dilên wan  
 mêrxasên dilpola bêdemsal  
 li min xweşik disekinî nêrgis qerenfîl  
 illeh ji hêstirên çavan bêdestmal  
 ser zimanan sitran  
 ser dilan kamiranî  
 ser lêvan jan im  
     bên jêkirin ji rehên min  
                     namirim  
 ez evîn im...

### HEVALÊ ARAM STRANEKÊ BÊJE LO!

I.

ji Babîl tîm:  
 baxçên dardakirî cihê cejnê  
 hoqehoqên zengilî  
     dike helbest Hamûrabî  
 zad diçine Dehak li deştên Sûr'ê  
 Zap mîna zarokekî hişdar  
 Porê xwe mist dide bi turbînan  
 hevalê Aram sitranekê bêje lo  
                     ji Nînewa

II.

ji Heranê tîm:  
 mirovên delal  
     xortên delal perwerde dike  
 kampûs himbêz dîkin  
     darên zînde bişewq  
 belav dibe dengê qanûnê  
 bi sitrana Feqeyê Teyran re  
 qeflek berbû derbas dibe  
     li ser kelekan di Ferat re  
 hevalê Aram sitranekê bêje lo  
                     ji Mûsilê

III.

ji Amed tîm:  
 aleyan sîng vedane

li bircên wê  
 xeyalek serxweş ditewişe  
 di Ehmedê Xanî de  
 Mem maçî zînê dîke  
 heyveron dînoke diçirûse  
 royê ruyê xwe avêtîye ser Dicle  
 bi hemû şewq û şemala xwe  
 hevalê Aram sitranekê bêje lo  
 ji Mahabat

## IV.

ji Halepçe tîm:  
 zarokên dilbij di pêsrên diyan  
 keçek çav bi kil  
 porê xwe dide dergîstîyê xwe  
 Cegerxwîn çêdibe  
 di Şeveqa Lenîn  
 masîyek li sîpan dinêre bi xof  
 hevalê Aram sitranekê bêje lo  
 ji Kerkûkê

## V.


ji Ararat tîm  
 dengbêj sitranan li hev tînin  
 bi coşîn  
 tûtîne dipêçe gundiyek  
 di êvara belek de  
 bi bilûra xwe li evîna xwe digere  
 şivanek bi azwerî  
 xezalek dimire di naperûkên wawîkan  
 hevalê aram sitranekê bêje lo  
 ji Êrmiyê

## VI.

ji Dêrsimê tîm:  
 bi quretî didin awazan bilbil  
 keçên çavasê  
 biraderên çayê vedixwin  
 li hember mûnzir  
 dest bi sitranê kiriye  
 kalekî bi simbêlê xwe yê zerî-zeytûnî



## ALMANYA

**BERTOLD BRECHT**

10 Sibat 1898 Augsburg, 14 Tebax 1956 Mitte

**PESNÊ DÎVALEKTÎKÊ**

Ger tu dijî, nebê "tu demê".  
 Hildiweşe, yê nayê hilweşandin tê dîtin.  
 Namîne tu tişteke çawa be werê.  
 Femandaran, gava dan fermanên xwe yên dawîn  
 Yên di bin feremandarîyê de dest bi peyvê dikan.  
 Kî kari bide çav û bêje "tu demê"?  
 Gava zordestî bajo, kî sûçdar e: em bi xwe.  
 Û kî mecbûrî hilweşandina wê ye: em.  
 Yê têkçûyî, rabe ser xwe!  
 Yê her tiştê xwe wendakirî şer bajo!  
 Ger tu têgehîştibe tiştên diqewime, kî kari te bigire?  
 Ji "tu demê" "îro" dertê  
 Têkçûyê îro, serketîyê sibê ye.

**Gava Şer Destpêdike Ji Yên Li Dûrî Agir Dipên**

Divê êdî wek çavê xwe  
 Di şer de yê li dûrî agir dipên  
 Gava ku yekî din biparêze doza wî  
     Kesê ku temaşevan dimîne  
     Divê êdî wek çavê xwe  
 Tevlî şer nebûbe jî



Di dawî de wê parbike têkçûnê  
 Payin li rexekî filan vala ye  
 Ku çî bike nikare bireve ji şer

Yê şer neke, ji bo doza xwe  
 Ji bo doza dijmin wê şer bike

### **Karkerekî Xwende Dipirse**

Kê avakir bajarê Teb`ê, yê heft derî?  
 Pirtûk tenê navê keyxanan dinivîsin  
 Naxwe ma keyxanbûn, yên lat kişandin?  
 Ya din jî Babîl hebû, ya tim dihat rûxandin,  
 Kê Babîl avakir her carê?  
 Karkerên avayîyan, di kîjan xanî de rûniştine,  
 Yên Lîma ku di nav zêran de dilîzin?  
 Hûn dibê çî bi wan dîwarçêkiran hat, gava Benda Çîn qedîya?  
 Bîrdariyên serketinê, çend zahf in li Roma Pîrozwer?  
 Çî kesbûn gelo, yên van bîrdariyan çikandin?  
 Sezar kî têk bir ku bû xwedîyê van serketinan?  
 Ma qey ji xeynî serayan tunebû ciyê rûniştinê,  
 Li Bîzans`a mezin, ya bi nav û deng?  
 Li Atlantîs, li wî warê çîrokan jî,  
 Di nivê şevekê, gava mirov difetisîn di derya ku dizûrîya,  
 Qîrîyabûn û hewar xwestibûn ji koleyên xwe  
 Çawa stendibû Hindîstan, Îskenderê rûtazî?  
 Ma bi tena serê xwe sitendibû wê dera?  
 Çawa zora Galyayîyan biribû Sezar?  
 Bila nanopêjek jî be, ma qey nebû li ba wî?  
 Dibên girîya Flîp`ê Îspanî  
 Gava noq bû tamamê fîloya wî  
 Gelo ma kes negirîya ji xeynî wî?  
 Di cenga heftsale, Frederik`ê Dudoya bi serket ha?  
 Ma ji xeynî wî kes nebû, yê bi serket?

Li her rûpela pirtûkan, serketinek nivîsandîye  
 Lê yên xwarina serketinê dipêjin kî ne?  
 Di her gavê de, gotiye çîrîp û çengbûye mirovekî mezin  
 Lê kê daye perê ku hatîye xerckirin?

Ha ji te re komek bûyer  
 Û komek pirsîyar

### **Qencî Bi Kêrî Çi Tê**

Qencî bi kêrî çi tê,  
 Bê kuştin, yê qenc bi lez û bez,  
 An jî yê qencîyê dibînin?

Azadî bi kêrî çi tê,  
 Bijîn bi hev re,  
 Yê azad û yê dîl?

Bêhişî mademkî bi dest dixê,  
 Nan ji herkesî re,  
 Aqil bi kêrî çi tê?

Ji dêbla hûnê bibin mirovên qenc,  
 Cîhanê bigehînin cîyekî werê ku,  
 Bila qencî neyê hêvîkirin!

Ji dêbla hûnê bibin mirovên azad,  
 Cîhanê bigehînin cîyekî werê ku,  
 Bila bigehê azadîyê herkes,  
 Werê ku pêwîstî bi hezkirina azadîyê nebe!

Ji dêbla hûnê bibin mirovên heşdar,  
 Cîhanê bigehînin cîyekî werê ku,  
 Bila xisarî be bêheşî!

### **Stran Ji Bo Yê Li Ber Wendakirina Dîlawerîya Xwe**

Xwedî qanûn in ew, xwedî biryarname  
 Xwedî kela ne ew û xwedî zîndan  
 (komelên wan yê civatî filan hela li alîkî!)  
 Xwedî pasban in û xwedî dozger in jî  
 Xwedîyên mûçeyên zêde û amade ne ji kirina hertiştî re  
 Belê ji bo çi vana giş?  
 Çi guman dikin, ma qey wê me di kefa destê xwe kin?


Wê bibînin di nêz de berî tune bibin  
 Ji vana tukes nema ji tişkî re dibin  
 Lê tu kes

Xwedî rojname ne ew, xwedî tank  
 Dixwazin me qet nedin axaftin  
 (rêzanvanên wan filan hela li alîkî!)  
 Xwedî keşe ne û xwedî profesorin jî  
 Xwedîyên mûçeyên zêde û amade ne ji kirina hertiştî re  
 Belê ji bo çi vana giş?  
 Ma ewçend pir ditirsin ji rastîyê?  
 Wê bibînin di nêz de, berî tune bibin  
 Ji vana tukes nema ji tişteki re dibin  
 Lê tu kes

Xwedî top in ew, xwedî tank  
 Xwedî reşşe ne û xwedîyê bombeyên desta  
 (liqên wan yên SS filan hela li alîkî!)  
 Xwedî Gestapo ne û xwedî leşker in jî  
 Xwedîyên mûçeyên hindik û amade ne ji kirina hertiştî re  
 Belê ji bo çi vana giş?  
 Ma ewçend jî xurt in, neyarên wan?  
 Wê bibînin di nêz de, berî tune bibin  
 Ji vana tukes nema ji tişteki re dibin  
 Lê tu kes

Ma guman dikin ku wê tişteki bibe bi ewlebûna vana?  
 Ji cergî çêbûme, xwe davên vê stûnê yên ketî  
 Lê rojek wê bê, belkî jî sibê  
 Wê bibînin ku bi kêrî tişteki nayên vana  
 Wê biqîrin, wê gavê bi bare bar: Bipên! Bipên!  
 Êdî ne top wan disitirîne wê rojê, ne jî pere

## KURDISTAN

**BÊKES-FAYIQ EVDALLAH**

20 Sibat 1905 Koysincaq-20 Cotmeh 1948 Silêmanî

**LAWANÊN WELÊT**

Lawên welêt, xîret bikin,  
 De rabin ji xewê, bir ser çû şev,  
 Nema zemanê cehil û nezaniyê,  
 Îro firsend e, roja hêmet,  
 Bi ilm û sene't berz dibe mîlet,  
 Alem hemîşe xerîqî îş e,  
 Îş bikin bi merdî, bi dest û birdî,  
 Yek dil û dev bin, heta roja mirdin,  
 Lawanên welêt, xîret bikin!

**EY MANG**

Ey mang. ez û tu herdu hevderd in,  
 Herdu giriftar li nav ahê sardin,  
 Tuwêl û reng zeri li esman,  
 Ez jî der bi der li şeheran,  
 Digerim, ey mang!  
 Qebla dildaran,  
 Dermanê derdê dilê bêmaran,  
 Şevêkê û îşev bigire perê min  
 Bê yar û herdem aciz û tenê me,

Dilzar û bêzar, pest û xemgin im,  
 Gîroyê dawa yara şîrin im,  
 Dîlbendê eşqê wê belek çav im,  
 Şêt û şeydayê wan gurçikê xav im,  
 Ji wê wusa ketime nav xeyal,  
 Girîne pêşê min, bûme guhê zoxal ,  
 Ey mang, tu li şixulê eşqê pîrozî,  
 Tu neşe bexşî dil bi sozî,  
 Ez sond dixum bi îşq û ciwanî,  
 Bi nesîma berê beyanî,  
 Bi serhatî xwe bo min beyan ke ,  
 Derdê minî giran hinekî asan ke,  
 Tu carê çi bûyî wa pêşîvavî?  
 Ji ber çi pest û mat û damavî?  
 Bêje min, tu xwedê çend ciwan te dî?  
 Çend kur te li bezma aşiqan dî?  
 Çend qewm û millet, çend şêher te dî?  
 Çend şer û şûr bê aman te dî?  
 Çend burdumanê Kurdistanê te dî?  
 Çend kefenê alî şehîdan te dî?  
 Çend bêkesanê perîşan te dî?  
 Çend der bi der û mal wêran te dî?  
 Çend çavsorî pir girîn te dî ?  
 Ey mang, ewqas te seyrî dinya kir,  
 Seyrî nifaq û zulmê û rîya te kir,  
 Bo wê ye, ku te reng û rûyê xwe guherîye,  
 Reng û şuurî tamam birîye.

### NESRÎN

Nesrîn! Demek e daxa te li min e,  
 Gîroyî, bendî, jîna te zulm e,  
 Ez wa dibêjme te, çimkî deynê min e  
 Rabe, bitêkoşe heta xûna te germ e.  
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme.

Iro zemanê ulm û îrfan e,  
 Alem şev û roj li îş û kardan e,  
 Ferqa nêr û mê tune, bizane,  
 Rabe, bitêkoşe, heta xûna te germe,  
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme,


Mebêj ez keç im, tu jî wek minî,  
 Mohtacê ulm, fen û xwendinî,  
 Mecbûrî îşî û xizmet kirinî,  
 Rabe, têkoşe, heta xûna te germ e ,  
 Serpoşa xwe bavêj , qet meke şerme,

Çiqas rûniştî, pişta te xware,  
 Zer û lavaz bûyî, hêza te ne maye,  
 Keça bîganî va li ber çavê teye,  
 Rabê, têkoşe, heta xûna te germe,  
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme,

Xişir û ciwanîya te heya fêr bûne,  
 Paşroja te her bi wan ron e,  
 Keça bê ilim, dîl û zebûn e ,  
 Rabe, bitêkoşe heta xûna te germ e,  
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme,

Wek xûşk û bira divêt em herdu,  
 Milê hev bigrin, herne meydan,  
 Kurda bibin nav rêza miletan,  
 Rabe, bitêkoşe, heta xûna te germe,  
 Serpoşa xwe bavêj, qet meke şerme.

## KURDISTAN

**BULAND AL- HAYDARÎ**

26 Cotmeh 1926 Kurdistan – 6 Gelawêj 1996 London

**POŞMANÎYA YÊ XWE FIROTÎ**

Zanim wêna  
 Zaroyên min  
 Fedîkarîya min  
 Serpêhatîyek e li dora malan dibihure

Zanim her carê  
 Zîvirandina zivistanê li dora agir  
 Zanim her carê  
 Dîtina lêvekê, yê navekî  
 Dişibihe yê min  
 Mêrkujîya min di bîr tîne  
 Ev mafê dana biryara mirinê ye  
 Ya diçe xwar, di dilê zarokên min de

Zanim  
 Hemû tiştê bûn bi destê min  
 Ji sibeha min ya cîwarbûyî re bircên gorîkirî  
 Îro êdî ji şahidîya ketina min pêve ne tiştêkî din e

Zanim  
 Di serdabên şevê de  
 Min bextreşîya bêgunehan veşart  
 Ji bo gunehên xwe hindik bikim, xwîna rijandî min veşart

Ji alî tîrêjên dertê ronîyê, vê gencîna reş  
Dibe şahidê ketina min hertim, ev gencîna reş

Zanim tune dike tol, rewşa netewa min ya keysgîr  
Gava dibîne gencîna reş  
Wî tebayê hov yê mafê wan xwar  
Di min de naskir, şeva ji rêya wê re bû asteng  
Zanim, dipejirînim  
Kû şev e, ya xwe bera ser da, tebayê hov

Ey netewa min, zanim  
Min çawa te avêt kuçê  
Ji te re tenê  
Min hîşt birçîtî, firmêsk, bobelat


Zaroyên min qet nîn e  
Gunehbexîya min, ya ji we re bêjim

Zarokno  
Wê mirin jî paqîş nekira  
Rûreşîya li enîya min  
Zanim wêya  
Vay li vira hezar kuştî, hezar girtî  
Hezar zarok  
Hezar rabirdû, hezar îro, hezar sibê  
Tenê yên zîndanê min nasdikin  
Paqîş nakin leka enîya min, ya mirinê

Zarokno  
Min bavêjin  
Inkar bikin, rengê çavê min  
Ji we nifirek tê ser min  
Ya biçûk dixê, di nava dîrokê de  
Marekî şikestî

Bûye bizot, bizot  
Vê nifira ku pêtiyê wê yê bihurî çav girt  
Dibe ku rojekê  
Paqij bike enîya min





**CAN YUCEL**

21 Tebax 1926 Îstanbûl -12 Tebax 1999 Datça

### GOTINA BI ŞEWAT

Nikarim gotinek bi şewat bêjim ji te re  
Ku cotek gotinên min ên delal hebe

Bêjim ku, ji şabûnê re zîndan e cîhana min  
Ma tê bi min re di kanîyekê de bibe yek?  
Evîn, ne pêtîkî kayê ye,

ku di me de  
Geh vêkeve, geh vemire  
Evîn, şewata rêlekê ye di dilê me de  
Dişewite bi fitl û ger  
Em ne her du tenê ne, di vî arê evînê de  
Her ku mir in, zêde bûn em  
Di qeydan de çêbûn em

Di zîndanê de, me afirand tîrêj, himbêz bi himbêz  
Wê hîn jî fireh bibe vê xeleka arê me yê bihêz  
Gava çayê qurt dikin, ne tenê ne em  
Yarê, gava bi kamiranî jî bijîn  
Dê netenê bin em

## KURDISTAN

**CEGERXWÎN/Şêxmûs Hesên**

1903 Hesarê Kercews, 22.10.1984 Stokholm SWÊD

**KURTEJÎYANA CEGERXWÎN**

Sala hezar û nehsed û sê ez hatime dinyayê,  
Bi navê Siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê.

Heta bûm sêzde salî li gundê me'y Hesarê,  
Jîna xwe min diborand, paşê ji wê me da rê.

Bavê min ê rîsipî xwedî mirov û rûmet,  
Ne mirovekî malgenî bi namûs û bi xîret.

Ji tengasî, neçarî me ew gundê xwe berda,  
Hatîna Amûda rengîn bavê min zû emir da.

Diya min a belengaz pêncî salî dilovan,  
Salek piştî bavê min ew jî li wî bû mêvan

**XWENDIN**

Xwendin nebî kes naçe pêş,  
Peyda dibin pir derd û êş,  
Her dem di bin destê neyar,  
Em dê bidin xûkî û bêş ,

Ev tac û şewket xwendin e,  
 Ev dîn û dewlet xwendin e ,  
 Ev serbilindî xwendin e,  
 Ev dewlemendî xwendin e,

Herçî nexwendî rêncber e,  
 Ê ku bixwêne rêber e,  
 Her dem di nêv xan û sera,  
 Serkar e, ya serwer e,

Ev tac û şewket xwendin e,  
 Ev dîn û dewlet xwendin e,  
 Ev serbilindî xwendin e,  
 Ev dewlemendî xwendin e.

Xwendin divê hem pir xebat,  
 Bo milletê kurd û welat,  
 Kurdno ji xew rabin hemî,  
 Mizgîn li we, roja me hat.

Ev tac û şewket xwendine,  
 Ev dîn û dewlet xwendine ,,  
 Ev serbilindî xwendine,  
 Ev dewlemendî xwendine

### **HALÊ GUNDÎYA**

Xanî ji kelpîç pir teng û nexweş ,  
 Reş û bê ronî ji dixanê reş,  
 Hin pez û dewar di nav çavên wan,  
 Kufletên wan pir, ne pênc û ne şeş,  
 Wek kuna rovî govik û şkeft,  
 Rind in ji derdan bûne wek heneş,  
 Kûr in weke koz tev gemar û toz,  
 Jê tê bîhna pîs tev av û dilop,  
 Tev mêş û kelmêş pêşî û dûpişk  
 Kolma sehê reş, hêlîna miqrop  
 Li dora bîrê teqan û çirav,  
 Her der weke hev ne rêş û ne şop,  
 Hawîrdora gund tev qerş û gemar,  
 Sergîn û tepik gihane ber dev,

Jin û keçên wan li guhera pez,  
 Pişkul û rîxan her ro didin hev,  
 Ba û babilosk toz û tirabêlk,  
 Li wan didêrin bi roj û bi şev,  
 Sergo li ber der, pir xweşe ew der,  
 Her kes diçin ser odeyê ew nav,  
 Li hev dicivin ji cî nalivin,  
 Hin bi tîfold, hin jana zirav,  
 Ava devê hev hemî vedixun,  
 Bi şadî û ken çî xweş e ew nav  
 Hawîr nexweşî li ser wan da tê,  
 Derman ji doktor çawa bikirî,  
 Xwe xwedî dikin sal bi sal bi zor,  
 Zor dane ser wan sorik û xurî,  
 Her kes dil bi xem zor û stem,  
 Qêrîn û hawar nalîn û girî,  
 Tim bi reş û şîn hemî dilbirîn,  
 Hin kor û bawî hin keçel û qop,  
 Axa û began ew kirne talan,  
 Tebeqa mêrkuj tebeqa zirzop,  
 Malê wan nîne, hemî birçîne,  
 Tim davêjin top, tim davêjin top  
 Şev û roj xebat, dîsa tev birçî,  
 Yan nan zebeş yan nan û mehir,  
 Pirê wan pêxwas, bê şal û kiras,  
 Cixare vexwar, ne hiş û ne bîr.  
 Kulla pir giran besa li ser wan,  
 Van şêr û melan ew hiştin feqîr,  
 Cotkar û karker tev bê ser û bêr,  
 Birçî û reben hemî palevan,  
 Comerd û camêr hemî wek şêr,  
 Her şev li cem wan rêwi û mêvan,  
 Ne xema waye çiqas birçî bin,  
 Çiqas tazî bin, hemî dilovan.

### **KÎNE EM**

Kîne em?

Cotkar û karker

Gundî û rênçber  
 Hemû proleter  
 Gelê Kurdistan  
 Şoreş û volqan  
 Tev dînamêt in  
 Agir û pêt in  
 Sor in wek etûn  
 Agir giha qepsûn  
 Gava biteqin  
 Dinya dihejî  
 Ev pêt û agir  
 Dijmin dikujî  
 Kîne em?  
 Hey hey hey kîne em?  
 Em in rojhilat  
 Tev birc û kelat  
 Tev bajar û gund  
 Tev zinar û lat  
 Ji destê dijmin  
 Dijminê xwînxwar  
 Xurt û koledar  
 Ji Rom, ji Fireng  
 Di rojên pir teng  
 Bi kûştin û ceng  
 Parast, parast  
 Parast min ev rojhilat  
 Kîne em?  
 Hey hey hey kîne em?  
 Kîne em?  
 Gelê serfiraz  
 Dijminê dijmin  
 Dostê aşîxwaz  
 Em xweþ mirov in  
 Ne hirç û hov in  
 Lê çibkim bê şer  
 Dijmin naçê der  
 Bav û kalê me  
 Dixwastin serbest  
 Naxwazin bijîn  
 Ta ebed bindest  
 Kîne em?

Hey hey hey kîne em?  
 Em in ew Kurdê  
 Serhişk û hesin  
 Îro jî dijmin  
 Ji me ditirsin  
 Bêhna barûdê  
 Kete pozê min  
 Dixwazim hawîr  
 Biteqim ji bin  
 Dîsa wek mêra  
 Dikevin çiya  
 Naxwazim bimrin  
 Dixwazim bigrin  
 Kurdistana xwe  
 Axa Mîdiya  
 Kîne em?  
 Hey hey hey kîne em?  
 Em in ew Kardox  
 Xaldêwê kevnar  
 Em in ew Mîtan  
 Nayrî û Sobar  
 Em in ew Lolo  
 Kardox û Gûtî  
 Em in Mad û Goş  
 Horî û Gudî  
 Em in Kurmanc û  
 Kelhor, Lor û Gor  
 Em in, em Kurd in  
 Li jêr û li jor  
 Çend hezar salin  
 Kurdistana me  
 Perçe perçe ma  
 Bindestê dijmin!  
 Îro ji Lor û Kelhor û Kurmanc  
 Ji dest xwe berdan ew text û ew tac  
 Hinek bûn axa, hinek jên bûn beg  
 Hinek jên bûne cahşê jardara  
 Kurdistan firot wan tev neyaran  
 Bûne mezhebdar, bûne olperest,  
 Bûne paşverû, bi tizbî û xişt  
 Ta ku dijmin şikand li me ser û pişt,

Me dan bin lîngan dewlet û hebûn,  
 Bûn dijminê hev perçe perçe bûn  
 Ta ku Kurdistan  
 Ta ku Kurdistan  
 Ta ku Kurdistan  
 Jar û perîşan ket e bin destan!  
 Ketin xewê, ketin xewê  
 Ketin xewa zîlm û zorê  
 Ketin xewa bindestiyê  
 Raketin, raketin  
 Yekcaran serê xwe rakirin  
 Lê dijmin serî zû jêkirin  
 Yek carna bi hêz serê xwe rakirin  
 Lê dijmin serî zû jêkirin  
 Lê li vî xakî  
 Li vî erdî tovên jîyanê hatiye çandin  
 Ev erdê jîyanê ye  
 Germ dibe, sar dibe  
 Dikele, dikele, dipijiqîne  
 Brûskê tavê tavan hiltîne  
 Ronahî dike rojê li welat hiltîne  
 Her wekên Kawa li ser xwe pêk tîne  
 Niştimanperweran diwelidîne  
 Em in ew gela  
 Belê em in ejdeha  
 Ji xewa dîlî şiyar bûn niha  
 Dixwazin wek mêr  
 Tev mejî û bêr  
 Rabin her wek şêr  
 Serê xwe hildin  
 Çi serbilind in  
 Bi cîhan carek  
 Em bidin zanîn  
 Rêçika Markîs, Rêçika Lenîn.  
 Kurê Guherz û Ferhad û Rustem,  
 Kurê Salar û Şêrgoh û Deysem.  
 Bejin bilind in  
 Wek dêw bilind in  
 Em dest dirêj in  
 Serbest dibêjin  
 Dixwazin bi lez

Gavan bavêjin!  
 Kîne em?  
 Hey hey hey kîne em?  
 Ne xwînxwar in em,  
 Aştîxwaz in em  
 Serdarên bilind,  
 Gernas in herdem  
 Em şer naxwazin,  
 Divên wekhevî,  
 Em paş ve naçin,  
 Lê dijmin direvî!  
 Divên bi şêwrê, lê ew qebûl nakî  
 Divên biratî, lê ew qebûl nakî  
 Bûye wek rûvî  
 Li paş xwe nanêrî  
 Kine em, kine em, kine em...  
 Gelo bavê mî çî bikin?  
 Naxwazin însanî  
 Êrîş bikin û bigrin  
 Histu bişkînin  
 Ev pîsên mirdar  
 Ji nav me derxînin  
 Ji bo mirovan em tev dost û yar  
 Bijî Kurdistan, bimirî koledar!  
 Kine em, kine em, kine em...





**CEMAL SUREYYA**

1931 Dêrsim - 9 Berfanbar 1990 Îstanbûl

**EV YA ME**

Evînek bi rûxîn e ev,  
Dirûxîne nava mîlet  
Barê bengînîyê.

Evînek cudakar,  
Nan û avê pardike  
Rojê sê dahna.

Evînek xayin e ev,  
Wê mala wê diz têkevê  
Ya wî polis.

Evînek bêzagon,  
Zewacê  
Qet û qet nafikire.

Evînek keleş e ev,  
Ji awazên herî ji rêzê jî  
Şabûnan didewşirîne.

Evînek koka wê li derve ye,  
Pir zêde dişibe  
Ya Dante û Beatrice.

Evînek dagîrker e ev,  
Kadîn ya şadibe dibê  
Tiştekî din nabê.

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)

## ÎTALYA



CESARE PAVESE

09 Îlon 1908 Torîno – 26 Tebax 1950 ji ber ku negîha evîna xwe dawî li jiyana xwe anî.

## DAWÎYA XEYALÊ

Nikari ji nuh de destpêke êdî vî laşa.  
Gava mere dest bide çavê wî, zîndebûna komê ax  
hisdike yek. Gava şevêq lêxe jî  
axek ku nikare xwe bêdeng bihêle ew.  
Laşekî mirî ye, ew yê ji gelek şîyarbûnan  
maye lê.

Hêza me nîne ku em heroj dest bi jîyanê bikin  
-Li ber axê, di binê ezmanekî bêdeng de-  
li hêvîmana ji nû de şîyarbûnekê. Ecêbmayî dihêle meriv  
ewqas westandina vebûna şevêqê. Karek pêktê  
di nava van şîyarbûnên ji nû de.  
Belê tenê ji bo li karekî pêşde heyecanê zêdebikin  
û ji bo em carekê pelê şîyarbikin dijîn.  
Û carna em digehên wir, piştê bi me re  
bêdengî destpêdike.

Rû nedilivîya dest bi sivikî pêbiba  
-destê zindî hisdike ku bi jîyanê bibe-  
Vê axa sar, ku ne sarbûna axa bi şevêqê re  
bûye qeşa belkî jî bi rastî ji nû de şîyarbûn e.  
Û bi lédana şevêqê re jîndarên hişbûn  
gotinan dibêjin dîsa. Lê destê min dilerize.

Û hemû jîndar dişibin destê bêliv.

Demekê janek zuha

û şebikandina ronîyê bû di şeveqê de şîyarbûn.

Lê dîsa jî gehîştina azadîyekê bû.


Gotina axê ya bêadanî kêlîyek kin bikêf bû.

Û dîsa li wira vegerandinbû mirin. Laşê ku niha

venegerîya axê gelek şîyarbûnên jinûde dipê.

Ji wêya behsnake lêvên hişkbûne jî.

## FRANSA



CHARLES BAUDELAÏRE

09 Nîsan 1821 Parîs – 31 Tebax 1867 Parîs

## MIRINA EVÎNAN

Wê nivînên me hebe, bi bîhna sivik tije,  
 Wê dîwana me hebe, mîna gorekê kûr;  
 Wan kulîlkên xerîb, yên demsalên herî xweş  
 Ku ji bo me vebûne wê masê bixemilane.

Wê bi tolazî germîya xwe ya dawîn xercbikin,  
 Wê bibin meşaleyên pîroz dilên me;  
 Ji herdu ronîyan şopek wê her û were  
 Di ruhên me herduyan, di cotê eynikan de.

Di seeta êvarek şînê xwedayî, helesor,  
 Bi xatirxwazîyê tijî, di dema îskînek dirêj de  
 Wê navbêna me de vêkeve ferekî brûskê bitenê;  
 Di dawîn de wê derî çenekî vebin,  
 Wê perîyek dilsoz û şên were şîyarbike  
 Eynikên bi xumam û pêtîyên mirî

## Û R Û G Û A Y

**DANIEL VIGLIETTI**

Daniel Alberto Viglietti Indart, di 24 Tîrmeh 1939'an de li Montevideo ji dayik bû, stranbêjê gelêrî, gîtarîst, bestekar û çalakvanê siyasî ye.

**NAVNAME**

Kê got "pîşekar"?  
Mirovekî tekûz im ez  
Yê bi devê xwe xebatê dike  
Li hemberî tirsê

Mirovekî birîndar  
Welatekî dinale  
Dar û ber û hewa  
Ne mêrxasek  
Ne jî tirsonek

Ne aleyek stran dibêje  
Bi tenê mirovek im ez  
Ne pir, ne jî hindik  
Bi roj û şev  
Li bedena min vedibe

Yê strana hêvîyê pêdixe  
Û bêxapandina ku yên ji nuhbûnê bawer nakin  
Yê li pêş dinere

## KURDISTAN

**DILDAR – YÛNIS REUF**

20 Sibat 1918 Koysincaq-20 Cotmeh 1948 Hewlêr

**EY REQÎB (Sorani)**

Ey raqîb her mawe qewmî kurd ziman,  
Nay şikên danery topî zeman. x2

Kes nellê kurd mirduwe; x2  
kurd zînduwe,  
Zînduwe qet nanewê allakeman. x2

Lawî kurd hestaye ser pê wek dilêr,  
Ta be xuên nexsîn deka tacî jiyân. x2

Kes nellê kurd mirduwe, x2  
kurd zînduwe,  
Zînduwe qet nanewê allakeman. x2

Ême rolley Midya u Keyxusrewîn,  
Dînman, ayînman her Kurdistan x2

Kes nellê kurd mirduwe, x2  
kurd zînduwe,  
Zînduwe qet nanewê allakeman. x2

Ême rolley rengî sûr u şorrişîn,  
Seyrîke xuênawiya raburdûman. x2

Kes nellê kurd mirduwe, x2  
kurd zînduwe,  
Zînduwe qet nanewê allakeman. x2

Lawî kurdî hazir u amadeye,  
Giyân fîdane, giyan fîda, her giyanfîda. x2

Kes nellê Kurd mirduwe, x2  
kurd zînduwe,  
Zînduwe qet nanewê allakeman. x2

Ey

### **EY REQÎB (Kurmançî)**

Ey reqîb her maye qewmê Kurdziman  
Naşikê û danayê topê zeman. x2

Kes nebê Kurd dimirin x2  
Kurd jîn dibin.  
Jîn dibin, qet nakeve ala Kurdan. x2

Em xortên rengê sor û şoreş in  
Seyr bike xwîna tiya me da rijand. x2

Kes nebê Kurd dimirin x2  
Kurd jîn dibin.  
Jîn dibin, qet nakeve ala Kurdan. x2

Em xortên Medya û Keyxusrewin  
Dîn îman û ayînman, her niştiman. x2

Kes nebê Kurd dimirin x2  
Kurd jîn dibin.  
Jîn dibin, qet nakeve ala Kurdan. x2

Lawê Kurd rabûye ser pê, wek şêran  
Ta bixwîn nexşîn bike tacî jiyân. x2



Kes nebê Kurd dimirin x2  
 Kurd jîn dibin.  
 Jîn dibin, qet nakeve ala Kurdan. x2

Xortên nûh tev hazir û amade ne  
 Can fîda ne can fîda, her can fîda! x2

Kes nebê Kurd dimirin x2  
 Kurd jîn dibin.  
 Jîn dibin, qet nakeve ala Kurdan. x2

### **MINDALÊ HÎVA**

Mindalê hîva, kolka dîlan,  
 Teze xunça nav baxê gulan,  
 Her çend seyrî nav çavê te dikim,  
 Nabînim girê ne zor û ne kêr,  
 Rû û rengê te mîna esmanê saf,  
 Wextê perşenga rojê dide tav,  
 Tîrêja ûmûd ser dilê tarî,  
 Li esmanê rût dide diyarî,  
 Seveyla çavê te birqedar ,  
 Ronaka pake wîneyê te ruxsar,  
 Kenîna bê fêl in lêvê te al ,  
 Neşa herdu çavê te mest û kal ,  
 Bê şik mizgîna me pêşîn e, dilê şade,  
 Yan ji nexme xana baxê me azad e,  
 Umûda paşerojî, kurê hîva tuyî,  
 Hîva min bi tey e, teze mindal ,  
 Siba bibe nimûna dengê mîsal.  
 Van qisê ku ez wa gilî dikim,  
 Biziringîne guhê xwe herdem,  
 Rastgo be, herdem qet derew nekî,  
 Wext bê sûd ji dest der nekî,  
 Têkoşe, her dem mîna heng be,  
 Li meydana jînê hazirî ceng be,  
 Ev e ji tera dibêjim, qenc bizane,  
 Jîna meriv barê giran e,  
 Nek wa bizanî mîna jîna duhînê,  
 Dixuyî, dinivî tu li nav nivînê,  
 Ew jîn nîn e, ku mîna jin bijî,

Divêt hem azad û hem mezin bijî,  
 Rojekê wê bê, tu yê pêra bigihîjî,  
 Çavê xwe vekî, bizanî jîna nemir neji,  
 Tu yê bibînî, ku jîn çiyayê berz e,  
 Rîya we xwar, jor bi tirs û lerez e,  
 Gişk kend û kusp û deven e û dar e,  
 Tijî dirinde û dupişk û mar e,  
 Ger rîya te hemû dan e û daw e,  
 Nezan û dana tê da bê taw e,  
 Ruh û canê min, tu yê bikevî vê rêgê,  
 Li vê telê û daw, çerx û dezgê,  
 Gelek biwestî, xwêdanê birêjî,  
 Wî derdî û îşî yek-yek biçêjî,  
 Li rêya serketinê divê pêşkevî,  
 Heta yekî divêt ser kevî,  
 Nîşana tîra xwe bide ser rêyan,  
 Ku li şûna te rêzan girêdin, herin her deran,  
 Divêt tu çira zanîstî hilkî,  
 Destê min dawa te rê wunda nekî,  
 Bîr û hişê xwe baş bi kar bîne,  
 Vê danê û dawê yek-yek bipesîne,  
 Heta der nekevî ji hemû dinya,  
 Çiqas wan kir, tu bimirî, lê kurdê her bimîne.

### LAWÊ KURD

Tu dizanî ey weten, îro bo çi bêbeşî,  
 Bo çi destê şev nîşanî te dida nema reşî,  
 Bêjme te esbabê mezinî zillet û çarereşî,  
 Gencê kurdan her li wextê meyê dîkin xîretkêşî,

Wextê bade tê ser meclisê, navê kurd tê ser ziman,  
 De were seyrî fikrê ke û ax û daxa lawan,  
 Rengê nalîn va li guhda dibêjin bê guman,  
 lawê kurdan her li wextê meyê xîretkêşî.

Û di gel dengê tîfing û agirê hinav da,  
 Û di gel nalîna weten ger te ji zindan da  
 Dikeve guhê min bi şewat hewar dike li vê hanê da,  
 Lawê kurdan her li wextê meyê dîkin xîretkêşî.

Sîleha her milletê sade li stuyê gencan e,  
 Roja şixul bexşî ûmûd fikir û karê gencan e ,  
 Her hemû kirne kul û birîn, hem li rencan e,  
 Lawê me jî her li wextê meyê dikin xîretkêşî.

Çimkî millet be tole jî be, lawo, ruhê vî leşî,  
 Bê te eva ruha namîne, ew li jînê bê beş e,  
 Eynî derdê kurd e, ku kete derdê karê dawesa,  
 Milletê gencê wî sist be , mirî ye, najî,  
 Şadmanî textê jîn û tacê ezet nîne,  
 Lawê kurdan her li wextê meyê dikin xîretkêşî.

Miletê ku lawê wî cust be , dijî, qet namire,  
 Qet tu cara dest û pê wî wa li bendê nabe,  
 Sed hezar tîxê zemanê be, stuyê te nabire,  
 Lawê me ji'ner li wextê meyq dikin xîretkêşî.

Eyb e-eyb, lawê kurdan, seyrî lawê xelkê bikin  
 Fikra bêbakî, bi ser çû, bade hiş û kellê xwe,  
 Dewra xewê bi ser çû , binêr li dor berê xwe,  
 Eyb e, çêtir bes li wextê meyê mekin xîretkêşî,

Seyrî nakin lawê xelkê, gişte bazû qewet in,  
 Gişte sûdbexşîn, welat û merkezê sed hêmet in,  
 Bo çi anîna karê ciwan li riya mihnet in.  
 Eyb e, çêtir bes wextê meyê mekin xîretkêşî.

Lawê xelqê tîne ser xwe, canfîda kar dikin.  
 Bo niştiman xwe gişt xunkarî dikin.  
 Icar bo fewtina dijmin neçîra xelqê dikin,  
 Eyb e, hûn jî her wextê meyê mekin xîretkêşî

Hûn seyr nakin çend bi tîne destê lawê xelqê,  
 Ger bê wextê kîne, radibin ser pê wê deqê,  
 U ji tirsana dilerizin gayê çerxa dinya û sema,  
 Lawê kurdan, bes e li wextê meyê mekin xîretkêşî

U şayrêd esra bîstem, hêmet e, hêmet bikin,  
 Mêveke, dareke, hêmet xizmet e, xizmet bikin,  
 Melhema kul û birînan qudret e, qudret bikin,  
 Hûn heta kengê her li wextê meyê bikin xîretkêşî

Seyrî ehwalê weten kin çawan ji bûnê mirîye,  
 Seyrî karê dijmin kin çî bi halî kirîye,  
 Seyrî reşmal kin zelalet esman girtîye,  
 Hûn heta kengê her li wextê meyê bikin xîretkêşî

Seyrî baxê weten kin, hişk bûne, bûne xezan,  
 Seyrî xunçê nû bişkivî kin, çend beban naz helweran,  
 Şahdê bêkarî hûn in, we va ye av hate birîn,  
 Eyb e, ta kengê her li wextê meyê bikin xîretkê

Eyb e, lawê xudanê vî çîyayî û daxa kurdî tu,  
 Xudanê tarîxa xûnîn û delirî û gurdî tu,  
 Eyb e, bêkarî , heta kengê seyrî nakî, mirî tu,  
 Eyb e çêtir bes li wextê meyê mekin xîretkêşî

Rabin ey lawno, we tê bigihînim, millet mana çî ye,  
 Ku bizanin xên ji mezheb rêga çî ye,  
 Rabin, rabin, bes, li wextê meyê mekin xîretkêşî

Millet yan bi nîkê rima dijmin dibe bêhiş,  
 Seyrî dor berê xwe bikin, rûnên li rex beroş,  
 Agrê hestî bi zilleta we li dilda bike coş,  
 Rabin, îcar nek li wextê meyê bikin xîretkêşî.

Millet ku ji zirîna toq û zîncîr rabe ser xwe,  
 Wê toqa hêsîrî ji stuyê xwe û milletê xwe bavêje.  
 Werin ser xwe, bizanin, hun ji rê derin,  
 Rabin îcar bes li wextê meyê bikin xîretkêşî.

Rabin, heta kengê ha li jêr axê rizî bin,  
 Rabin heta kengê mirîyê nav dawê bin,  
 Rabin, rabin, bes wextê meyê mekin xîretkêşî,

Her kesê pişta wî li gerdûn be, pişta wî wê bişkê,  
 Her kesê çav li destê ecnebî be, wê kor be,  
 Rabin, rabin, bes li wextê meyê mekin xîretkêşî

Miletê ger xûnê nerêje, dest û pê wî ve nabin,  
 Bê kifa guftar û siqeya jîn nayê standin,  
 Bade û mestî miqamê hurîyetê nayê girtin,

Rabin, rabin, bes wextê meyê mekin xîretkêşî.

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



**DOGAN CEREN**

1959 Alçiçek, Nûrhaq

**NEBÊ HIŞ JI MIN RE**

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Wê ji ezman stêr biherikin  
 Şînahî tarî bibin  
 Wê brûsk vedin  
 Ji dûr ve ewr bicivin  
 Wê xemgîn bibe heyveron  
 Bibe baran û şil bike porê min  
 Di bedena min de wê bilerizîne dilê min  
 Nikarim dîsa germ bikim yektaya min  
 Rahme nabê hiş ji min re  
 Wê gemarî bibe rengê avan  
 Qaqlîbaz bifirin wê ji nava min  
 Şamendîyên min bigirin û bibin  
 Bibin û tevî bikin wê  
 Wan sorahîyên mirî yên rojava  
 Wê bibe dilopek xemgînî şamendîyên min  
 Gava roj biçê ava bi zar dibin  
 Ê tevî avên herî şêt dibin  
 Li rûyên min dikeve bi gufe guf  
 Wellehî nikarim birevim

Rahme nebê hiş ji min re  
 Qîrînên safitîya zarokî dipêçe  
 Çarhawîr, nikarim bixapînim  
 Nikarim aşt bikim  
 Nikarim bimirînim  
 Wê bibe derew  
 Wê bibe mar  
 Tune bike wê  
 Xweristîya kesîtîya min nakişînim  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Serê çiya dipêçe mij û dûman  
 Xezal dernaxin ji hev  
 Bihara xwe  
 Zivistana xwe  
 Bi xêrê digerîne gur xewna xwe ji birçîna  
 Tu dizane ku nikarim vê rewşê hilgirim  
 Ger nemîne çara min  
 Ger biqede derman  
 Ez'ê bibezim li pey felekê  
 Ji pey wê naqetim

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Wê bahozek biqete ji nava min  
 Nikanim rawestînim  
 Li çolên evîne Ferhatek im  
 Çîyan kun dike hêvîya min  
 Evîndarim ez

Rahme nebê hiş ji min re  
 Mîna tîhbûnek çola zuha  
 Neçarîyek dipêçe ruhê min  
 Ji qêrînan parçe parçe dibe navdilê min  
 Di çavê min de vêdikeve  
 Hêrsa agirekî venemirî  
 Nikarim vemirînim  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Dibe xezalek kuştî evîn  
 Li ser wê kom dibin kelaxur  
 Wawîk dizûrin  
 Dibe nire nira keftaran

Dest didin hev hemû yekser  
 Dimeşin di refê cenazakî de  
 Cizwît şerm dikin li ser navê serdema navîn  
 Kîlît dibin naqosên dêran  
 Dernayên êdî dengê azanan  
 Bi navê olên nû  
 Fedî dikim ji mirovahîya xwe  
 Wellehî sedsal jî nikarin min bikenînin

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Yên bi evînan dikenin jî hene  
 Agirê tirsê tê gûr kirin  
 Ê rastî tê şewitandin  
 Evîn tîn sûcdarkirin  
 Ê bi benê cehaletê tê daliqandin  
 Jîyan şûna bênderek bêzad  
 Mîna heywanekî stewr  
 Ji zayinan bêhay  
 Xwe avêtîye himêza mirinê  
 Mîna dîlê qederê yê bi zincîr  
 Bêdeng  
 Bêhes  
 Bi alîyê xwe yê mirovî neçar

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Wê bibilin stran  
 Awaz wê bigirîn  
 Wê dil rawestin  
 Li wê kela kevn wê bê gerandin  
 Ê pişt re wê rev dest pê bike ji jîyanê  
 Wê bibe mîna zerbûna gîhakî xwîsî lê barîyayî  
 Kesayetîyên windabûyî  
 Her tişt bê daxwazîyek  
 Ê sextekarîyek e  
 Her dijî û dijî  
 Awirên ji tarîyê hez dikin  
 Konetîyek rovîtî ye  
 Çavên di bêdengîyê winda bûne  
 Hêlînek dûmana xayin ya bi mij e



Dil  
 Sarayek xapînok  
 Ya derewan lê text vegirtî ye

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Welleh nikarim hiş bibim  
 Wê lal bibe zimanê min  
 Ji hezar cihê wê bişikê  
 Destê min  
 Milê min  
 Wê bibe çûkekî birîndar evîna me  
 Dilê min wê biarîne nahewim  
 Wê bibe gula beravêtî evîna me  
 Ji nişka ve wê biçelmise û biçe  
 Nikarim bîn bikim  
 Wê bibe ajek hişkbûyî  
 Di çavên min rabe wê rehên wê  
 Nikarim dîsa şînkirin bidim gula evînê

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Ji alî evînê  
 Azadîyê  
 Kedê  
 Ew bêyî min  
 Ez bêyî wan nikarim bijîm  
 Ger temenek be yê ji min tê xwestin  
 Ji yekî li yê din nagere destê min  
 Nikarim ji sisêyan bi yekî ve bêm girêdan  
 Azadîya bê evîn  
 Evîna bêked vala ye yara min  
 Jîyan ji min ez ji jîyanê qet nikarim bixeyidim

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Her bêhêvîtî  
 Ji hêvîyekê re hezar kefen e  
 Baharê bigire  
 Zivistanê bavêje  
 Rastîyê bibîne

Xeyalan biqewirîne  
 Ji bîr meke ku yên ji bo ronahîyê şer dikin  
 Divê mîna rojê germ binêrin li jîyanê  
 Yên bawer dikin ji pîrozwerîya evînê  
 Xwedîyê dilekî evînşewat in  
 Lewra ew rengên jîyanê  
 Di bêdawîya evînê de diberhimînin  
 Û ji rika bêrîkirinan re her kêlî  
 Bi coşîna çemekî dikin roj  
 Dikin şev  
 Di bêxêrîya çirkên diherikin û diçin  
 Wê jîyanê bikin gulek bête bîhnkirin  
 Evîn wê bibe lehîyek xuroş di dilê wan de  
 Wê biherike biherike bibe robar  
 Di nava vê jîyana çola hişk de  
 Wê bibe dengiz di şînahîyên bêdawî de  
 Miz bide wê gîyanên bûne kevir  
 Wê di hezar şêtiyê de zîndetîyê bîne  
 Ji nêrînên ziq sekinî re


Yara min  
 Bi navê hemû evînên hestan vêdixin  
 Ez li îmajekê digirim  
 Ji van mel'ûnên nîvzindî re  
 Ez êloyekî berata xeyal dikim  
 Ji marên ku jehrê vedirşin  
 Ez rastîyek tazî pêşkêş dikim  
 Ji derewên durû re  
 Ez asê dibim li vê evînê  
 Dîhn dibin  
 Bi qeşmerîyan didin kenandin  
 Jiyana wan ya mexelê lîtavekê  
 Wan gotinên wan yên bêkêr ku bûne kevir  
 Bihêle yektaya min  
 Bihêle  
 Bila agirê evîna me vêxe  
 Vê loda sergo bêndera gotinan

Yara min  
 Cemre li şanaziyan ketîye  
 Hest radest e ji xembarîyan re

Ax yara min ax  
 Kê hez kirîye mîna me  
 Bêşik û bêderew  
 Kê miz daye bi destê dînarîyê  
 Li ser pelê dilopa avîyê kê  
 Kê kul û xem zêde kiriye  
 Li tîrêjên şeveqê yên pêşî kê  
 Kê gemara xwe şuştîye bi barana stêran  
 Kê avron daye ber kulma  
 Ê mêtin daye bi pitika hêvîyê kê  
 Ma têkdiçe evîn  
 Ji alî ordîyên sawêran  
 Bêje ku bira mirina min ji evînê be  
 Bira di dilê min rabin tîrên evînê yên herî xafil  
 Bes bira ruhê me evîn rapêçe

Yara min  
 Rahme nebê hiş ji min re  
 Bira sûcê min bibînin û dardakin  
 Çavên min derxin û bidin yarê  
 Ger bi destê evînê têkevim gorê  
 Wê di gîyanê min gul vebin  
 Ne ku brîn...

D. Y. A M E R Î K A



EDGAR ALLAN POE

19 Rêbendan 1809 Boston - 07 Cotmeh 1849 Baltîmore


**XEYALEK**

Di nava dîdara şeva tarî de  
 Min xeyala şanazîya wenada kir.  
 Lê bi dilşikîn min şîyarkir  
 Dîdara jîyan û ronîyê.

Ax! Ma tiştêkî na xeyal be heye birojê  
 Bi rohnîyek di cavan de ku ji derbasbûnê tê  
 Ji bo kesê li dora xwe dinere?

Wê xeyala pîroz-wê xeyala pîroz,  
 Gava hemû cîhan şermezar kir  
 Mîna taceronîyekê min şanaz kir  
 Ya tenê rê pêşî ruhekî dike.

Çi bûye bişev û di bahozê de  
 Ger dilerize ronîya li jorêjoran?  
 Ma jê zelaltir heye  
 Ji stêra biroj dibiriqîne, ji rastîya wê!



EDÎP ÇELÎK

**PACEYÊ MAWZERAN XEMGÎN IN**

Kon

Mûyê bizinan reş

Çar dîwar

Û bi stûna navîn

Daliqandî disekine çeka me

Me vê çeka

Radest nekir qet.

Her şoprêçik

Qurmê mazî

Rastê zozana

Dîtin şerê me..

Ji zilmê re sîper sînga me

Lê gula min

Ji zalim re mertal

Me hûnand xelekên zincîran

Agirî

Koçgîrî

Dêsim

Sason

Zîlan

Bi xwîn derdibe dilxweşîya me..

Di xanîyên ji axê  
 Ku me mirin bi derhem ji wan qewitand  
 Ku bi herîyê me seyand  
 Paceyên mawzeran  
 Xemgîn...  
 Xencera xayintîyê  
 Kun kir parsûyên me  
 Encax.  
 Di zimanan de stranên me  
 Di dest de çekên me  
 Destbirakîya me  
 Di germîya xwîna teze de ye..  
 Xayintî  
 Wê ji pişta xwe derbê buxe!..

#### **XANEYÊN DEFTERA MIN (2)**

1

Di birîna gandêr  
 Ya singoya Osmanî  
 Devê mêtinkariyê yê kor  
 Bi kêr  
 Bi xwîn  
 Di vê dera min de..

2

Erd qelişî ji ezman  
 Qûlekî xwedê negot of.  
 Kevirên wê li nenûka me ket  
 Tu yekî ji me negot ax..

3

Bi qasî ku dûyê pixêrîyên me tevlihev bibin  
 Em nêzî hev bûn  
 Bi qasî ku em dengê kuxukên hev his bikin.  
 Loma çîya tevli gotinê min dibin  
 Çêrî kevirên sînora dikim..

4

Hesinkiran mîrkut danîn ser sindan.  
 Seba rakin em vê îpoteka bêberdêl  
 Bê çiqas dem em sekinîn.  
 Av radiza, lê dijmin ranediza

5

Dengê blûrê ye ji dûr ve  
 Stranên kevn jî tevlê dibin û tê  
 Qada Melezgîrt`ê..  
 Dayê  
 Ax  
 Min  
 Li wê derka  
 Derb xwarîye.

6

Bav gogan dîyarî zarokên xwe dikin  
 Lîstokên ji ezman dikevin erda Sason  
 Bi xof in  
 -ne tirsonek in-  
 Zarokên  
 Memanîya  
 Û  
 Celalîyan..

7

Biryara pûşt ya bêbext dizanim  
 Jinên me rakirin çiyê  
 Ên mirin pitikên me bûn

Ar hey e, namûs hey e  
 Em`ê çi bêjin li rûyê dunya û alemê  
 Wê çawa rûyê me hilîne!.

8

Pêşde hatin  
 Ê jîyanê di tahma wê de bistirên  
 Biryar dan:  
 Êdî em  
 Di pêtîya gullê de

Ne pelek tenik in...

9

Ji her xeleka zincîrê

Min hêvî berda...

10

Reşaşên wan hebûn, reşaşên wan fîşek, fîşek

Topên wan hebûn, topên wan gulle, gulle

Bombên wan hebûn, hunerên wan yên bi bombardûman..

Qetarên me, karwanên me

Kerîyên me, celebên me

Di kozikan, antaqan de

Jinên me, bi lorînên xwe..

11

Dîsa jî gelê min

Ji tehlîyan re tehl derket

Tofanan netewand zendên wî

Tenê evîndarî heband camêrî.

Alên xwe, zer tevlî alên xwe kirin

Ji bo ber be ezman bê hildan..

Bi hesreta hev zarok anîn dinyê

Ji bo di mil hev de bimeşin.





**EDÎP GALIN**

1 Çille 1960 Licê Amed

### **STRANA AZADÎYÊ**

Li goristana azardilî  
 Sîya mirinê ye dar û gulî  
 Zarotîya min govend girt  
 Bi mirovên di şîna xwe de bêdeng man  
 Ditirsin  
 Ji rengê kefenê rizîyayî  
 Kefenê rûyê min dinixwême  
 Mirîyên bi xetên stûr  
 Li dilê min xetên tirsê kişand

Çend bidome demborî  
 Li rûpelan dibe qatqatî  
 Wê mîrata rengavêtî  
 Çend mezin bibe rastî  
 Jîyanê dikêşim nava xwe  
 Ji bo rojek nû

Tê sotin  
 Qurmê jîyana bihurî  
 Ji xak re dibe xwelî  
 Katê nû dide  
 Êdî ji rehên xwe yên kûr

Li ber sîya Pira Dehderî  
 Li ava Dîcle temaşe dikim  
 Ji nû de vedibin birînên min  
 Dîcle xwîn diherike  
 Dîrok di xwînê digevize

Şûrê Bedewî li ser gerdena kalê min  
 Yan xak û salat yan xwîn û mirin  
 Li dû wan hatin hovên Asya-Navîn  
 Xwîn tevlî arîya şewata jîyanê bû

Dîcle  
 Kevanê xwe yê bi xwîn lêdide  
 Li pira dipê têla kemanê  
 Bi dûrika xwe ya bi xumexum  
 Serpêhatîyek bi jan dibê

Li ser bircên Amed  
 Ji bilûra Kurmancekî  
 Awazek bi şewat diherike  
 Tevlî qîrîna Dîcle dibe  
 Ji deng û awaza herduyan  
 Strana azadîyê tê hûnan

## FRANSA



EDITH THOMAS

23 Rêbendan 1909 Montrouge – 07 Berfanbar 1970

Parîs, di şerê Îspanya yê navxweyî de beşdarî Komariyan bû. Di Şerê Cîhanê Dudoyan 1942'yan de beşdarî Partiya Komunîst bû û seroktiya wê kir.

## RABE Û BIMEŞE


Gelê mirî, gelê bêziman;  
 Gelê hatîye veşartin, gelê birçî,  
 Giranîya hîmekî kevir li serî  
 Li ser dilên wî;  
 Gelê li kuçan, li zevîyan  
 Gelên li duvrêzên mixazan  
 Bi zikê birçî yê di seqemê de gavan davêjin;  
 Bi solên xwe yên darînî  
 Yên her roj li metroyê siwar dibin  
 Rojek buharê di paca vekirî re  
 Mîna ku yên bi rev pirtûkan dixwînin.  
 Gelê Fransî, gelê Romen,  
 Bulgar, gelê Yûnan,  
 Gelê Sirb û tu, gelê Alman,  
 Kengî wê dem were?  
 Ma qey navê azadiyê nîn e  
 Hîn xweşik bû ew her sibe,  
 Mîna jinek dihat hezkirin  
 Hîn ciwan bû her sibeh.  
 Azadîya ku birc hilşand û derbasbû  
 Ya das rakirin berjor  
 Û dadwerîya sexte li erdê pehn kirin,  
 Ma navê azadîyê wenda bû êdî

Vê sibehê ji bo te?

Bêdengîya gelê di bin şikêrê de,  
Gelê dev girtî,  
Gelê bask û mil şikestî,  
Gelê ji qam de ketî,  
Di bin solên, li peyarêyê dûr dikevin.  
Bi tenê ji we tê keramet  
Û mîna gora li Lazar e  
Ji we pê ve nikare bêje;  
“Rabe û bimeşe...”

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)

## KOLOMBIYA



EDUARD COTE LAMUS

1928 Cucuta - 1964 Pamplona

## JI BO GUNDÎYEKÎ MIRÎ DÛRIK

Xwendin û nivîsandina te nebû,  
 Tenê ziman bû navgînê te,  
 Û wanî te behsa erdê dikir,  
 Şêrîntir dibû dengê te.  
 Dilê te, bi av û ba re  
 Te di got qey bi çemekî re diherikî û diçû.  
 Û gotina te li ezman vedida  
 Û dilgeşîya te rewşen dikir tavê.  
 Rojekê, çima û ji bo çi, te nizanîbû  
 Mirin hat  
 Girt û bir jîyana te.  
 Serê xwe hildabû ezman  
 Mîna ku deng li te dikir.  
 Û şêrînbûn çavên te, bedewtîrbûn ji asoyan,  
 Nerînek hogirî hebû di çavên te yê mirî de.  
 Û piştî,  
 Tovek hat çandin di axê de:  
 Bêdengîya te bi darekê hat nixumandin,  
 Bi vî awayî winda bû şopa mirinê.  
 Aniha jîyana te didome di ajên li ser te.  
 Di şaxan de bêhnvedanên te gohdarî dikim.

## K U R D I S T A N



EHMEDÊ XANÎ

1650 Xanî, Çêl, Hekarî – 1707 Bazîd, Agirî

**ŞERÎETA EHMEDE XANÎ**

Ger dê hebûya me padîshahek  
Laiq bidiya Xwedê kulahek

Tayin bibûya ji bo wî textek  
Zahir vedibû ji bo me bextek

Hasil bibûya ji bo wî tacek  
Elbette dibû me jî rewacek

Ger dê hebûya me ittîfaqek  
Vêkra bikira me inqiyadek

Rom û Ereb û Ecem tamamî  
Hem'yan ji me re dikir xulamî

Tekmîl-i dikir me dîn û dewlet  
Tehsîl-i dikir me ilm û hîkmet

Ez mame di hîkmeta Xwedê da  
Kurmanc di dewleta dinê da!

A ya bi çi wechî mane mehrûm  
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm?

Kurmanc ne pir di bê kemal in  
Emma yetîm û bê mecal in,

Fîl cumle ne cahil û nezan in  
Belkî sefîl û bê xudan in.

Ger dê hebûya me jî xudanek  
'Alî-keremek, letîfedanek,

'İlm û huner û kemal û iz'an  
Şi'r û xezel û kîtab û dîwan

Ev cins bibûya li ba wî me'mûl  
Ev neqd bibûya li ba wî meqbûl,

Min dê 'elema kelimê mewzûn  
'Alî bikira li banê gerdûn

Bi navê ruhê Melê Cizîrî  
Pê hej bikira 'Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqihê Teyran  
Hetta bi ebed bimayî heyran...

### Helbest

Ez mame di hikmeta Xwedê da  
Kurmanc di dewleta dinê da  
Aya bi çi wechî mane mehrum  
Bîlcumle ji bo çi bûne mehkum  
Wan girtî bi şîrî şehre şuhret  
Texsîrî kirin bîladê hîmmet  
Her mîrekî wan bi bezlê Xatem  
Her mêrekî wan bi rezmê Rustem  
Bifikir ji Ereb heta we Gurcan  
Kurmancî ye bûye şibhê burcan  
Rum û Ereb û Ecem tamamî  
Hemiyan ji me re fikir xulamî

### Her Dinalim

Her dinalim Şev û rojan, meger ez Eyyûb im ez  
Hêstiran her vedimalim, meger ez Yequb im ez

Bigirin dest ji me bêrûn, kul û derdan ku yek in  
Wer bi pêçin bi cefayê xwe, ku ez mektûbim ez

Hindekî xem hene daîm li min ew vêk dikevin  
Ez nizanîm ku bi çav wan çi qewî mehbûb im ez

Xem, telebkarê meye, em xo telebkarê dîyar  
Weh tilismê telebim ez, talib û metlûbim ez

Eceb îqbalî ji bo min nihe “Xanî” ku li bal  
Padîşahê xem û derdan, wehe ez merxûbim ez

### Textê Dîlberî

Îro li textê dîlberî, ya Rebb! Çi Şîrîn esmer e?  
Jê nabitin min dil birrî, ew dîlber e, yan dilber e?

Dil gorîya canane ev, hem dîn û hem îmane ev  
Hem lutfû hem îhsane ev, hem law û hem gerden zere

Kakul ji ber tacê bi zerr, ta ta wekî perr têne der  
Ser eskerê tîpa teter, serdar e yane serwer e

Ya Rebb hebîna reng feleq, horî teteq dagirt Şefeq  
Ya belg û netrik, ya wereq, ya qişt e, yana çenbere

Ew turre, ya keyso ne ew, zencî ne, ya hindo ne ew  
Şutrî ne, ya Şeb'bo ne ew, ya toxê Şahê sencer e

Ebrû ne yan cotek hîlal, Hindû ne yan nîŞan û xal  
Keysû ne yan Hezret Bîlal, meŞxûlê Ellah ekber e

Çav in gello? Ya serxweş in, ya kafir in ya dilreş in  
Bêmar in ew ya nexweş in, yan nêrgiz û cadûkher e



Ruxsar e, ya Rebb! Ya qemer, guftar e ya Rebb! Ya guher  
Ew qend e ya Rebb! Ya Şeker,ew suhd e yane xebere

Ew rûn e yan gulbergê al, alal e, yan dêma bi xal  
Qendîlê Nûra Zulcelal, mir'at e yana mezher e

Dêm, Şûşe nûra heqq di nav, dev xunçe ya Şirîn gulav  
Rux, sorgula rengîn xunav,xal, misk e,nîŞan Anber e

Lêv in gello? Yaqûtê can, yaqûte,ya qûtê rewan  
Ya qutîya durca diran, yan hewza ava kewser e

Ya Rebb xetê reyhanî ye ser sûretê Qur'anî ye  
Yan xatema sultanî ye, mir'at e, yane menzer e

Xal in gello ya fulful in, ew arid in yan sorgul in  
Em aşiqin, yan bulbul in,zîkrê wî werda ehmer e


Ew gerdena Şubhê Şemal, ser çesmeya ava zelal  
Qarûreya xemra helal, ya Şîse ye, yan mermer e

Ya Rebb! Qeda zîba ye ev, yan Ke'be ya Îsa ye ev  
Yan Mescîdul-eqsa ye ev, yan sidre, yana er'er e

Ya Rebb! Dilê dîwane ye, yan alimê ferzane ye  
Yan bulbulê wêrane ye, yan Êd e,yana mîcmere

Ew Xanî yê dildade ye, meŞreb ji rengê bade ye  
Derdê wî, yarek sade ye, lew her zeîf û rengzer e.

## Î R A N



EMER XAYYAM

Ji wî re Ebul Feth Omer bin İbrahim jî tê gotin.  
Di 1044-1123 Xayyam vac, felsefe, matamatîk û astronomî xwendiyê.

## ÇARÎN

Mirov dikişîne dikişîne û piştê azad dibe;  
Dur û lûl li zîndanên tînan hûnan.  
Pere û pûlên te nebe îro, bila xweşî be:  
Tasa îro vala dimîne, sibê tije ye.

Kê dîtîye wê bihuştê, wê dojeha?  
Kî çûye û anîye nûçeyê wê?  
Cîhanek kes pê nizane  
Ma hêjaye jê tirsandin, bêrîkirin?

Li ku ye tu? Vay serî hildaye min li ber te;  
Di nav tarîyê de me, li ku ye ronîya te?  
Ger bi îbadetê destbixim bihuştê  
Çi camêrîya te dimîne di vî karî de?

Xwestina pûtan, Kabê: Koletî;  
Daxwaza naqosan, azanan: Koletî;  
Mîhrab bû, dêr bû, tizbî bû, xaç bû:  
Çiye hesreta tevan? Koletî.

Tenê zanebûn bes e ji mirovbûnê re;  
Mirov dilsoz e an na, li wêya binêre.  
Tê hilbe jorê joran ku tu xwedî derkeve  
Li soza ku te daye gel.

Ji kirina neheqîyê bireve, têkeve rêya heqîyê;  
Nanê ku tu dixwe bi kesên din jî bide xwarin;  
Can nestîne, ji piştta kesî nedebire,  
Xistina te ya bihuştê ji alî min: şerabê bîne!

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)

D YA

**EMILY DICKINSON**

10 Berfanbar 1830 Amherst Massachusetts - 15 Gulan 1886

**PIRANÎYA ŞÊTÎYAN TÊGIHÎŞTINA HERÎ PÎROZ E**

Piranîya şêtiyan têgihîştinan herî pîroz e  
 Di çavên ku zanin binêrin  
 Piranîya têgihîştinan şêtiyek şilfî tazî ye  
 Ev li her deverê werê ye  
 Piranî hertim giranî datîne  
 Xwe bitewîne û piştê bigire, wê bêjin baqil ji te re  
 Piçêkî di berxwe bide, li hember derê, tu dîhnê tahlûke ye  
 Yekser wê li zincîrê bixin dest û pîyên te

**MEJÎ JI EZMAN FIREHTIR E**


Mejî ji ezman gelek firehtir e  
 Herduya bide berhev tu  
 Mejî bi hêsanî di hundirê xwe de  
 Him ezman, him te bi cîh dike

Mejî ji dengizê gelek kûrtir e  
 Dibe şînêşîn be binê dengizê  
 Lê mejî dê taviê wê bimije  
 Mîna avgirên ku dewlan dadigre

Mejî, bi qasî giranîya xweda ye


Hilîne, tu dixwaze derhem derhem biwezinîne  
Ma qey wê cuda bên dîtin,  
Kîte çawa cuda be ji deng?

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### NE TIŞTEKÎ DIN

Guman meke ku em`ê bifelişin û belav bibin  
Em gulleyên çekan dixwazin ji wan  
Ne tişteki din  
Gava Emrîka diherike û diçe di dîroka xwe de  
Ger bibirin rêça me qeyd û merbet  
Bitenê em kefenekî dixwazin  
Yê gelan bi hêstirê çavên xwe raçandî  
Ji bo binuxême ser gerîlan  
Ne tişteki din



### **JI BO AVA DENGIZÊ BELÎTE**

Dengiz

Devlikenîyek e ji derên dûr

Bi diranên pêlan

Bi lêvên perê ezman

Tu çi difiroşe keça behitî

Bi pêsrên xwe li hember bê

Ava dengizan

Difiroşim

Tu çi hildigire zaroka reş

Tevlî xwîna xwe

Ava dengizan

Hildigirim

Dayika min ji ku tê

Van hêstirên bi xwê

Ava dengizan e nuha

Ya ku ez digirîm

Dil vê jana bêsinor  
Ji ku çêbûbû gelo


Zehf tahl in  
Avên dengizan

Dengiz  
Devlikenîyek e ji derên dûr  
Bi diranê pêlan  
Bi lêvên perê ezman

### HOZAN Û MIRIN

Gava bi mirinê re serbiser dimeşîya hat dîtî ew  
Bêyî ku ji kêrendîya wê bitirse  
Dîsa jî ji barûyê heta barûyê roj  
Mîrku li sindan.  
Li sindan,  
Li sindanê agûnê hesinkiran.  
Dipeyivî Federico  
Bi mizdan, bi mirinê re. Mirinê lê guhdarî dikir.  
Hîn doh di ristên min de destbirakê min,  
Kûlmên te yên zuha dişeqîyan  
Hîn doh di risên min de,  
Hîn doh te xûşîya xwe da strana min  
Û di lawîja xwe de ezê tûjîya kêrendîya te ya zîvînî,  
Ezê te bistirêm, goştê êdî bi te ve nemaye,  
Çavên te yên tune,  
Porê te yê ba belav dike bistirêm  
Wan lêvên te yên sor ku tên ramûsan..  
Mirin, qereçîya min ya bedew, tu mirina min e doh jî îro jî,  
Ax! Çend hêminim bi te re tenê,  
Gava hewa Girnata dikşînim nava xwe,  
Girnata min!





### **DÎLBER**

Ey Dîlbera gerden zerî,  
Way nazika dêm qemerî,  
Qamet ji mûma fenerî,  
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera gerden letîf,  
Way nazika qamet elîf,  
Qamet ji reyhana xeffî,  
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera gerden zuzac,  
Way nazika mislî zuzac,  
Qamet ji reyhana qirac,  
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera qamet misal,  
Way nazika dilî hejar,  
Te ji xandinê kirim betal,  
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlberê, way Dîlberê,

Firyad ji destê keserê,  
Avik ji ava Kewserê,  
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera gerden zirav,  
Dêm şûşeye, tijî gulav,  
Ey duxtera bejna zirav,  
Wêran ezim, malim xirab.

Çavan ku hiltînî bi meste,  
Ew çend ya misrî bi deste,  
Li kuştina min te bi qeste,  
Wêran ezim, malim xirab.

Tu bi qesta min dikuji,  
Tu bi k'ifra di nosojî,  
Gelek sotim kirim rijî,  
Wêran ezim, malim xirab.

Gelek sotim, kirim kşibab,  
Kirye bi min, sed reng xirab,  
Ya leytenî kunrû turab,  
Wêran ezim, malim xirab.

Ya leytenî kunrû ve xar,  
Wey nazika min te ji dûr,  
Bêhiş kirim zîlfê di hûr,  
Wêran ezim, malim xirab.

Bêhiş kirim zulfê du reş,  
Biskê siyah, bîhnê di xweş,  
Ey duxterê, çapik bi meş,  
Wêran ezim, malim xirab.

Bêk'êf kirim zîlfê du reş,  
Biskê siyah, zîlfêd qemer,  
Eşq û muhbeta min li ser,  
Wêran ezim, malim xirab.

Sotim, biraştim bê hesab,  
Lê pirsî bo kirme k'ebab,

Kiryê bi min sed reng ezab,  
Wêran ezim, malim xirab.

Sibhan ji şahê bi tenê,  
Xalik li xala gerdenê,  
Ez dîn kirim berdam dinê,  
Wêran ezim, malim xirab.

Eşqa mezac peyda bûye,  
Îro li min dijwar bûye,  
Hîvî dikim heqîqiye,  
Wêran ezim, malim xirab.

## EZ

Îro ji dest husna hebîb sergeste û heyran im ez  
Min eşq û muhbet bûn nesîb sewadê sergerdan imlez

Eşqê gelek sewda kirin bê mal û bê mewda kirin  
Nûra çira winda kirin Mûsayê Imran im ez

Mûsa ji dest husna bi nûr şêrîniya xalên di hûr  
Secde bire ber Kohê Tûr nêzîkî remzê wan im ez

Remzê ku dê dilber bikin carek bi çeşman seyr bikin  
Dê kohê Qaf ker ker bikin mecrûhê pir-kovanim ez

Min ah ji dest kovan û qehran min sebr nayêt li sehran  
Şubhetê mewcên di behran qulzemê umman im ez

Qulzem û behrên di heftê agirê eşqê ku keftê  
Dê bisojit subhe neftê min diye, pê zanim ez

Min diye muhbet çi reng e sohtim edoja pir-ye'ke  
Min mudam dil jê biheng e bi nalîn û efxan im ez

Nalîna teyr û tuyûran kalîna çeng û bilûran  
Xulxulên di qesr û qusûran bulbulê xoşxan im ez

Bulbulim daîm dixwînim ez yeqîn ez te bibînim  
Dîn dibim sewda dimînim serxoş û sukran im ez

Serxoş û ebter kirim te ji illeta rengzer kirim

Te sotim û ker ker kirim tu agir î buryan im ez

Agir û pêta di dil da me'neyan daxan ku hilda  
Ew kitab naçit du cilda hafizê medhan im ez

Hafizê medh û pesendan rohiya mehbûb û rindan  
Bê hesab werbûn di findan satiyê bêcan im ez

Soti me qet pêt û nar ne kuştîme derb lê diyar ne  
Min demek sebr û qerar ne nexweşê pir-jan im ez

Nexweşê reng lê nemayî dest li ser falê nihayî  
Wan digot ji çavê giyaî kûştîyê e'ynan im ez

Kuştîme herdu 'uyûnan yan kî yêd nisbet ji nûnan  
Radikit ew qetl û xûnan girtiyê zindan im ez

Girtî me insaf di mîr ne qazî û muftî ve bîr ne  
Qeyd kirim kes bê xebîrne bendeyê hicran im ez

Ma di benda firqeta te canfidayê xid\*\*\*\* te  
Da bibînim reh\*\*\*\* te nobedarê xanim im ez

Nobedarê qullehê xo dergevanê dergehê xo  
Bîne bîr û agahê xo tûleyê asîtan im ez

Tûleyê dergahê yar im şev û rojan nobedar im  
Westayê der întîzar im çavrêyê Sultan im ez

Çavrêyê sirra li pêş im meqseda ezlê feniş im  
Hicreta Yûsuf dikêşim Ye'qûbê Ken'an im ez

Kor e bo Ye'qûb ji dînê j'perdeya daxa evînê  
Ger dibên veke birînê hewceyê Lokman im ez

Wan digot Lokman tebîb e gote min xef 'endelib e  
Şafiyê derdan hebîb e pê bawer û îman im ez

Sond dixwim sa'id û destan kevir û seylêd li bestan  
Min bi xom li curhan bebestan be rahet û asan im ez

'Aşîqa rahetya kême e agir û pêta dilê me  
Çend hezar medhan dibême muhitê esman im ez

Xwezî min sed ser hebûna sed hezar dev pê ve bûna  
Ew hemûl'medhên te bûna hêj bi wan niqsan im ez

Ez kiz û zer bûm ji qehrê dê devêk çibkit ji behrê  
Yan du çav çibkin ji sehrê bê dîtina eynan im ez

Sed hezar çav min divêna bayekî perde hilîna  
Xet û xal min têr bidîna eşqe qûtî can im ez

Her kesê eşq tê eser kit sed hezar perdan di ber kit  
Hemuyan dê ker be ker kit tazî yû 'uryan im ez

Perde çû ez mame tazî dil sirra mehbûb dixazî  
Min ibadet eşq û bazî bê mey û meyxan im ez

Xaniya bade û mey tê mexnî yû hem çeng û ney tê  
Min ji eşqan heye-hey tê serxweş û sukran im ez

Serxoşê ava heyatê meclisa reqs û sematê  
Dê çî kim bi sewn û selatê b'kûzê û fîncan im ez

Ew meyê gerden dirêjan şîşe û wan bade rêjan  
Min nema hiş li nivêjan li deftera dînan im ez

"Mim" û "Hê" aqil vederda sicleya eşqê û derda  
Lew qelem anî bi ser da me'fuyê Xufran im ez



### SITRANA EVÎNÊ

Şevên min bi xeyala te di nav rengan de dibiriqe, evîna şêrîn  
 û bi giranî bîhna te ya li ser çîçikên min.

ez pêjna te di çavê xwe de hildigirim, evîna şêrîn.

Ji janê bêtir kamiranîyê bide min.

Mîna barana erdê dişo

Tê jîyana min paqij bike.

Di laşê min î dişewite de tu lédana dilê min î;

Di sîya bijankên min de tu pêtîyekî agir î.

Tu ji zevîyên genim bi berkettir,

Ji şaxê zêrînî fêkîyekî bi bertir î.

Li hember êrîşên gumankarên tarî

Tu vekirina rohnîya rojê yî.

Gava li ba te bim ji tu janê natirsim

Ji bo min jana bi tenê jana kamiranîyê ye.

Ma ev dilê min î xemgîn û zêde sivik

Qey dengê jîyanek ji binê gorekê ye?

Çavên te mêrgên min in, evîna şêrîn

tîrên awirên te kûrahîya çavên min vêdixe.

Ger tu berê dilê min de bûya, evîna şêrîn

Di ser te re min tu kes nedihewand.  
 Ax ev çi kederek tarî ye, ev vîna bêmirad;  
 Li meydanê, bi hewlên vala xwe biçûk dixê;

di serê meriv bi dilekî reş xerabîya veşartî hebe;  
 bi nefreta kevnar sînga meriv diherime;  
 ji dêvla destekî bi şevqet tu marekî his dixe;  
 li pişt bişirîna hogirane jaremar tê dîtin;  
 tu dibe perê hûr di destê sextekar de;  
 ku di nîvê bazarê de wenda dibe.

Tu di binê çermê min de veşartî yî  
 Diherikî her çavîya canê min,  
 Bi mizdana destên te porê min vêdikeve,  
 Li dêmên min î bi haz şewata rojê dimîne.  
 Tu, evîna şêrîn, ji kirasê min re bîyanî yî  
 Lê ji zevîyên min yê tazî re zêde aşîna yî.  
 Ew rojhilata rohnî û bêdawî,  
 Tava demsala başûr ya no,  
 Tu ji şeveqa nuh jî tezetir î,  
 Ji avîya biharê jî tezetir û paqijtir î.  
 Ev ne evînek duvdirêj e, teqîna ronîyê ye,  
 Lempayek di nîvê bêdengî û tariyê de vêketî.

Ji cergî evîna te di dilê min de şîyar bûye,  
 Hestên min hemû bi te ve hatîye girêdan.  
 Êdî ev ne yê min e, ne yê min,  
 Ax valahî bi salan di dilê min de bû.  
 Lêvên min gorîya ramûsanên te ne, evîna şêrîn  
 Çavên min li bendî hatina ramûsanên te ne.


Tu di laşê min de lerza coşê yî,  
 Mîna kirasekî, kêsima şemala te min dipêçe.  
 Ax ez mîna xunçegulekê vedibim,  
 Bextewarîya min bi yek carê dibe keder.  
 Ax bi hêvîya çeng bibim ser pêyan,  
 Û mîna ewrekî hêsiran dibarînim  
 Ev dilê min î xemgîn û wek pêtî dişewite?

Di eywana perestgehê de bi awazên çeng û lîr?  
 Di vî ezmanê vala û bi van firan?

Vê şeva bêdeng û bi gelek sitran?  
Awirên te mîna lorîyek bi efsûn e, evîna şêrîn,  
Ji bo pitikên bêaram dergûş e.  
Hilma te surek nîv-xewî ye  
Hemû kul û kederên min direvîne;  
Ew bişirîna pêşrojê vedişêre,  
Ew di kêrahîya cîhanên min de noq bûye.

Bi coşa helbestê re tu gihîşt min;  
Agir bera nava sitranê min dide,  
Bi arê evînê dilê min wek çirayê vêdixe,  
Loma hemû ristên helbestên min diçirisin, evîna şêrîn.





### PIŞTÎ LÊPIRSÎNÊ

Dirêjbûna çavîyê du gav, berê wê jî...  
Gava duta bû tu ji qeşê sartir.

Tu dirêj dike milê xwe; dîwar.  
Tu radike serê xwe; banî.  
Û çolên bêdawî henin hinek ji te wêde  
Çemên kûr

Rêzeçiyên

Li ezman dengên baskan  
Ango niştîmana te  
Û rêyên mirov hildigire  
Û dibe deverên dûr.

Heval henin hinek ji te wê de  
Xeyal  
Perên dengizan...  
Û te  
Parast  
Vana tev  
Hemû hemû  
Li cîyekî du gavî



## GIRÊDAN

Benên ji qîrînê

Dengên naqosan ku seranserê Ewropa dagirtî  
Sedsalên li sêdarê

Rayên neteweyan girêdidin  
Va ye li vir em du sê kes in  
Ji hemû girêdanan vilitîne  
Em des bidin hev

Barana bi xezeb li dûyan direşîne  
Ben


Benên hûnandî  
Kabloyên noqavê  
Bircên Babilê ku bûne pira  
Tevna dîndaran  
Hemû yarên bi girêdanekê bûne yek

Piştî girêdanên şidîyayîtir hatîne hûnan  
Tîrêjên roja gewrik

Girêdan, hevgirêdayî

Tenê ji bo we şîyarbikim dinivîsim  
Hey pêhesno, pêheskirên delal  
Dijminê bîranînan  
Dijminê hewesan

Dijminê poşmanîyan  
Dijminê rondikan  
Dijminê her tiştên hîna jê hezdikim  
Hey pêhesno, pêheskirên delal.



### YA BI PAYIZÊ RE HAT

Bitebite zaroka min, bêdeng be û li bendî bimîne,  
 Bimîne, li bendî kerameta bi teban re tê  
 Bimîne, li bendî rûxîna gerdûnên me  
 Heta tê de tu tehm nemîne tiştê jê re tê gotin dem.  
 Wê xwe bera xwar bidin hemû stêrên vemirî yek bi yek  
 Berbe giravên razayî  
 Heta roja hilê, heta roja biçê ava.  
 Hah wê gavê, ne dibe ya rojê ne jî ya şevê;  
 Wê ro têkeve erdê, hîv nava keviran.  
 Wê stêrên vemirî bîne, keştiyên ji komirê.  
 Wê demê, axx lê wê demê  
 Wê xwe ji her îmkanê re veke derîyê bi xwînê derbûyî,  
 Wê bi temamî bên girtin derîyên bêxwîn.  
 Wê rûyê erdê bigirin gavên nayên dîtin.  
 Wê ezman dagire dengên nehatine bihîstin,  
 Wê betanên guhan biteqin di bin avên kûr.  
 Wê bajar hilweşin, naqos bêdeng bimînin.  
 Ê bi kerameta ku malan mist bide û derbas bibe  
 Wê kederê nayê pîvan ku dema bêdawî bibe

Di nerînên mirîyan û tîrêjên tevî de.  
Tu zaroka min, tê dîsa bimîne li hêvîya  
Guhertina gerdûnê, bêdeng, tengezar  
Bêlivandina mûyekî heta roja hilê,  
Bêlivandina mûyekî heta roja biçê ava...



**HASAN HUSEYIN KORKMAZGIL**

1927 Sêwas – 26 Sibat 1984 Ankara

**TAHLÎ BI ME BÛ HINGIV**

Binêre li bedewîya van pitikan  
 Birû destan, çav destan  
                     destê wan di xwînê de  
 Nabêm kor bibe, kor nebe tu  
                     min bibîne.

Li banî em bi hev re razan  
 Me ga bi delalî girtine  
 Ne mîh, li van çiyana  
 Guman bike, me xwe ajotîye

Ma me di bin xwe re dît morî  
 Me baskê çûkê şikand  
 Ma me kara hevûrî kuşt  
 Çawa wê li mirov bigere destê me?  
 Çawa wê li mirov bigere destê me?

Ger tu nebe, kuştin çima  
 Rizîn çima di zîndanên de  
 Hesret çima, ciyawazî çima  
 Xela çima, xizanî çima  
 Bêkar û xebat geryan çima  
 Divê roj bi rojê re li hev were

Bi xweh û biratî li hev rûnin  
 Hev bîhn bikin, bi hev bişêwirin  
 Bi tirs û xof jîyîn çima

Ma lêdana min rizgarî ye  
 Nabêm kor bibe, kor nebe tu  
 min bibîne.

Xwîn der bûn, em bûn ax  
 Hil bûn, em bûn al  
 Weşyan, em bûn pel


Gehîştin vê rojê em!

Nan bi me bû hingiv  
 Sirat bi me bû rê  
 Tehlî bi me hingiv

Gehîştin vê rojê em!

Bên çandin em'ê zad werin  
 Bê hêran em'ê ard werin  
 Yek biçin em'ê hezar werin

Ma lêdana min rizgarî ye  
 Nabêm kor bibe  
 Kor nebe tu... Min bibîne.



### HER KURDIM

Bi dero dero bim, li mala xwe bim,  
 Li axa Erebbim, li îranê bim,  
 Kinc lêkirî bim, rût û tazî bim,  
 Koşka min deh qatî be, wêranmal bim,  
 Aza û rizgar bim, şadman û xwendan,  
 Yan zincîr li mil , li goşê zîndan,  
 Sax bim, cahil bim, guh lê giran,  
 Yan zar û nizar li nexweşxanan,  
 Rûnê li ser textê xûnkarî,  
 Yan li kolanan bigerim bi hejarî,  
 Kurd im û li rîya Kurd û Kurdistan  
 Ser û pê didim ser destan,  
 Bi Kurdî dijîm, bi Kurdî dimirim,  
 Bi Kurdî didim bersîva qebra xwe,  
 Bi Kurdî dîsan zêndî dibim,  
 Li vê dinyê bi Kurdî hel diçim.

### STRANA ŞAGIRTAN

Em lawên kurd in, bo niştimana xwe  
 Serê xwe em datînin, dibexşînin canê xwe,  
 Li rêya lehengî emê xûnê birêjînin,



Ala azadî pê birenginin,  
 Şerm e ji me ra kurd azad nebin,  
 Gelê me wek gelan dilşad nebin,  
 Xûna mamê me li Agrî rijîya,  
 Hişê xûşka me li Dersimê pijîya,  
 Bavpîrê me li çîyayê Şîrîn çalkirine,  
 Li binya Mehabad`ê bavkê me kuştine,  
 Birayê me li Bexdadê darda kirine,  
 Gelek malê xizmê me dan ber bomban  
 Gelek pêwîst e zanist û xwendin,  
 Bo serxwebûn, bo tole standin,  
 Gelê xwendewar be, qet bin dest nabe,  
 Li ber bîgana serî pêl nabe.  
 Nivşê teze yê kurd bi xwendewarî,  
 Wê bilind ke ala rizgarî.  
 Em nivşê xwendewar in  
 Pêşrevê rîya rizgar in,  
 Remz û karê newestan in,  
 Fidakarê Kurdistanin.

### **FIRMÊSK Û MEY**

Ew qas ne hêja ye dunya, xema wê bixwî  
 Bi emanetî hatîye, divê zû herî  
 Jixwe, bi taybetî di rojên pîrî  
 Baş e, tê xwe bigrî li quncika tarî?  
 Bi bêxemî bijî, bi bêxemî bimire  
 Xwe li quncika tarî ya meyxañê bigire.  
 Bi mestî bimire, bi mestî rabe  
 Heta roja heşrê mestîyek besî te ye  
 Ey sofî bese êdî, hew rastiyê li xwe ke  
 Were cem min firrekî vexwe  
 Ev der li gor wir weke mezra ye  
 Ji dûvikê riha te çî jê dernayê  
 Ku li vir çawa bî, tê her wisa bî  
 Ger li vir rûxweş bî  
 Li wir jî tu yê rûxweş bî

### **FERXIKA NIŞTÎMAN**

Nêçîrvanê bêbext, xwînrêjê xwînxwar  
 Tu bi Xwedê kî, bes e êdî zilm û zor

Vê carê jî wext û mecal bide min

Gedên min î şêrîn di xewa şêrîn de

Di bin baskên min de tîra neweşîne  
Hêlîna me li serê me nerûxîne

Li xwîna xwe dilê min fikar nake  
Lê ditirsim ku tîrê te xwar biçe

Ne ku li min, li zaroyên min kevî  
Ji xewa şêrîn bibirî kezeba min

Devê şûşeyê, şûşeya ruhê me  
Xet û xalên wê, xata ruhê me

Tu ne bê xeberî ji êş û jana min  
Ji ser dilê min derîne hilma sar

Ji diya xwe bipirse, dê ji te re bêje halê min  
Hingê were tam bike jiyana min a tehl

Bi min xweş e ku bimrim, ne ku fexikên min  
Biêşê û bitevize benikê dilê min

Hejar, fexika niştiman î tu  
Wisa ji te hez dike ku dilsozê wê bî tu  
Kurmancîkirin: Muhsîn Ozdemîr

## VÎETNAM



## HO CHI MINH

19 Gulan 1890 – 02 Îlon 1969

Ho Chî Mînh, qahremanekî rizgariya neteweyî yê sedsala 20'ân e.

## JI “ROJANA ZÎNDANÊ”

## Sibeh

Ro her sibeh bilin dibe di ser dîwaran re  
 Di derî de dibriqîne, lê derî venebûye hîn.  
 Li hundir, li zîndanê, dirêj dibe tariya xemcivîn  
 Lê em dizanin ku li derve hiltê ro.

## Heyveron

Li zîndanê ne gul hey e ne jî şerab  
 Wê çi bike mirov werê delal be şev?  
 Diçim ba pencerê, dinêrim li heyveronê  
 Dinere heyv li hozan di nav tilîyên hesin re.

## Bilûra Girtîyekî

Bi hesret digirî li zîndanê bilûrek  
 Keder xurt dike, zêde dike şewata dengê wê.  
 Li dûr, ji çem û derbendan wê de, jinek bi tenê  
 Bi xemek bêbinî, dertê barûyekî, ji bo li hawîr binere.

## Qeyd û Lele

Ecêb tiştên pir ecêb dibin carna li vê dunyayê  
Hevdû dahf didin mirov, ji bo bên qeyd û merbetkirin lingên wan kêlî berî kêlîyê  
Gava tu bê kîlîtkirin carekê, tu kare xewek hêsan hêvî bike êdî  
An di wê xirecira dogehî de çawa ser û bin bête razan.

### **Hinbûna Kîşîk**

Hêzên her du hêlan jî beramber û tayê hev in  
Lê dawî serketin wê para lîstikvanekî tenê be.  
Pêşde, paşde, bi bawerî pêkbîne stratejîya xwe  
Encax wê gavê wê bê gotin serdarekî mezin ji te re.

## R Û S Y A



ÎLYA EHRENBURG

27 Rêbendan 1891 Kiev – 31 Tebax 1967 Moskow

**LI NAGAZAKÎ BARAN**

Li Nagazakî dilefîne baran, bi hêrs, bi ern  
Keça biçûk di dest de bûkikek kor bi tirs digire

Baranek nayê xwestin ev, jê hez nakin dar  
Qeresî kulîlk dane, weşîna kulîlkan jî dest pêkirîye  
Baranek bi xwelî ye ev, baranek bi mirina bêdeng tijeye

Kor bûye bûkik, wê kor bibe sibê keça biçûk jî

Wê jahr bêt çêkirin ji textikê tabûta zarokekî  
Biharat wê bêt çêkirin ji xemê û ji xerabîya dûdirêj  
Mîna baranê ye xerabî, rev û veşartin bêmecal e jê

Har dibin masî, ji ezmana dikevin erdê teyrik  
Kevok wê dest bi derxistina dengê qijika bikin bîstek din  
Wê dest bi gezkirina hev û zûrînê bikin masîpankên bêdeng

Wê diranê xwe di goştên mirovan derbas bikin kulîlkên çolan  
Wê binale di sîngê de ba, wê dil bimije, wê bikoje, bikurîsîne  
Mîna vê baranê, li hember xerabîyê jî taqeta Nagazakî nîne êdî

Bêdeng namîne em ji mirina te re Nagazakî!  
Ey zarokên li parkên bajarên bêdeng, bi şînkahî û dûr

Ne bawerkin yan nebawerkirina tişteki ye li vir êdî ya tê gotin

Bi wateya xwe ya herî vekirî, jîyana mirov e ya li vir tê gotin

Bira veke ev baran, li qeresîyan nebare carek din...

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### ALÊN AŞITÎYÊ

Alên aşitîyê,  
 tevê rengan  
 gel in,  
 tevê gelan jî, mirovahî –  
 tevê gelan dimîne û dipê  
 li bendî dengê hezkirinê,  
 hezkirin  
 ya laşan dipêçe,  
 ramanan dike yek.  
 Tê li joran, di ser seran re,  
 bi jan û şewat  
 gava li ba dibin bi ba re,  
 mîna çingînekê dilefîne  
 dengê mirîyan.

Alên aşitîyê,  
 tevdê rengan,  
 silava gelê cîhanê.



### TENÊ ROHNÎ YE YA BÊDAWÎ

Bi şadî nava me diçirûsîne ro  
 Piştî demên bi ewr.  
 Lê ew hîn jî bi şeng e  
 Gava di qelşek teng re dadiwerive zîndanê.

Rê pêşî keştîyek mezin dike  
 Di tarîya şevê de stêrkek biçûk.  
 Şewatên mîna ecêban carina  
 Vêdixe pirîskek, biçûçik.

Yên ku di pêtîyên Engîzîsyonê birijîn  
 Şeva cîhanê ronak kirin.  
 Hîn bêtir bi ewrengî dibiriqîne –  
 Di şeva reş de brûsk, hîn bêtir ronak e.

Tiştê ku tu car qet venemre –  
 Zalimno! Hêza we têrnake vemrîne.  
 Wê ronîya hûn dixwazin bifetisînin  
 Wê mezin bibe û bi pêtîyekî volqan we daqurtîne.

Lewra tenê ronî ye ya bêdawî  
 Di valahîya gerdûnê ya bê ser û ber.



Wê, bi gerdûnê da zayîn, cîhana me,  
Gerdûn bi wê, bêdawîtî qezenc kir.

Ewê hîn bêtir bi şewq biçirûse di tarîyê de  
Nikare wê vemirîne, gora ku we ew xistê.  
Ronîya di Prometheus de hat kuştin  
Di Voltaire de bi hêzek nû diçirise.

Û ger winda bibe ji nişka de ro  
Wenda bibe û neçirise carek din  
Ji me re, ji bo ronîyê, ji dogehê  
Bi misogerî wê derê yekî biçê pêtî bîne.



### HEZKIRIN DIBIŞIRE

Gava şêrê biçûk xwarinê dixwe

Şêra mê ciwan dibe

Gava agir para xwe dixwaze

Ax sorîkur dibe

Gava mirin behsa hezkirinê dike

Jîyan vediciniqe

Gava jîyan behsa mirinê dike

Hezkirin dibişire

## LETONYA


**JANIS RAINIS**

11 îlon 1865 Varslavani, Dunava – 12 îlon 1929 Majori

**KANIYA TAQETA MIN**

Bêhêvîtî direve ji stranên min  
 Li wir cîh nabîne ji xwe re mirin.  
 Li wira hêvî, berxwedan û taqet  
 Agir, kerb û rik.

-Çawa te bir serî vêya, di van rojan  
 Ku jan derî bi derî di gerê de ye?  
 -Ya min disitirîne ramana pêşerojê ye  
 Gelê kedkar e yê taqetê dide min.



## BÊNAV

Belkî jî wek îro qet  
 Me his nekir di mista xwe de  
 Germîya destên sorbûyî  
 Ji me re azadîyê tîne.

Hîn neçûye ji guhên me  
 Gurmîna çekên keyn.  
 Milên merivên me yên li kuçan  
 Dîsa vekirîne ji himbêzkerinê re mîna berê.

Li rûyên me ewqas hêstirên rasteqîn,  
 Gava paxilê vedike ji mirîyên xwe re axa me,  
 Hêstirên me hîna germ û bi şewat in.  
 Belê, dibêjim vêya ji hemû cîhanê re!

Û bi hemû dilê xwe dikim qîrîn li we:  
 Ma çi dibe birîndar nekin vê evînê!  
 Li welatê me yê xwedîyê xeyalên parçe parçe bûye  
 Tenê ew kare hilgire ewqas jan.



### GOTINA GÊRÎLA

Welatê min delal e  
 Mîna şûrekî bi berjor de li bakirî  
 Hîn berjortir e,  
 Hîn jî delaltir e,  
 Bi canê xwe diparêzim wê.  
 Çi dibêjin bira bêjin  
 Yên firotî,  
 Bi hêstirên ji pola me rê girt.  
 Perê ezman yê me ye niha.  
 Nan yê me ye.  
 Me erd çand.  
 Me zad hilanî,  
 Zad û erd yê me ye,  
 Ê tim û tim yê me be wê  
 Heta û hetanî  
 Derya  
 Çîyan  
 Ê teyrik.



### NÊZÎKBÛNA YARÊ

Li te dihizirim, gava tîrêjên rojê li dengizê şewq vedide  
 Li te dihizirim, gava çirûskên heyvê li kanîyan dide.  
 Li te dihizirim, gava li ser rêyek dûr axpink radibe,  
 Di şevêk tarî de, gava li pirak textikî teng rêwîyek dilerize.  
 Li te dihizirim, gava li wir bi gufeguf pêl bilind dibin.  
 Ji bo gohdarîyê ez li dehlê me, gava demên hertişt wer bêdeng dimîne.  
 Tu li dûr be jî ez li ba te me, tu jî li nêzî min e.  
 Roj dihere ava, gavek din, wê min bibiriqînin stêrk  
 Ma wê çi biba li vira tu li ba min ba



### JI BO ÇIVÎK BI KAR BÎNIN SERPÊHATIYA JÎYANÊ

Di mirina sedsala gulê de çêbûm  
 Makînê, ji zûde bera melean dabû  
 Li derbasbûna gerdêleya dawî dinêrî Quîto  
 Tevlî gerdêleyê derbasbûna daran  
 Derbasbûna devîyan  
 Xanîyên nû dihatin cîyên wan  
 Di şemûga sedsalê de bûn em  
 Kayina bêdengîyê tanîn mangan  
 Ba, li hespan dîda galûka

Dayika min roja ber êvarî li xwe kiribû  
 Ciwanîya xwe xistibû hundir gîtarek kûr  
 Hin şevan bi muzîkê bi şewlê bi bêjeyan xwe dinixwamt  
 Û bi şanîdana zaroyên xwe qîma xwe tanî

Min ji av-nivîsa baranê hez dikir  
 Ji mêşên zer yên dara sêvê  
 Ji beqan jî min hez dikir  
 Ji beqên li naqosên darînî didan

Bêrawestan dinepixî babira mezin ya bê  
 Bendên çiyayê perê ezman bûn

Nişka ve bager destpêkir gava li defa xwe dixist  
 Dest bi êrîşê dikir tûmenên wê yên şilbûyî  
 Piştî sibeh bi nijdeyên xwe yên zêrînî  
 Wê bêdengîya zelal tanî zevîyan dîsa

Min li mirovên ceh kulm dikirin dinerî  
 Li siwarîyên di ezman de wunda dibûn  
 Û min dinerî li vagonên bi mangên diborîyan tijî  
 Yên diçûn li delavên mango bîhn didan  
 Way li wir bû gelî tevlî çewlîkên xwe

Ji dikan dadiwerivî tarîyek reşbelek  
 Li rojava hêdî hêdî li ba dibû  
 Direfşa levenê şeker û kakao  
 Di sindoqekê vedişart gencîna xwe ya nepenî  
 Bi qaşilê xwe yê bi bîhn xwe dipêça ananasê  
 Mûza tazî çitayê hevirmêş li xwe dikir





### HELBESTA TEKOŞEREKÎ

Vay e, dayê  
 Tufengek min hey e ji hesin  
 Vay e, ez kurê te  
 Ka rojekê te dîtibû ku  
 Kurê te li zincîrê hatibû xistin

(tu girîyabû,  
 te di got qey birîn kiribûn  
 dest û piyên te  
 zincîrên min)  
 Rizgar bû êdî kurê te  
 Tufengek kurê te heye ji hesin

Wê bişikîne tufenga min  
 Hemû zincîran  
 Derîyên zîndanên wê veke  
 Wê tune bike hemû zaliman  
 Wê erdê bide gelê me

Çi tiştêkî delal e dayê  
 Ji bo azadîyê şerkirin!  
 Di beradana her gulleya min  
 Bangewazîyek hey e dayê

Mîna teyrikan şîyar dibin  
Xewnê pêşîyan

Şerkirin çi tişteki delal e dayê  
Gava şer dikim di enîyê de  
Nêz dibe xeyala te  
Min himêz dike

Hîn bêtir ji bo te şer dikim  
Dayê  
Ji bo tije nebin carek din  
Çavên te bi rondikan



## FRANSA

**MAURICE DRUON - JOSEPH KESSEL**

Maurice Druon 23 Nîsan 1918 Parîs – 14 Nîsan 2009 Parîs  
 Joseph Kessel 10 Sibat 1898 – 23 Tîrmeh 1979 rojnamevan û romannivîs bû jî.

**PARTÎZANINO / STRANA RIZGARIYÊ**

Hogirê min, tu his dike  
 Li ser deştên me  
 Difirin kelaxurên beratan

Hogirê min tu his dike  
 Qîrînên bi xeniq  
 Yên welatê li zincîrê xistî

Heydên partîzanino  
 Karkerno, gundîno  
 Defa hewarê lê da, lê dide

Wê dijmin vê êvarê  
 Bê xelatkirin  
 Bi xwîn û hêstirên çavan

Derê ji hêtûn  
 Hevalo, heydê  
 Dakeve êdî ji çîyan

Bira derkevin bombên destan  
 Ji nav gîhan  
 Reşşe û tufengan

Heydê bikujin  
 Bi gulleyan, bi kêran  
 Zû bikujin!

Hey hevalê hilweşvan  
 Agahdar be li barê xwe  
 Barê te dînamît e!

Em`ê bişikînin bi misogerî  
 Ji bo birayên xwe  
 Zincîrên zîndanê

Li pey me kîn  
 Û yê me dehf dide  
 Birçîtî û hejarî ye

Welatni hene  
 Nav livînên xwe yên germ de mirov  
 Dikevin xeyalan

Em li vira, tu dibîne  
 Em dimeşin, ew lê dixin  
 Em dimrin li pey hev

Li vira herkes dizane  
 Bê çi dixwaze, bê çi dike  
 Çi gavê derbasî refan bûye

Hogirê min, ger tu bikeve  
 Wê yek derê ji sîya te  
 Wê bistîne şûna te

Sibehê, xwîna reş-î qîr  
 Wê zuha bibe li ber royê  
 Li ser rêyan

Biramin hevalno...  
 Azadî di hundir şevê de  
 Li me gohdar dike ...



## **DÎWAR**

Bêguhda, bidilhişkî, bêfedî  
Dîwarên mezin û bilind li çarhawîrî min pêçan.

Vaye rûdinê bêhêvî  
Vê çarenivîsa dikurîsîne mejîyê min, tiştêkî din nîne li hişê min;

Çi li der hebûn ku me bikira.  
Ax, gava dîwar lêkirin çawa min wan nedît?

Min ne dengê lêkiran bihîst, ne pêjna wan.  
Bêhis li min girtibûn derîyên dunyayê!

## **LI HÊVÎYA BARBARAN**

Li bendî çine em werê li cîyê bazarê civîyane?  
Îro barbar tèn vira.

Çima liv nîn e ji senatoyê?  
Senator çima bê zagon çêkirin rûdinên?

Çimkî barar tèn îro.

Çima senator zagon çêbikin?  
Heger barbar werin, ewê zagonan çêbikin.

Çima werê zû rabûye keyxanê me,  
li derîyê herî mezin yê bajêr çima li textê xwe rûniştîye,  
li serê wî tac, ji rêûresmê re amade?

Çimkî barbar tên îro,  
derketîye pêşwazîya serekê wan keyxanê me.  
Bi ser de fermanek giran amade kirîye  
ji wî re paye, navnîşanan dibexşîne.

Du balyoz û dadrêsên me çima werê  
Xeftanên sor, neqîşandî li xwe kirine û hatine?  
Çima werê bazinê yaqût, gustîlên zumrud  
Yên dibiriqin û bi semyan li xwe kirine?  
Çima di dest wan de darên werê,  
ji zêr û bi zîv neqîşandî heye?

Çimkî barbar tên îro,  
çavê wan alû dike xişlên werê.

Ka gotarvanê me yê navdar li ku ne  
çima mîna hergav dest bi gotaran nakin?

Çimkî barbar tên îro,  
ew qet guh nadin gotinên delal.

Çima ev şaşbûna nedihat hêvîkirin, ev tevîhevi?  
(Çawa jî daliqiya rûyê herkesî)  
Çima werê zû valadibe kuçe û meydan,  
çima herkes bi fikar vedigere mala xwe?

Çimkî dinya tarî bû, barbar nehatin.  
li gor saloxdêrên ji ser sînor vegeerîyane,  
kesek bi nivê barbaran nîn e êdî.

Başê, niha emê çî bikin barbar tune bin?  
Şêweyekî çareserîyê bû ew ji derdên me re.



### ARAMÎ Û SAZÛMAN

Bi mîlyonan kes kar bikin, lê nejin  
 Dayik, tenê ava şîr bide pitikan –  
     Ev sazûman e  
 Kedkar deng derxin: “Me bihêlin ronahîyê!”  
 Yê kedê didize derdikeve dadger –  
     Ev bê sazûmanî ye

Yên bi janazirav bazdin dezgehên tornê  
 Sêzdeh kes bîponijîn di odakê de –  
     Ev sazûman e  
 Lê yek biqetîne zincîra xwe û biqîre  
 Bixwaze temendarîya xwe têxe bin ewlekarîyê –  
     Ev bê sazûmanî ye

Maldarên mîratxur kêf û şahîyê bikin  
 Li ser berfên Swîsre û havînê di avên Comer –  
     Wê gavê aramî hey e  
 Lê di her tiştî talûka guherînê hebe  
 Ji nişka de qedexe bûbe bazirganîya parsêlan –  
     Wê gavê bê aramî hey e

Ya baş: guhnedana birçîyan



Ya baş: nexerakirina sazûmana kolanan  
Bila deng derneyê, bes e  
Di demê de her tişt dibe  
Bi geşbûnîyê wê her tişt bigehê we jî  
Vay nûnerên we bi ser vê rastîyê vebûn  
Ji bîr nekin heta wê dema hûn tev pêya radin  
Ji xwe çawa be wê bêt nivîsandin li kevirên gorên we:  
Hertim ew di hundir sazûmanî û bêdengîyê de jîyan



### REŞİK IM EZ

Reşik im ez  
 Mîna şevê  
 Mîna kûrahîyên Afrîka reş

Dîl bûm herdem  
 Pêlingên serayan paqij kir min li Roma kevn  
 Niha pêlavan boyax dikim li Washington

Kedkar bûm herdem  
 Yê li Misrê Pîramîd avakir ez im  
 Ez im yê xerca ezmandevan tev da

Stranvan bûm herdem  
 Min belav kir stranên xwe ji Afrîka heta Mîssûrî  
 Li her derê dike zingîna dûrikên min bi keder  
 Wê ahenga tamtaman

Qurban bûm ez herdem  
 Bi qamçî li min dan li Kongo  
 Û niha tîm lînkirin li Teksas

Reşik im ez

Mîna şevê

Mîna kûrahîyên Afrîka reş

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



## GOTIN

Di xetimandina kulekiya gotinan de hevokên wî aşt bike tune bû.  
 Peyva kulek û di sikratê de  
 mîrateyek ji pêşiyên wî mabû jê re.  
 Di valahîya xwe de serxweş bû.  
 Hêvî, li ser dermannameya di hişê wî de tevizî bû qaltaxek Qaltaban  
 bû  
 Tîpên bi xumam di dilê wî re derbas  
 dibûn divîyabû bi aheng birijîya kîmyaya hibrê  
 Ji dilê wî,  
 ji dilê wî pêlên bi xem belav bûn çemê jîyanê.  
 Gotin,  
**“TENÊ”** tazî bû.  
 Kedera wî ya xwiyaniê û bi xumam a ji pênuşê rijîya  
 li pey hev çû.  
 Li heft demsalan û çar waran çû secdeyê.  
 Ji her demsalê  
 ji her warê deng sitend / bext sitend  
 pîrozwer kir tûjbûna pênuşa xwe.  
 Gotin avêt êgir / di êgir de kuta.  
 Heftê hezar car pîrozwer kir / hat pîrozwerkirin.  
 Peyv di hoqeyê de  
 bû bizot,

bû rastî,  
 bû gotin  
 Bû xuşîna tofana tîpan  
 Di bêdawiyê de GOTIN ma

### MIRIN

Rojekê qeyda sûcên mirinê hat girtin.  
 Ji naleta hezar salan ya bi bahoz hat ceribandin  
 bêdengîya ji hestên mirdar çêdibû...  
 Di nebûna xwe de bi gotinên neqane dilîst.  
 Li cîhê xalî,  
 Zarokên bi trawman xwedî dibûn  
 bi janek hîsterîk ku dihatin sitrandin çêdibûn  
 Yezdanekî demên kevnar bû yê dikuliya  
 Li ser zimanê nebûna rêwiyê Lalik...  
 Kir îskîn li alûsiyê bi derbasbûna xwe a bi weba.  
 Bêtir tune ye.  
 Li ser zimanê wî îblîsekî Bêdîn  
 bi zimanê yeksanîyê meşîya  
 Bi vîna dînbûnê û bi kêfa tirsehêziya serhildanê



### DI BIN ÎŞKENCÊ DE BALADA YÊ SITRANÊ DIBÊ

Ji nû de hewce biba jîyîna min  
 Ez`ê biçûma dîsa di rêça berê  
 Minê behs bikira tenê ji pêşerojê  
 Dengê bilind dibe ji nav hesinan

Li gor gotinan di çavîya wî de  
 Îşev du mirov xwendine  
 Di guhê wî de, radest bibe  
 Ma tu bêzar nebû ji ewçend îşkencê

Tê bijî, tu kare bijî  
 Tu kare bijî mîna me  
 Bêje, gotina te rizgar bike  
 Raweste li ser çongên xwe bijî

Ji nû de hewce biba jîyîna min  
 Ez`ê biçûma dîsa di rêça berê  
 Minê behs bikira tenê ji pêşerojê  
 Dengê bilind dibe ji nav hesinan

Bi yek gotinê wê vebe derî  
 Tê derkeve, yek gotinek

Dertê ji eyarê xwe celat jî  
Dawî bîne êdî li êşên xwe

Yek gotinek, yek derewek  
Wê ji nişka ve bê guhertin qedera te  
Biponije, baponije, baş baponije  
Di bédengîya sibehê de

Ji nû de hewce biba jîyîna min  
Ez`ê biçûma dîsa di rêça berê  
Minê behs bikira ji mirovên pêşerojê  
Dengek bilind dibe ji nav hesinan

Min got her tiştê bê gotin  
Mînaka Qral Henrî  
Ji bo hespekî Qraltîya min  
Ji bo merasimekê Parîs

Tiştê bêt kirin nîn e, diçin  
Bi ser wî de dinuqute xwîna wî  
Ew tê de nîşana jîyanê ya dawî bû  
Wê bimire vî bêguneha jî

Ji nû de hewce biba jîyîna te  
Ma tê biçûya di rêça berê  
Dibê belê ezê sibê jî biçim  
Dengek bilind dibe ji nav hesinan

Ez dimirim, Fransa dimîne  
Evîna min û berxwedariya min  
Hey dostên min, ger bimirim  
Eger xwanê ye helbet

Ji bo birinê hatin  
Yên bi Almanî dipeyivîn  
Ser de jî wergêr hey e, werdigerîne hîna  
Ma tê radest bibe

Ji nû de pêwîst bibe jîyîna min  
Ez`ê biçûma dîsa di rêça berê  
Bi guhnedana pahnîyên wan yên hesin

Bi strana pêşerojê

Stran got li pêş gulleyan  
Bi xwîn rabû, ristên wî digot  
Cara duyem berdanê  
Ji bo tam biqedînin karê wî

Stranek din bilind bû  
Wê gavê ji lêvên wî  
Qedand Marseillaise  
Ji bo temamê mirovahîyê

### AFÎŞA SOR

Daxwaza we ne serketin bû, ne jî hêstirên çavan  
Ne orga xemgîn, ne jî duayê keşîş yên dawîn  
Yanzdeh sal çî ye, ma yanzdeh sal  
Kirina karanîna selehên xwe bûn  
Mirin natirsîne çavên partîzan  
Dardabûn rûyên we li hemû dîwaran  
Hûn tarîya şev û rîhê bûn, melûlîya bi xof  
Hûn afîşek bûn mîna lekak xwînê ya sor  
Gotina navê we werê zorbû ku  
Xwestin, tesîra şopgerîne têxin dilê yên diçin û tên  
Mîna ku kesekî we Fransî nedidît  
Ji sibehê heta êvarî mirovan bênerîn derbas bûn  
Hinek tilî nesekinîn lê piştî tarîkirinê  
“ji bo Fransa Mirin” nivîsandin li afîşê  
Sibehê herî cuda bû, ya wê rojê dest pê kir  
Di her tiştî de hebû, rengê xûsarê yê yeknesaq  
Dawîya sibatê bû, demên we yên dawîn bûn  
Yek ji we peyivî, bêdeng, hêmin  
Ji her kesî re dişadî, ji yên mane re evîndarî  
Gava ku dimirim kîn nîn e di dilê min de, ey gelê Alman  
Bimînin xweş gulno, bimînin xweş kêf û tehlî  
Bimînin xweş jîn, ba, ronahî  
Û tu bizewice, şa bibe, tim û tim min bifikire  
Rojekê tê di nava hemû bedewîyan de be  
Gava her tişt biqede li Rewanê  
Roja zivistanê ya delal, gir dide rohnîkirin



Dilê min dişewite, li bedewîya xwezayê  
Hey evîna min, sêwîya min, li pey mana min  
Şa bibe, mêr bike, zarokan bîne  
Gava tivingan kulîlk vekirin, bîst û sê meriv bûn  
Bîst û sê dilên xwe bi tûmî dan  
Bi qasî di rêça wê de bimirin, dildarên jîyanê, bîst û sê meriv  
Fransa yek gotin bû, di devê wan de  
Û ketin erdê li pey hev



### WELATÊ MIN YÊ ROJANE

Jina welatê zivistanê me ez  
 Destê min girêdane  
 Bi benên ji qeşê.  
 Jinek e, li cenderê hatime xistin ez  
 Li welatekî giramgir  
 Ku hîn li navê wî digirim.

Ez zanim vêya, his dikim  
 Bi serê tilfîyên xwe yên sar,  
 Ji nişka ve bi lerzan  
 Agirek dipijiqe  
 Û çîyayên ji qeşê jê dike  
 Vedike destên min yê şaşmayî.

Bi destpelka tarîyê  
 Vedibe destên min  
 Li gerdûnek nû hatiye dîtin.  
 Navekî  
 Hîn doh min nizanîbû  
 Ew dibên ji min re.

Ax welatê min yê rojane

Meriv mecbûrê kişandina jana çi sebrek dirêj e  
Ji bo hînî hezkirina te bibe...

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### **EV STRAN JI MÊRXASÊN ŞOREŞÊ RE HATIYE GORÎKIRIN**

Ar bi devançeyên kirêkirî hatin xistin ji nişka ve  
 Hê mîna do bû, bi xortanî weşîyan  
 Kenekî kamiran hebû di lêvên wan yên vekirî de  
 Xet xet azadî bû diçirisî, ya di rûyên wan de

Wer binêre carekê, hê ji nêz ve  
 Hê mîna do bû, ji nişka de hatin lêdan  
 Belkî bîst nig bûn belkî hîn bêtir  
 Lûle fedî kiribûn, lê mirovan fedî nekiribûn  
 Lûle behitî bûn, neçar, bêmecal mabûn

Ketin erdê bi serbestî, bêtirs  
 Ne dengê gulakê bû, yê kenînek evîndar bû  
 Ketin ripîrast, serbest, saltgîr  
 Mirin, lê pir bûn bêmirin

Were, carek ji nêz de binêre li van mêrxasan  
 Hê mîna doh bû, bêînsaf hatin wergerandin  
 Daxwiyanîyek reş bû, xwîn li sîngên wan  
 Mirin tehl bû, wan şêrîn kir

Divê ji nû de bêt afirandin dengên artêşan

Yên ji asoyan, xet xet fireh dibin  
 Divê cengan pir bikin, ji bo sazûmana bilind  
 Ji bo xew nerevin carek din  
 Neyên mêtin van destên zarok

Bi wan mirîyan nakevin hêstirên çavan  
 Ji wan re kefenê herî hilaw divên  
 Da ji nû de em vekêşînin rika xwe pêtî pêtî  
 Da bi stranên şoreşê em bikin qîrîn li wan

Namirin ew, ji xwe ew namirin  
 Yên firotî nizanîbûn ku vê rastîya nayê înkare  
 Ew şahdamarek bûn di dilê gelan de  
 Di şevan de stêr stêr vêdiketin

Ji bîr meke, bahskirin nîne ji hêstirên çavan  
 Niha bihêztir hatin vekêşandin kevan  
 Ji bo sibê sîng, sîng me xwe pêça di şevê de  
 Di şevê de, hêza herî nayê têkçûn, di me de pir bû  
 Mirî bezîyan artêş artêş ji çîyan  
 Ji nişka de mirî, di nava me de, zînde bûn



### STRANA KÛBA

1.

Nîn e dema min vê gavê  
 Serpêhatîya gernasana bêjim  
 Dema min nîn e  
 Lêv bi birîn  
 Lêv parçe parçe  
 Bi xwîn der dîkin hundirê min  
 Lê tu megirî  
 Xwîna min piçek dohn  
 Wê vêxe arê azadîyê  
 Megirî  
 Li ser pêya ye welatê min lo!

2.

Şerm e dayê  
 Ji gernasê dijî re  
 Hêstirê çavan  
 Dua bike, bila bide şînkirin erdê  
 Bila nan bide zarokên te  
 Bila bibin efendîyên welatê xwe dîsa  
 Yê sax mane, dua bike  
 Nanê xwe min nexwar

Hey dayê  
Neyar têr xwar  
Wê goştê min binikilînin sibê  
Kelaxurên reş yên daristanan  
Lê nan û Kûba  
Wê bimîne  
Ji Kûbayîyên azad re

3.

Gora min, hey dayê  
Gora min ne xwanê ye  
Li her derê dijîm ez  
Dimeşim lingên min nîn in  
Dipeyivim zimanê min nîn e  
Dibînim çavên min nîn e  
Ez li her derê dijîm  
Yezdanê vê sedsalê me ez  
Hey dayê  
Zaroka êş û janê me ez



### ÊVARÎ GUNDÊ MIN

Êvar daket, dengên tivingan di gewrîya gun de bilîya û ma  
 Bêdengîyek bi ronak, dengvedana windakirî kuçe dagirt  
 Berbe erdê ve xwar bû mijek tenik, da mijandin hezkirina xwe  
 Dûvre xanî nuxamt bi xêlîya xwe ya tarî, bi jehr hişk kir nalîna wî

Gurzîya mirinê ya tirsehêz herikî damarên gund  
 Bêdengî birçîtîya xwe şikand bi vê gurzîyê, robaran jî têhna xwe bi rondikan  
 Şev dihat, mîna sawirên guran ku didan pey kerîyan  
 Şaş û behitî mabû gund, di perpitî û dima

Xwest kuçan saxtî bike dêya min, bi tirs çû berbe derî ve  
 Lê nerî min negot çirk, kêlîyek bêdeng bû, tirsehêz û kurt  
 Bi lempa gazê ve ma çavê min, bi tîrêjên wê yê melûl hatim nixumandin  
 Perçakî qeşê bû êdî xwîn, û dêya min digot:

Mêrên me mirin, kurê min, teba tîn berbe mala me  
 Mêrên me mirin, kurê min, bi destê min girt, dest bi revê kir  
 Xwedayên mirinê, him jî birek, meydana gund girtibûn  
 Li hawîrdor cendek û bêdengîya di teqînan de difetisî

Tarîya ku daket, gava dinuxamt rûyê qurbanan bi qumaşên sor  
 Kerîyê qurbanan, yên ji mirinê direvîyan, ketin rêyan



Û mirin ji paşve digehîşt, bi artêşa xwe ya bi hezaran leşker  
Ez û dayika xwe direvîyan, li pey me xwîn û mirin

Gava me rizgar kirin ji mirinê lingên me, ji westanê re em dîl ketin  
Sîya xwe dinepixîne sawîr û dide dûv me, di bêdengîyê de, bi veşartin û vegirtin  
Pirs di nava min de dikelin bi puqe puq: dayê... kanî? Kanî?  
Kanî bavê min, bavê min, dayê? Û rondik herikîn ji çavên min

Ket destê neyar gundê me; yên li gund tev mirin kurê min  
Tenê bêxîretî filitî û nifirên çarenûsa bêyom  
Werê li gundê me dinerî wê ji dûr ve, pêtîyên kînê pekiyan sînga min  
Ka em bimeşin, ling westîyayî û bêtaket in, bila ling rêka xwe dewam bikin



## JİYAN

Ji min re bêje dişibihe çi dar?  
 Gava teyrik di ser re bifirin,  
 Çawa ye sitrana çemekî?

Deryayê ji min re bêje. Ji min re bêje  
 Bêhna zevîyan ya bêdawî.  
 Stêran. Hewayê.

Asoyan ji min re bêje,  
 Mîna holika belengazî  
 Asoyên bêkilît, qufle.

Çawa ye maçîkirina jinekê  
 Ji min re bêje. Di bîrbîne hinekî jî  
 Navê evînê: nayê bîra min êdî.

Ma bîhn didin hîna şev,  
 Bi bîhna evîndarên di hîvronê de  
 Bi kamiranî dilerizin?

Naxwe bi şûnde nemayî tiştêk  
 Di vê çala, di şewqa vê gora

Û ji xeynî strana kevirên min yên meşînê?

Tam bû bîst û du sal... Min ji bîr kir  
Çawa bûn dîmenên cîhanê,  
Çawa bû bîhn û rengên wê...

Ji berevkî dinivîsim: “derya” û “boran”an.  
Dibêjim “daristan”, lê min ji bîr kir êdî  
Çawa bû bejn û bala darekê.

Dipeyivim, ji tiştên di xeyala xwe de zînde bikim  
Tiştên salan ji çavê min paqîş kirîye.

(Domandin bêîmkan e êdî: çimkî  
His dikim, dengê lingê gardîyan.)

### ŞÎROVE DIKIM

Bexşîn filan naxwazim. Naxwazim  
derhemek ji dengê rûzerbûyî,  
bexşînek ji barê jîyana li piştê min.

Nefret dikim ji dengê qels yê secde dibe  
û ji dilê çong dide bi lîçik û girêz digirî,  
nefret dikim ji enîyên di xwelîyê tîn dan  
û ji wê ronîya ramanên wan yên dibin hezar perçan.

Bexşîn filan naxwazim. Nadim ser hev  
ji bo lavan destên xwe yên dilerizin.  
Di gotinên min rêlên fêzê vêdikevin  
ji bo derîyên tolhildanê yên tarî birûxin  
ji bo mirov rizgar bibin ji çarmixên xwe  
gava – bê girî û bê lava – di berxwe didim.

Bexşîn filan naxwazim. Şanî didim  
vay di dest de bivirek di jîyana mirovan  
ew berata sitemkar ya serwerîyê dajo,  
û aniha jî ji bo bibe mînak ji kesên din re,  
dixwaze bigerîne di pozê rimê de, serê min yê jêkirî.

Bexşîn filan naxwazim ez.  
Alayan didim xwedîyên wan.  
Vay derbas dîkin dest ji dest,  
dilê gelê min yê dîl, yê têkçûyî.

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### QÎRÎN

Qîrînên hezar mirovên şet didim we;  
 Yê li sitemkaran dîkin qîrîn;  
 Yê li ser goran dîkin qîrîn;  
 Li ser kakutan, hestîyên bi ser hev de komkirî  
 Û ji movikên xwe de şikestî.

Dengê sîsalkekê didim we;  
 Ya li ser zevîyên me ku ji ser goşt dizîvire.  
 Çavên ji kortên çavan wendabûyî;  
 Yê li ser giran bi rêz civiyane  
 Û yê li ciyê ku hîvronê ew ji hovîtyê re terk kirine.

Vî qutikê di nêvî re hatîye çirandin didim we;  
 Yê li zevî hatîye hîştin;  
 Li dera yê ku hîna ji pêsîran neqetîyabûn, koç bûbûn.  
 Bêje min, bêje min  
 Kê li xwe kir vîya, berî zivistan bi serde bigire?

Tenê yê radizên didim we;  
 Yê bi destên xwe xewnan dipêçin  
 Ji bo di şeva mirinê de dînerin ku  
 Xewnên wan qet pêk nayên  
 Ji bo hûn li cîhanê biqîrin didim we!



## JAN

Pel nedilivîya li parkê  
 Mîna qasidekî bi helkehelk  
 Heta ku ba hat û got  
 Hatina hovan  
 Şaxên bi pistepist dipeyvîn  
 Ketin gomana naçarîyê

Dixwazim bînim bîra we  
 Wê bahoza bi hêrs:  
 Ka kulîlkên naçar mabûn  
 Bûbûn destegul û xwe dabûn  
 Keyxanê xerab yê tac wî bi meteoran xemilandî...

Mîna wan şaxên bêdeng man  
 Heta ku bahoz dest pê kir û dûvre peyvîn  
 Em jî rawestîyan  
 Heta ku bi sarîya xwe ya tûj şûrek  
 Li me ket û serê me jêkir

Her perçakî me çû derekê  
 Bi ava baranê re herikî  
 Her perçakî me

Dervî xwîna me  
Mîna hingivê kovî di beşenê darê  
Li cîyê xwe ma

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### NAME

Berxwe bide gula dilê min  
 Berxwe bide  
 Gehîştin em ber derîyê evînê.  
 Bide bala xwe  
 Çend bihar derbas bûn  
 Ji seholbendan û virde  
 Çend koçberî hatin serê me  
 Bi fermanên nefîyan re  
 Çend kabûs hatin dîtin  
 Di pêtîyên tîrmehên wenda de

Binêre hela bi şûnde  
 Çendîn mêrxasên te yên nenas  
 Keçên te, lawên te  
 Bi awazên serketî  
 Tarîyê diqelêşin

Metirse  
 Bikişîne şûrikê derîyê tirsê  
 Binêre  
 Dengizên bêdeng  
 Bi kerbê tije ne



Bi qolincên zayînê  
Mîna pelên hewran  
Dihejin bircên zulmê  
Xwe rapêçe  
Gula dilê min  
Were ba min

Binêre li çarhawîrî xwe  
Tije kelaxur in  
Mede bala xwe êdî  
Ciwaniya me ya bilez çû  
Me katjimêr vedan li berbangên sor  
Û di tirafa qewîniya mêrxasan de  
Me hêviya xwe sipart  
Rizgarîyê,  
Azadîyê.



### ZEMBÎL FIROŞ

Ey dil werin dîsan bi coş,  
 Carek ji caran mey binûş,  
 Bikin qiseta Zembîl firoş,  
 Da seh bikin hikayetê.

Zembîl firoş lawkê rewal bû,  
 Bi kilfet û ehl û eyal bû,  
 Husnekî û sif li bal bû,  
 Heq rizaqê qismetê.

Qewîn ew lawê feqîr bû,  
 Dayme xwedê debîr bû,  
 Pêşê xweda jêr bû,  
 Ew bi dest hemû sene'ete.

Pixulê wî selik û tebeq bû,  
 Qîmeta selikan wereq bû,  
 Dayma ew rast heq bû,  
 Pê debirî kilfetê.

Ew bi dest Zembîl bi dest,  
 Dibirê bazarê bi qesd,

Xwarin nan dihat bi dest,  
Razî dibû qismetê.

Her dema selkan ku tîne,  
Xatûnek jorda dibîne,  
Bi dil û can dihebîne,  
Dil kete pêla muhbetê.

Muhbetê keç mubtela kir,  
Sur li carîya aşkera kir,  
Lawikî qelbim cuda kir,  
Min ji eşqa xew ne tê.

Law rast bû bi xwedêra,  
Pir ji wê qenca dikêra,  
Go min ji te navê tu zêra,  
Tu min xilaskî ji zehmetê.

Xatûn dibê ev xeber tunîne,  
Perm meke, were nav nivîne,  
Min bi te day evîne,  
Da em bibînin hesmetê.

Taw dibê tirsim ji xebere,  
Dev hereme, têne riyare,  
Agirek bi wan da dibare,  
Narî cama şerbetê.

Xatûn dibê tu lawê beyanî,  
Lew dibem da tu bizanî,  
Min tu ji bo dilê xwe anî,  
Da em bikin misilhetê.

Law bi xatûnêra debetê,  
Tu mixaziya dil devete,  
Daym ji heq nekin vehetê,  
Rû spiya di axretê.

Xatûn dibêje bavêj xeyalan,  
Were ser doşek û palan,  
Bihn ke zulf û xalan,

Law dibe zilfê herîre.

Pîroz be lawê mîre,  
Çi hede lawê feqîre,  
Tev bide vê misilhetê,,

.....

Xatûn dibe lawê verêvan.  
Were nav reyhan û sêvan,  
Tu şekir bimêj bi herdu lêvan,  
şibhe cama şerbetê.

Law bide tu qenca tamamî,  
Her wekî şekir di camê,  
Bi ser û p'eyan tu li min heramî,  
Tirsim ji roja axretê.

#### **QIBLEGAHA AŞIQAN**

subh û êvarî şeva tarî şemala kê yî tu  
leyletul qedr û berat in nûra mala kê yî tu  
çîçeka baxê îrem şûx bejn û bala kê yî tu  
bo Xwudê key bêje min kanê şepala kê yî tu  
dêm kitêb e zulf e haşî şerhê xala kê yî tu

dilbera gerden şefîf î danuwa durra 'Eden  
nazik û mewzûn letîf î nexliya selwa çîmen  
gullîbas î, gulqiyas î, gulenî gulpîrehen  
ahûya deşta Tetarê rehzena aska xeten  
horiya baxê beheştê çav xezala kê yî tu

qiblegaha aşiqan î şengala ebrûzirav  
hate burca şaneşînê sed melaîk çûn silav  
dax û kovana evînê sotî canê min tevav  
extera subha se'îd î reşrihana ta belav  
filfila hindûstanê zulf û xala kê yî tu

ew çî dême şahebax e gulşena darul qerar  
sed hezaran nal û awazê di bulbul çar kenar

helqe pê da bes tu hatin 'eqreb û îlan û mar  
 nêrgiza şehla şepal î asemîna mêrxuzar  
 lebxemûş î meyfiroş î dêmpeyala kê yî tu

pêncî salî şehlewendî keftime çaha resed  
 min nizanîm çerxê dêm e tê heye burca esed  
 çengelek avête dil kun kir li min dad û meded  
 qelbekî hişk û sufalîn min divêt can tê ebed  
 şah li textê dilberê fikr û xeyala kê yî tu

sefhêkêşa katibê xeybê ji nûra la yezal  
 xaleke wa l'gerdenê mîslê Berê reş mah û sal  
 sedhezaran rekbehacî tên tewafa zulf û xal  
 netrik û şutrî û îlan dane ber bayê şemal  
 laubal î çardexal î çardesala kê yî tu

şehkitêbek min divêt behsê muhebbet bit tamam  
 sed tilism û sihre tê da pêkve Suryanî meqam  
 ebceda 'eşqê me xwend û 'eql û wendakir we mam  
 horiya baxê beheştê tûtiya tawusxeram  
 keyrî batey padîşaha min delala kê yî tu



### **DİL JÎMÎN BÎR**

Şox û şengê zuhre-rengê  
 Dil ji min bir, dil ji min  
 Awirên heybet-pilingê  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Wê şepalê miskê xalê,  
 Dêmdurê gerdensêmalê,  
 Cebheta biskan sema lê  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Zulf û xalan nûn û dalan  
 Wan ji min dil bir bi talan  
 Goşeyê qewsê hîlalan  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Dên nedîrê bo `ebîrê  
 Xemrî û gîs û herîrê  
 Sîne kir amancê tîrê  
 Dil ji min bir, dil ji min.

Surşîrînê nazenînê  
 Kuştîm û nakit yeqînê

Wê bi çengala evînê  
Dil ji min bir, dil ji min.

Fetl û taban da xuraban  
Ebleq û cuhtê şebaban  
Dame ber pence û kulaban  
Dil ji min bir, dil ji min.

Xoşxeramê, ez xulamê  
Nazikê şirînkulamê  
Tûtiya eywanmeqamê  
Dil ji min bir, dil ji min.

Mahîrûyê miskîboyê  
Surpilingê şêrîxûyê  
Wê bi zulfa şubhê goyê  
Dil ji min bir, dil ji min.

Her du weşman naz û xeşman  
Kê ji ber wan 'eql û hiş man  
Sa'eta min dî bi çeşman  
Dil ji min bir, dil ji min.

Mahî-tabê afi-tabê  
Dêm ji roj û şeb nîqabê  
Xweş bi çengel û kulabê  
Dil ji min bir, dil ji min.

Serwînazê serferazê  
Şubhê zêr remza mecazê  
Dame ber çakûç û gazê  
Dil ji min bir, dil ji min.

Bejn û bala tûx û 'ala  
Min kirin vêk ra mutala  
Çîçeka terhîn-i wala  
Dil ji min bir, dil ji min.

Mîrê xazî şûrê tazî  
Vêk-î ran min dî bi bazî

Kir li me ji xeflet ve gazî  
Dil ji min bir, dil ji min.

Şûr û xişt in zulf û qîşt in  
Hin veşartin hin vehîştin  
Pehlewanan dest vemiştin  
Dil ji min bir, dil ji min.

Rohnîya çahvên Melayî  
Ew tecellaya te dayî  
Ya ji Ehmed dil revayî  
Dil ji min bir, dil ji min.

### SABAHUL XEYR

sebahul xeyr xana min, şehî şîrîn zebana min  
tuyî ruh û rewana min, bibit qurban te canê min

te alellah çi(h)zatî tu çi(h) wî şîrîn sifati tu  
ne wek qend û nebatî tu yeqîn ruh û heyatî tu

heyat û rehet a can im "sebahul xeyr ya xanim!"  
were bînahiya çavan bibînîm bejn û balayê

sebahul xeyrî mesta min, letîfa cam bi desta min  
xumar û meyperesta min, tuyî meqsûd û qesta min

ji meqsûdan tuyî bes min bibin ber çerxê etles min  
ji xeyrê te nevêt kes min bi reş toz in muqewwes min

di benda zulfê çewkan im "sebahul xeyrî ya xanim!"  
were bî nahiya çavan bibînîm bejn û balayê

ji wê zulfê ji wê bendê reha bim lê ji peywêndê  
siya çêşmê sipî zendê te sohtim şibhetê findê

şubhê şem' û şemal im ez ji ber hubba te lal im ez  
da'if im wek hilal im ez sîfet goyîn di kal im ez

ve bulbul ra bi evxan im "sebahul xeyrî ya xanim!"



were bînahiya çavan bînim bejn û balayê

ve bulbul ra şev û rojê ser wê terh û bişkojê  
enî mahî şefeq rojê te sohtim şubhetê dojê

ku dûr im ez ji wê hûrê tenê carek li ser sûrê  
ji wadî eymana torê tecella kir di nîv nûrê

ji wê sohtî dil û can im "sabahul xeyr ya xanim!"  
were bînahiya çavan bibînim bejn û balayê

ji husna wê tecellayê yedî beyda û belayê  
çi wesfan bîm xeber nayê welê dil cezbê dayê

ne hişyar im ji wê berqê ji zer tacêli ser ferqê  
ji spêde da heta şerqê belê naêxmê ferqê

ji derba 'iştê nalan im "sabahul xeyr ya xanim!"  
were bînahiya çavan bibînim bejn û balayê

zarîfê nazîkê şengê sîfet hûrê perî rengê  
bi rojê ra tu hevdengî du reş toz in siyeh yengê

kişandin lê ne wek caran xedengên qews û nûbaran  
ji rengê şîr û mukaran reşandin sîne wek baran

jiwê derbê pir êşan im "sabahul xeyrî ya xanim!"  
were bînahiya çavan bibînim bejn û balayê

veke carek xet û xalan li ser wan mesned û palan  
bixwîne li me 'ebdalan bibînin 'îd û sersalan

Îcazet dê me destûrê perî rengê sîfet hûrê  
ji nîva zulmet û nûrê binoşin mey di ferfûrê

ji dil talanê xalan im "sabahul xeyrî ya xanim!"  
were bînahiya çavan bibînim bejn û balayê

ji şehkasa ku qerqef tê meya nûrên muşerref tê  
nîşanek dîlberê kef tê ji bo min her seher xeftê

ji wê camê dinoşim ez seher lew ney li hoş im ez  
 ji ' amê lê dipoşim ez bi can her lê dikoşim ez

ku xalib mest û sukran im "sabahul xeyrî ya xanim!"  
 were bînahiya çavan bibînim bejn û balayê

were pêşber melayê xwe şehîd û mubtelayê xwe  
 bi şefqet ke liqayê xwe meya nemrit bi dayê xwe

mesîhayê li bîmaran kesên gestî du reş maran  
 şehîdên şir û mukaran kirî amancê nûbaran

li dîdara te heyran im "sebahul xeyrî ya xanim!"  
 were bînahiya çavan bibînim bejn û balayê



### DESTÊ HEV BIGIRIN

Milet, qebîlno, rabin, destê hev bigirin,  
 Hûn bi şeref in, xwedî wujdan in,  
 Li ser çîyan hev bibînin, destê hev bigirin,  
 Meriv tenê bi hoz û doz namînin,  
 Dewlemend, hinekî ji xwedê bitirse,  
 Hal-hewalê hejar car-car bipirse,  
 Bira sê qat nebe koşk û sera te,  
 Hinek pere bide bira û pismamê te,  
 Ku nan bikire bo biçûkan,  
 Ku ew jî bibe beşdarê jîn û can,  
 Ew bimire, tu jî wê bimrî,  
 Bibî agir, kes gun nagire,  
 Çend xweş e birçî, têrkî bi nan,  
 Xwe bidî kuştin li şerê meydan,  
 Dewlemend, nebêje: "ew qisa bê mane ye",  
 Nebûna hejar, nebûna te ye,  
 Eger hejar şevê te pawan nekin,  
 Cerdê her mala te talan bikin.

### JIN

Bêjine qewmê kurdan,

Destê min dawa wan,  
 Hey e bi heqê Êzdan,  
 Jin anîn û telaq dan.  
 Jin zeyneta dinya ye,  
 Ew emaneta Xuda ye  
 Hebîba Mistefa ye,  
 Qelat in ji bo merdan.  
 Eger jin bi hurmet be,  
 Bê zilet û zehmet be,  
 Bi terbyet û xizmet be,  
 Dil şad û lêv xendan be,  
 Kurê jê bibin wek şêr,  
 Aqil û zana û dilêr,  
 Bê dil xem û çav têr,  
 Jina ku der bi der be,  
 Dil pir bi xem û keder be,  
 Rezil û dest li ser be,  
 Li ku ewledê çê li ber be ?

#### QAZENCA ŞÊXÊ ME

Heta şêxek li Kurdistanê bimîne,  
 Umuda jîna te pê nemîne,  
 Bi ba da rewnek û ahenga kurdi,  
 Hemû bûne sofî, pîr û derwêş,  
 Bi bermal, bi sehbe û rişterîş,  
 Hemû bê îş û kar û tewezel,  
 Zik pan, mil estûr, selk zil,  
 Ji Wanê, Erzurûmê ta Cafan  
 Tewella bûn ji aqil û ulm û erfana,  
 Be wê şol, be wê heqil û temizê,  
 Muheqeq qewmê kurd na bi rêzê,  
 Be rêşî pan û pirç pir sipî,  
 Binga îşê kurdan çawan li hev bê,  
 Bi keşkûl û parsê û feqîr û zillet,  
 Mihale kake xwe teşkîla dewlet,  
 Hemû bê hiş û bê guş û nezan îna,  
 Îdara milk û dewlet çawan nezanin,  
 Umud û qet nabe, kurd bibe dewlet,  
 Ji bedbextî ew êsta bûne sê parçe,  
 Ewê zana ye, nav cerga wî pelas e,

Ewê ne zan e, nizane çi bas e,  
Cenabê şêx dibê " Axir zeman e,  
Qiyamet radibe her bi van zûyan,  
Îradeya Xuda ye, hûnê her wa bin".

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### **BERBI KÎJAN ÇARENÛSÊ EY AFRÎQA**

Rûniştîm

Li bin quba ku stêrên ezman ew kunkunî kiribû

Û min nerî

Li hîva bi sebir diherikî

Li seranserê rêgaha xwe

Nedilivîya hîv

Û mîna ku ne xema wê bû

Ji agihandina xwe ya xwezayê jî

Bi bêdengî dibişirî

Û dilxweş bû bi rewşa xwe

Li jor nav ewran

Û piştî

Ey Afrîqa

Xaka wan pîramîdên fireh

Ku Ferûn`ên mezin

Û qanûnên mîmarî yên bi sir afirandî

Welatê min yê bav û kalan

Ketime ramanan

Ku mîna hîvê

Dibên tu jî derket!

Lê berbe kîjan çarenûsê

Ey Afrîqa  
Berbe kîjan çarenûsê?  
Ma berbe rabirdûyê?

Berbe dema def û daholan  
Û reqsên kêf û şahîyan  
Di bin sîya darên xurman  
Ma berbe rabirdûyê de?  
Berbe dema rojên bêparêzger  
Dema ku hîna dest bi keçikê nebûbû  
Û kurik ji xofa yezdanên kevn  
Dikerihî ji ketina rêya xerab  
Ma berbe rabirdûyê de?  
Berbe dema holikên tarî yê ji qirşên pûş çêkirî  
Ku di wan de aramî  
Û qencîyê serwerîya xwe didomand  
Ma berbe rabirdûyê, berbe qirnê bawerîyên vala de?  
An jî ma pêşde?  
Pêşde! Lê berbi ku?  
Ciyê lê mirov bi ser mirov de kom dibe  
Ciyê xela û xizanî  
Lê hêlînên xwe yên kul û kederê çêdikin  
Ciyê her tişt lê tarî û tirsehêz e  
Ma ber be kolîtan de?  
Pêşde berbi ku?  
Di aşekî dervî mirovatîyê  
Di hundir sêhrek xerab ya dûvdirêj bêdawî  
Ma berbe fabrîqa ku katjimêrên dijwar dihêre?

Pêşde! Lê berbi ku?  
Bîhnên gennî yên perok  
Yên sûcên ji serdema navîn de manin  
Bi ser mirovên nîjada jêr de  
Bi bomban û bi gulleyan  
Dema agir dibarand topên devbixwîn  
Yên mirovên ji nîjada arî  
Pêşde, ma berbe HEMDEMÎYÊ de?  
Pêşde, ma berbe ambûrên bi toz  
Û qezencên çavbirçî  
Nûçegihanên vebirî  
Yên di şerê kujyar de?

Yan ji bo nivê jîndarên cîhanê di erdê rake û bişewitîne  
Bi buhayê belqîtîna nivê din  
Berbe qanûnên Adam Smîth  
Yên ne li hev  
Ku ji serî heta binî bazar tarûmar kirin

Û dilê mirovan wergerand pola  
Ma berbe pêş de?

An jî berbe şûnde  
Berbe kanîya hîmî  
Ya xwînên rewîştî  
Ma berbe hezkirina mirov  
Û tirsê ji xweda  
Ya him gişt him serbest him azad  
Ku ji dilekî serbixwe bilind dibe?  
Hîv  
Ji berê de seranserî rêyek aşîkar  
Li rûyê ezmanê ku stêran ew kun kunî kirîye  
Bi aramî û bêdeng diherike  
Li ser rêyek baş hatîye sehêtkirin  
Bi gurêzî biherike, ey welatê bav û kalan  
Lê berbe kîjan çarenûsê, Ey Afrîqa?  
Berbe kîjan çarenûsê?





### EM ZAROKÊN VÎ QIRNÊ NÛ

Em zarokên vî qirnê nû,  
 Diqetin ji nîrê bavê xwe;  
 Ji bo cengê û serfirazîyê me rakir kulmiskên xwe;  
 Ji bo dest bi jîyanek serbest bikin.

Em zarokên vî qirnê nû,  
 Yê li van erdên bi hêrs gehîştin,  
 Yê di bin nîrê û qamçî de kar dikin,  
 Nîn e êdî ji me re fetisîna bi zincîran.

Em zarokên vî qirnê nû,  
 Birayên di nav tehlîyan de çêbûn,  
 Me berê xwe da armancek rast, mafedar  
 Hilawtir ji qanûnên bavê me

Di vê cenga cîhanê ya bi xwîn,  
 Alîkarê stemkêşa ye serketin;  
 Serketina xurt ya germîn;  
 Serê serbest, dilê serbest.

Xortên bi hêrs, çalak, xurt  
 Nikarin bijîn mîna xulamên, ji niha û pêde

Lebikandin, îskîn, hêstirên çavan bese  
Bese ji zarokên vî xakî re.

Em zarokên vî qirnê nû,  
Em`ê têkevin şerên nû;  
Bi jîyana xwe ya bi evîn hêşîn dibe,  
Berdêla serbestîyê bidin em`ê.

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### **BAYÊ GEL MIN HILDIGIRE**

Bayê gel min hildigire,  
 Bayê gel min dibe  
 Dilê min diçîne,  
 Belav dike dengê min çarhawîr.

Gava ga ço dibînin,  
 Bi sernermiyê hêmin  
 Eniyên xwe diçermiçînin:  
 Lê şêr serê xwe radikin  
 Ê ceza dikan  
 Bi lepên xwe yên bi biryar.

Ji cinsê gacotan nayêm ez,  
 Ji gelekî  
 Mexelê şêra me,  
 Ji refê qertelan,  
 Ji garana ganêra me  
 Yên bixîret, qoçê wan bel in.  
 Li erda Îspanya  
 Qet zêde nabin ganêr.  
 Kê gotiye li nîr xin  
 Hustiyê ganêran?

Kesek kare bahozê bigire  
 Bi nîr, bi werîsan?  
 Qet hatiye dîtin  
 Kesî brûsk girtiye kiriye qefesê?

Hûn, Astûryayên mêrxas,  
 Baskiyên ji kevirqespê,  
 Valensiyên şên,  
 Kastîliyên qedirbilind,  
 Yên mîna erdê hatine çandin,  
 Mîna baskan bi ba ne,  
 Endulusiyên ji brûskê,  
 Di nava gîtaran de çêbûne  
 Li ser sindanan hatine kutan,  
 Hêsir rijandine wek lehiyê;  
 Estremadûrayên ji dola baçîkê,  
 Galîçyayên ji baranê, ji aramiyê,  
 Kataloniyên wek kevir,  
 Aragoniyên başnijad,  
 Mûrsiyên ji dînamîtê  
 Leonî, Navarroyî, hosteyên  
 Birçîtiyê, efendiyên bivir, xwêdanê,  
 Kanên madenan,  
 Keyxanên çandinî û çinînê,

Di nava kokan de, mîna  
 Kokên bi qapan mirov biçin  
 Ji jiyanê ber bi mirinê ve,  
 Ji nebûnê ber bi nebûnê ve;  
 Dixwazin we têkin bin nîr  
 Mirovên gîhayê xerab,  
 Lê hûnê di milên wan de  
 Bişikînin wan nîran!  
 Ciyê şeveqê xuya dike  
 Belekiya şeva gayan.

Gayên di tirsaxur de,  
 Bi tiraliyê pêçayî wê bimire:  
 Wê qertel, şêr, ganêr  
 Ji quretiyê bimirin, Lê ezmanê pişt wan  
 Nayê guhertin, dawî lê nayê.

Niqirîskvedana gayan  
Rûyekî biçûk rêdide,  
Lê niqirîskvedana heywanekî mêrxas  
Firehtir dike dunyayê.

Ger bimirim bi serbilindî  
Bimirim ez  
Mirî, hezar carî mirî,  
Devê min li hember firêzê,  
Ezê diranê xwe şidiyayî bigirim  
Û çenga xwe bi biryar, rakirî.

Bi stranan li hêviya mirinê me,  
Bilbilên dixwînin hene  
Li ser tufengan  
Tam di nîvê şer de.



### **BÛ SIBEH**

Vay bû sibeh  
 Û hilweşîyan dîwarên zîndanê  
 Ji qelşek teng, ya zîndanî  
 Derketin bin şewqa rojê  
 Û şeveqa nasnake  
 Ne zincîr, ne sînor  
 Baskên xwe yên sor, ronak  
 Di ser me re bera da  
 Û kedera ku nava me  
 Bi mirandin şidand  
 Cî guhert  
 Bi şahîyek  
 Ar berda kûrahîya dilan.  
 Vay ro jî hiltê  
 Û dilezîne  
 Li germkirina axê.  
 Û li hev rast tîn birayên hev  
 Û dinerin  
 Li rûyên hev.  
 Qirnê lehengan  
 Gehîşt qirnê qurbanan;  
 Û zahmetkêşên rastîyê  
 Radiwestin

Bi himêzkirina şervanan.  
Ji bo her tiştî spas ji we re  
Sûdan, te  
Tu demê  
Dananî serê xwe  
Navên lehengên te  
Li tevaya cîhanê  
Digere li ser baskên rîwayetan.





binerim li te, binerim  
 biherike ava ferat  
 binerim li te neyê dîtin yemen  
 neyê jîyîn dêrsim  
 binerim  
     biherike  
 biherike ava qerecdax  
         bi xuşe  
             xuş

binerim li te  
 binerim û bê girtin zimanê demê  
 binerim dawî bê lawijên bêdawî  
 postên xezalan li odayên axan

binerim li te  
 binerim û kor bibim  
 nebînim teyrên tîn lêdan seranserî tixûban  
 ax! ewrên bi ser temenê me datên  
 şehîdên azadîyê zarokên halepçe

binerim li te binerim  
 û di oda xwe ya li gund kelpîçî de bêm veşartin  
 guhên xwe bigirim  
 dax bikim çavên xwe  
 çênabe / çênabe jî  
 nasnama xezalek birîndar e welatê min  
 binerim li te binerim û birijêm  
 birijêm kuçên nava xwe

binerim li te binerim  
         binerim binerim  
 di tarîya çavên te li çavên te binerim  
 bizdêm

zikê tarîyê li dev  
 tarî wê xwe lêxe  
 wê xwe li berbangên herî şêrîn bixe  
 li avên şêt yên bi berbangan re diherikin




dîsa vegere avan, ji nişka de vegere avan  
 veşêre lawijên xwe  
 lawijên xwe di sêpiya dîrokê de veşêre  
 ji darê re çî be kurm, ji mirov re tirs  
 zanibe yarê  
 lêvên welatê xwe yên nemaçîkirî dixwazim  
 vedigerim û li şoperêyên xwe dinêrim  
 bi mirovên dipeyivim re dibêim hogir  
 hevtayê min hin ji wan hevdem, nîne navnîşana wan  
 û her kulîlka min girt ser derîyê wê  
 \ pirsiyarni û dîsa pirsiyarni, mirov pirsiyarek  
 paşî wê bersîva xwe bide û bitenê  
 ne dûrika şivan ya mest e serpêhatiyên me  
 zanibe ku strana darê bi xwişîna pelê hey e\

min got le;

li her qemçika kulîlkê yê derizî navê wan  
 û dem ne tizbiyek firûze ye di mista wan  
 gava vebû li derîyê sedsalê destê gelan  
 wan bi dilê xwe girt ser derîyê azadîyê

hin bûn baran û barîyan  
 hin stêr ji ezman qetandin yek bi yek  
 ji bo cîhanek ronak dahatuyek bi şewq  
 hin li alîyê axê yê veşartî  
 û zanibe ey dîrok  
 sondên li kevîrên goran hatin xwarin ji bîr nebûn  
 ji bîr nebûn tiştên bi mirinên ciwan zînde bûn  
 û çawa mezin dibin di qalikê îstîrîdyê de dur  
 wanî mezin bûn di dilê gel yê hejar de

nepirse yarê, nepirse  
 nepirse çima di stranên mahabat keder  
 li sûka nînowa şîn  
 nepirse û gotinên bi gwîzan seyandî  
 dibê çima yara min



### EGER NEMIRIM

Eger ez nemirim vê carê bê te,  
 Şert be naçim heta vê jêrê bê te.  
 Hinavê min xalî ye, mîna ney dinale,  
 Hewareke çî pir e, heware bê te.  
 Qesem bi vî şertî be, dîdara te gulale,  
 Şeraba min eynî jehra mar e bê te.  
 Li cem te xar û xes gulzar e bê te,  
 Li cem min xirmanê gulzar e bê te .  
 Çavê min kor in, nabînin tu kes,  
 Birûyê min yek-yek tîrê bizmar in bê te.  
 Bira li cem te bibin nas û ecnas ,  
 Kes li vî şehrî da nîne bê te.  
 Hemû rojê ji taw hicrana vê salê,  
 Wextê mirna pêra re bê te.  
 Heta tu bûyî nasa min, bûne nasê min,  
 Ew nika mû bi mû strîye bê te.  
 Çavê Nalî hesreta ser û bejna te,  
 Du cew in, belkî du robar in bê te.



### LI SER SERKETINÊ

Bi destên xwe yên tirsehêz mirov bidewisine birîna xwe

Bi xwînkirina lêvên xwe

Tê tebatkirin li hember janê.

Aniha hêvî bû qîrînek

Tazî û dilhişk...

Û serketin

Êdî bi qasî ku tu tişteki nabexşîne

Bi neynûka wê bê rakirin û jêkirin...

Roj giran in.

Roj bi nûçeyên mirinê tên.

Neyar sext

Xedar

Û fenek.

Bi şer dimirin mirovên me

-lêbelê çendîn heq kiribûn jiyân-

Dimirin mirovên me

-çendîn zehf-

Dibêjin qey bi al û sitran

Rojek cejnê derketin pêşandanê

Werê ciwan û bêxem...

Roj giran in.

Roj bi nûçeyên mirinê tên.



li bayê birûskê siwar bûn em!

Ji zinaran

qertelên bi zinaran re qetiyar

di ronîyê de li hev didin baskên xwe yên diçirisîne.

Siwarîyên zendpêtî didin qamçîyan

Hespên xwe yên rabûne ser pêyan!

Êrîş hey e

li royê êrîş!

Em'ê royê dagîr bikin

dagîrîya royê nêze!

Bila nekevin rê bi me re:

yên li mala xwe digirîn

hêstirên xwe

hildigrin

di hustiyên xwe de

mîna zincîrek giran!

Bila ji dû me vegerin

yên di qalikê dilê xwe de dijîn!

Va ye:

Di agirê

ji vê royê

tê xwar

bi milyonan dilên sor dişewitin!

Tu jî derîne

dilê xwe ji qefesa sînga xwe;

bavêje

agirê

ji vê royê dikeve;

dilê xwe bavêje cem dilê me!

Êrîş hey e

li royê êrîş!

Em'ê royê dagîr bikin

dagîrîya royê nêze!

Em ji a(gi)r, ji avê, ji axê, ji hesin çê bûn!

Bi zarokên me royê dide mijandin jina me,

ax bîhn dide rîhên me yên mis!  
 Dilgeşîya me germ  
     bi qasî xwînê germ,  
 bi qasî wê "gava" germ  
     ya di xewnên xortan de  
                     dişewite!  
 Bi stêran daliqandina çengelên pêlingên xwe,  
 Bi pêlêkirina serên mirîyên xwe,  
     em bilind dibin  
                     berbe royê!

Yên mirin  
     bi şerkirin mirin;  
     li royê bingor bûn.  
 Wexta me nîn e ji danîna şîna wan re!

Êrîş hey e  
     li royê êrîş!  
 Em'ê royê dagîr bikin  
     dagîrîya royê nêze!

Vêdikevin rezên sor tirîyên wan çilkexwîn!  
 Kulekên stûr ji kelpîçan  
     ditewîne  
     diqûre!

Kir qîrîn yê herî li pêşîyê diçû,  
                     yê ferman dida!

Ev deng!  
     Hêza vî dengî,  
     ev hêz  
 hêza rûberek kişand çavê gurên birçî yê birîndar,  
 ya ku wan di cihê wan de  
     çikand!

Ferman bide ku em bimirin  
                     ferman bide!  
 Royê vedixwin em di dengê te de!  
 Dicoşin em,  
     di coşe!...

Di perdeya bi dûman ya asoyên bi şewat  
 dibezin siwarîyên rimê wan ezmên diçirînin!



Êrîş hey e  
li royê êrîş!  
Em'ê dagîr bikin  
dagîrîya royê nêze!

Ax mis,  
ezman mis.  
Biqîre strana yên royê vedixwin,  
Biqîre  
Da em biqîrin!...

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### LÊVEGERÎNÊN LI NEŞE YAŞIN

A-

Neşe

Me bihîstibû ku

Divê ji welatê xwe hez bike mirov.

Yek tiştî dibên bavê min û yê te.

Û em dirêj dikin destên xwe

Li nîştîmana xwe ya bûye du paran

Lê di xwînê tê dan, di têldirkan.

Dîsa jî ez`ê li bendî te bimînim

Sibê di vê katjimêrê de,

Ez`ê qerenfilekê dîyarî te bikim

Di rojbûna te de

Lê ez nikarim wê bi porê te vekim

Di ser têldirkan re ez`ê wê bavêjim ji te re

Ji bo bîhna xwînê jê neyê

Wê gula gelek dişibihe dilên me

B-

Te duparçebûna welatê me nivîsand

Di nama xwe ya paşî de

Û tu ji min dipirse

Divê mirov berê ji kîjan parçeyî hez bike

Neşe

Tu parçe neke

dilê xwe;

bike kevokek azad

Ya ku karibe biçe her derê

Teyrekî bêpasaport

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### **BERÎ MIRINÊ**

Şerekî bêgem, bêinsaf e ev  
 Bêserî, bêdawî, mina destan.  
 Wê yekî din dagire rêza ji te vala bibe  
 Li vira ma hesabê yek merivî dibe!...

Dana ber gulleyan; pişt re genîbûn...  
 Her tişt tazî, bi vac, mîna jîyanê.  
 Lê bi hev re bin em ê di bahoza mezin de  
 Gelê min, çimkî me hezkir ji te...

### **STRANA EVÎNÊ**

Mîna kûpekî barûdê dikeve ser me  
 avahiyek ji betonê, ecêbek.  
 Di dilên me de himîna cengê,  
 di nava me de serhildan, ar û xwîn.

Dibînim vê serhildanê niha jî  
 di pixêriya fabrîqan de,  
 di soringa rojava de,  
 li ezmanê şîn yê sayî.

Gava teng bû li van deran pêçana tirsehêz  
 nêzî min bibe, were bêje,  
 ma sûc e vêya ku ez dikim:  
 di dilê xwe de ciyekî ji evînê re vediqetînim?

Ma sûc e naxwe, were bêje,  
 gava bi hirmegirman diçelqin fabrîqe,  
 ku bi mîtralyozan tê reşandin û tê qusandin navder  
 ma sûc e ku bêjim "ji te hez dikim" ?

Cîhana evîna me zêde teng bû,  
 ma emê çî bikin, yarê, ev rastiyeke e!  
 Loma ez vê stranokê dişînim ji te re  
 pêşerojek ku di çavên min de diçirûse!



### **BIZARVAN**

Ey kesên zaniyarîyê diçînin li zevîyê gel  
 Ger hûn ne ewle bin bi wê axê  
 Ku tovê hûn diçînin lawaz be  
 Bawerîya we hindik, taqeta we kêm be  
 Wê rûyê we nekene di roja çinîne de  
 Ji pûçderketina beran re amade bin

Li ku ne hûn ey kesên mêrxas, rû zînde?  
 Yê dînemêr, biryarkar, bîrbir?..  
 Herne pêş!..  
 Yê pispore, qenc û bêdawî biçînin  
 Biçînin û temaşê bikin  
 Bê kare çî tiştan biafirîne gel...



### STÛNA ALA MERASÎMÊ

Stûna ala merasîmê îro tazî, vala  
 Di navbera darên Eidsvoll`ê yên şîn dibin  
 Lê tu demê wek aniha  
 Me nizanîbû azadî çi ye.

Aniha li ser tevê welat stranek  
 Bi zarê xwe deng li serketinê dike  
 Bi lêvên girtî pispîsa ramanekê  
 Di bin nîrê biyanî.

Bawerîyek ku di nava me de bi cîh bûye  
 Dibê ji hev naqete jiyana û azadî  
 Werê pêwîst e ku ev  
 Ji bo bêhnvedana bi mirovî.

Loma xofa dîlîtîyek bi xeniq  
 Aniha em heya kezeba xwe his dikin  
 Mîna di keştîyek noqbûyî de mabin  
 Û em naxwazin mirina werê.

Ji bajarên dişewitin xerabtir  
 Vê cenga ku kes nabîne

Belav dibe mîna rûberekî bi jehr  
Ser mêrgan, berfan, daran

Kirêtîya toqînê û namerdîyê  
Tu dibê qey mîrata webayê ye di mala me de  
Lê dunya ku em xeyal dikin herî cûda ye  
Ya ku em bêrîya wê dikin, ya em ji bîr nakin..

\*Roja "Cejna Azadîyê û Qanûna bingehîn" ya Norwêç`ê.





### KÛZÊ ŞIKESTÎ

Li hundir vegerîn tê pêşandan, cîhanek sergêjanîyan û pêtîyan çêdibe li enîya xeyalker:

Royên şîn, girênekên kesk, nikilên tîrêjê, yên stêrên dişibihin hebê hinaran bi nikilandin vedikin,  
 Berberoya bejî, çavên zêrînî yên di nivê berwarekî şewitî difitile û dimîne,  
 Rêlên qirîstal yên dîkin çingîn, rêlên pêlan, bersîvan, dengvedanan, peywendîya hilûyan,  
 Ba, di navbêna dîwarên gerdana avpijênêkê yê dirêj re bi çargavan av,  
 Hesp, kevîrê-ezman, rokêta ku dilê şevê qul dike, pûrt, kanî,  
 Pirç, ji nişka ve vebûna meşalan, mûman, basikan; nijdeya sipîtîyan,  
 Çivîkên giravan yên li enîya xeyalker dixwînin!

Çavê xwe vekir min li ezman nerî, min dît bi stêran girtîbû şev;  
 Giravên zînde, ji giravên veketî bazin, kevîrên dişewitîn, bêhn vedidan,  
 komên kevîran yên sipîsax,  
 Wan kanîyana hemû, ronîyên zelal, gizvanokên dirêj yên xwe bera ser milekî tarî didan,  
 Çiqas zêde robar, cîranê agir dengê avê yê ji dûr ve tê, ronîya teniştê sîyê!

Çeng, baxçeyê çengan.

Lê bitenê bûm di zevî de ez:

Kaktus bûn, sinc û stirî bûn, latên mezin bûn yên li ber royê diderizîn.

Kêzikên çirçirkan bêdeng bûn.

Bîhna ixlamûrê û tovên şewitî yên serberdayî hebû,

Mexelên çemên zuhabûyî bûn kolanên gund,

Wê hewa bi hezar perçan bela biba ku bang bikira yekî: kî ye ew`ê diçe?

Girên şorax, çiyakî agirî yê sar, kevir, di bin vê debdebê de helke helkîn, dara Sekoya, tahma tozê,

Di tozê de pêjna lingên xwas, di nîvê zevî de darek dirêj, tu dibê qey kanîyek di cîh de bûye kevir!

Bêje min, Sekoya, axa şewitî, axa hestîyên veşartî, bêje min, heyva êş û xeman, Ma av tune ye qet,

Ma tenê xwîn hey e, ma ax hey e, ma tenê şopên lingên xwas hey e li kelem û sitirîyan,

Ma tenê pertal hene, ji kêzikan re xwarin, ma xewarî hey e di bin navroja bêol, di bin wî serokê bi zêrikî de?

Li ser latên rexên çeman yên mezin, sawî dibiriqîne, ma hespên ku dikin şîrîn qey tune ne,

Di avên zelal, di bin tîrêjên pelan yên şîn, di bin hoqînên mêr û jinên di şeveqê de xwe dişon ?

Yezdan li ku ne, yezdanê garis, yezdanê kulîlkan, yezdanê avê, yezdanê xwînê, Dûşîze,

Ma tev mirin, ma qey çûn, kûzê şikestî yê li cem kanîya xetimî ?

Ma tenê beq dijî ?

Ma di şevê Meksiko de tenê beqa kesk dibiriqîne ?

Ma tenê serokê Cempoala yê qelew bêmirin e ?

Yê li bin dara Yeşmê ya pîrozwer ya bi xwînê hatiye avdan diarime,

yê ku du kolê ciwan lê bawêşînê dike,

Yê ji merasimên mezin re pêşdarî dike, bi xwesipartina xaç; him ya çekê, him ya gopalê xwe,

Di bin cilên cengê, di pişt maskekî ji kevir hatîye kolan,

yê dûyê desteyên îdamê dikişîne nava xwe, mîna bixûrek hêja,

Yê ku piştî hefteyên dirêj derbas dike li birca xwe ya li ber peravê, bi yarika xwe re, bi xişlên yarika xwe ya neon re.

Ma tenê beq dijî ?

Bi devê xwe yê ji kêran, ji camên tûj li wê erna kesk ya sar binere,

Binere li sehê bi birçîtî dizûre,  
 Li pincarê sebrê yê ku napeyive, li kaktusa bi sitirî, li kulîlka xwîn bûye, xwînê  
 diherikîne binêre,  
 Li kulîlka xwedîyê hendesa bêeman ku dişibihe hacetekî îşkencê ya narîn,  
 Li şevê binêre, li şeva bi diranên xwe yên dirêj, bi çavê xwe yê dide qamçîyan,  
 li şeva bi kevirekî nedîtî çerm diguro,  
 Li diranên dike xirme xirm gohdar bike,  
 Li hestîyên hestîya dişikîne gohdar bike,  
 Li hestîyê kemaxê yê li defa çermê mirov dixê,  
 Li pahnîya har ya li defa sîngê dixê,  
 Li roya şêt ya li tamtama betanê guhan dixê,  
 Li toza mîna keyxanekî zer bilind dibe binêre, ya her tiştî hildike û diqetîne,  
 toza bi tena serê xwe direqise û dikeve,  
 Mîna darek ji nişka ve rehên wê hişk bûbe, mîna barûyekî bi yek derbê hilweşe,  
 Li mirovê dikeve, radibe, tozê dixwe, bi erdê re dikişe binêre,  
 Li kêzmirovê latê parçe dike, yê sedsalan parçe dike, yê ku ronahîyê dibîne diranê  
 xwe diqîriçîne,  
 Li lata şikestî binêre, li mirovê şikestî, li tîraja şikestî.

Naxwe ma yek tişt e ku em çavê xwe vekin jî, bigirin jî ?  
 Raman kelehên nava me dişewitînin û dirûxînin, ji bo ku yekî din bilind bibe li şûna  
 wan,  
 Di nava pêtîyan û pirîskan de,  
 Tovekî xeyalê yê qahfê serî biterikîne, mezin bibe û bibe dar,  
 Ji bo bêjin lêvên li gotinê digerin.

Kevirên pîrozwer kişand kanîya mirov ya kevnar,  
 Sedsalên kevirên li kanîya mirov civîyane, salên kevirên goran, deqeyên kevirên  
 laşgiran  
 Ji min re bêje, Sekoya, kevirê ku ji alî dema bêdiran tê sîqalkirin, birçîtîya bêdiran,  
 Toza ku ji alî diranên ji sedsalan çêbûne tê hêran, sedsalên ji birçîtîyê çêbûne,  
 Ji min re bêje kûzê jikestî yê di nav tozê de, ji min re bêje,  
 Ma rohnî ji bo mirov hestî di hestî bide çêbû, mirov di mirov, birçîtî di birçîtîyê de,  
 Heta prîsk, qîrîn, gotin bipeke,  
 Heta av biherike, heta dara fireh ya pellacîwerd bilind bibe?

Divê mirov bi çavê vekirî razê, bi destên xwe têkeve xeyalan,  
 Xeyalên robarê li mexelê xwe digere, xeyalên roja cîhanên xwe xeyal dike,  
 Divê mirov bi dengê bilind têkeve xeyalan, stranên bêje,  
 heta ku stran reh bidin, heta beşen, şax, teyrik, stêrkan bide,

Divê mirov stranan bêje, heta çêbibe simbilê sor yê ji nû de çêbûnê, di nava yê  
 radizê de,  
 Ava jînê, kanîya em jê vedixun, ya me bi me dide naskirin, dide başkirin,  
 Ya ji me re dibê ku çima em mirov in, ava di şevên bi tena serê xwe dipeyive,  
 ava bi navê me gazî me dike,  
 Kanîya peyvên dibê ez, tu, ew, em, heykelê baranê yê zînde li bin dara mezin,  
 Ciyê me cînavên xweş lê digot, bi xwe zanîbûn, bi bawerîya navên xwe,  
 Divê mirov bi beropaş de têkeve xeyalan, ber bi kanîyê, ber bi sedsalên bihurî  
 sekanan bikişîne,  
 Ji zarotîyê û wê de, ji destpêkê û wê de, ji avên mêrûnê û wê de,  
 Divê meriv birûxîne dîwarên navbêna mirov û mirov, divê mirov parçan bigehîne  
 hev,  
 Ne cîhanên dijber in jîyan û mirin, em yek çiqilê ji cotek kulîlkên cewî ne,  
 Divê mirov wê gotina wenda bibîne, têkeve xeyalan ber bi hundir, ber bi derve de jî,  
 Divê mirov deqên ku li rûyê şevê hatiye kutan ji hev bigerîne,  
 li rûyê navrojê binêre, maskê wê biçirîne,  
 Divê mirov di tava rojê de bê şuştin, fêkîyê şevê bixwe, nivîsên sitêran, çeman hîn  
 bibe,  
 Divê mirov di bîrbîne bê xwînê çî digot, hîlbûn û dahatin, ax, beşen,  
 divê mirov vegere xala ciyawazîyê,  
 Ne hundirê wê, ne dervê wê, ne serê wê ne binê wê, xaçerêka hemû rêyên jê dest  
 pê dike,  
 Tîrêj, bi dengê avê re strana xwe dibê, çimkî av, bi dengê pelan re,  
 Şeveq bi fêkîyan tije ye, şev roj di aştîyê de, bi hev re diherikin mîna çemekî bêliv,  
 Şev û roj bi hev şa dibin mîna jin û mêrekî evîndarê hev bin,  
 Mîna yek çemî bêdawî diherikin di bin kembera sedsalan re demsal û dîrok,  
 Berbe navenda zînde ya serkanîyê, ji dawî û destpêkê wê de.

## JI BÎRKIRIN

Bigire çavên xwe, wenda bike xwe di tarîyê de  
 Di bin pelên sor yên pêlûyên çavên xwe de.

Di dengê dike vizînê werbe  
 Di nava xelekên dengê dikeve  
 Û di yê li dûrahîyan dengvedide  
 Mîna şîpek bêziman,  
 Li ciyê ku dahol lêdidin

Xwe berde nava tarîyê,

Di nava goştê xwe werbe,  
 Di dilê xwe;  
 Hestî, wê brûska mor,  
 Bila biteyisîne çavên te, kor bike,  
 Bila sînga xwe ya şîn rêbide ronîya êvarê  
 Di nava kendav û newalên bi sî de.

Di xewa wê tariya rohn de  
 Şil bike tazîyê xwe;  
 Kî zane bê kê danî delav  
 Laşê te, wê tentena kefê jibîrbike.  
 Jîna bêdawî, xwe wenda bike  
 Di bêdawîya kesaniya xwe de,  
 Mîna dengizek digehê dengizek din  
 Xwe jibîrbike, min jibîrbike.

Lêv, ramûsan, evîn, hertişt ji nû de diafire  
 Bi wê bêmirina, wê jibîrkirina tazî re:  
 Keçikên şevê ne sitêrk.

#### **LI DERNÎ JI EVÎNÊ JÎ WÊ DE**

Hertişt bi me re destpêkir:  
 Demê, qetkir  
 Ya ji paşeroja min dirêjî pêşeroja min dibe  
 Qetên zînde  
 Mîna satorê li mar dikeve;  
 Çirûsk diçirisandin,  
 Lênerîna kor ya ziqmayî;  
 Gotinên, tora ruh ya kunkunî;  
 Navên me, şiyarkirina tiştên di navbêna min û te de  
 Valahîya dîwaran tu borîzan nikare bihejîne.

Ne gelê ku xeyal û hêvîyê wî şikestî  
 Ne gotinên nehişî ne kefên pêxemberî  
 Ne hezkirina bi diran û naperûşkan, besî me ye.  
 Ji xwe wêdetir,  
 Li sînorê navbêna hebûnê û pêdebûna li derekê,  
 Bangî me dike jîyanek ji jîyanê zîndetir.

Li derve bêhnvedide şev, xwe berdide,  
 Bi pelên xwe yên mezin û germ serxweş,  
 Bi neynikên bihev re şerdikin:  
 Bi fêkî, naperûşk, çav, şax û gulîyan re.  
 Bi milên dibiriqîne,  
 Bi laşên di nava laşan ji xwe re rê vedikin.

Vekeve li vê perava vê kefê.  
 Mîna tu xwe berde, bêzanîn, li hemû delavê vê jîyanê;  
 Belavbibe, ey sipîtîya bêhnvedide,  
 Bihêle hisbikim perpitîna dilê te, hey stêra belavbûyî,  
 Ax tu çam, ax berbe perê şeveqê ve  
 Nanê ji mêzîne girantir tê,  
 Tu bêhnvedena xwîna navbêna vê demê û demek din ya bêsînor.



**ORHAN VELI KANIK**

13 Nîsan 1914 Îstanbûl – 14 Mijdar 1950 Îstanbûl

### JI BO WE

Ji bo we, xwîşk û birayên min yên mirov,  
 Her tişt ji bo we;  
 Şev jî ji bo we, roj jî;  
 Bi rojê şewqa royê, bi şevê şewqa heyvê;  
 Di heyveronê de pel;  
 Di pelan de meraq;  
 Di pelan de aqil;  
 Di tava rojê de bêhejmar kesk;  
 Zer jî ji bo we, pembe jî;  
 Gehîştina can ya kefa dest,  
 Germaya wî,  
 Nermaya wî;  
 Xweşîya di razanê de;  
 Demxweşî ji bo we;  
 Ji bo stûnên li sitargehê kil dibin;  
 Navê rojan,  
 Navê heyvan,  
 Boyaxên beleman ji bo we;  
 Ji bo we lingên namevan,  
 Destê pîrot;  
 Xwêdana ji enîyan diherike,  
 Gulleyên li bereyan tîn xerckirin;  
 Ji bo we goristan, kevirên goristanan,

Zîndan, kelepçe, cezayê dardakirinê;  
Ji bo we;  
Her tişt ji bo.



## KURDISTAN



OSMAN SEBRÎ

1905 Narincê, Kolik, Semsûr- 11 Cotmeh 1993 Berkevir

## MERŞA AŞÎTÎYÊ

Xortê çak rabe zû me divê dilşadî,  
 Serxwebûn, aşîti, serbestî , azadî,  
 Van tiştan her divê pîr xebat, west û xwîn,  
 Berî me sed hezar, sed hezar têda çûn,  
 Koledar bûne har, wan divê ceng û şerr,  
 Di vê rê pîr didin dolara zêrê zer,  
 Agirê şerr dadan, Korîya bû dojeh,  
 Tang û top qumbele xwîna wan dirêje,  
 Ev hemî di reya dewlemendên çillek,  
 Dimirin keç û kurr, mêr û jin lek bi lek,  
 Mehêlin şerr bibe, aşîti ol û jîn,  
 Em bira tev hemî, bo çi ev qirr û kîn,  
 Sor û gewr, reş û zer em yek in, tev bira,  
 Hemîyan yek rê ye, yek raman, yek çira,  
 Mesîhî, Musewi, Misilman hemdem in,  
 Mecûsî, Ezdî tev kurrên Adem in,  
 Me divê aşîti naxwezin şerr û bend,  
 Bimirin koledar şerrxwazên dewlemend,  
 Her bijî aşîti, aşîtxwez bijîn,  
 Serbilind, serfiraz her wekî baz bijîn.

**DURÛ**

Ho reha çepel .' tev grêk û xar,  
 Ji ruçikên çak hemîyan bê par,  
 Ola te qelsî, bawerî, derew,  
 Dilê te qirêj , bes ziman derew,  
 Ramanek ne rast bû rêberê te ,  
 Ji rûmet vala maye serê te ,  
 Naşî bibêjî, tu gotina rast,  
 Dikarî bêjî: "Reşe rengê mast" .  
 Dikî, dibêjî her tiştê kirêt,  
 Xwe jê didî paş bê şerm û fihêt,  
 Ji bo demekê têyî veşartin,  
 Ji terra pirr tişt têne spartin,  
 Lê dawî a rast wek royê tê der,  
 Ew dibî rûreş, her serî di ber,  
 Hinga tê zanîn tu çi hêsanî,  
 Ji dûrva meriv rengê sa nî,  
 Zuka biqueşe her ji pêş me,  
 Em bêhn teng dibin bi dîtina te,  
 Rûyê te yê çil navên bibînin,  
 Ji ber kirên te tev dil birînin,  
 Sed hezar xwelî 11 nav çavê te,  
 Ji hinda pirtir para bavê te,  
 Ku li pê xwe hişt kurekî durû,  
 Bi sermesarî cihan berda çû.

**NEWROZ**

Newroz çiqas delalî  
 Her dem û gav di balî,  
 Her sal di vê çaxê da  
 Bi kêf û lîz û govend  
 Gul û kulîlk û çiçek  
 Çem û cobar tijî tên  
 Berf li çiya dihele,  
 Wekî çînên reşbelek  
 Rûyê erdê ji rûkî ,  
 Nêrgiz, gupik û çiçek  
 Di van rojên şîrin da  
 Çi keç û xort û mindal

Dikin cejna sê rojan  
 Derdikevin ji malan  
 Ew hildigirin digel xwe  
 Hinek bi saz û sowet  
 Cîh cîh li hev dicivin  
 Hinek ji wan genimgûn  
 Hinek ji wan çavreş in  
 Gehîştina destê wan  
 Li ber çem û çîmenan  
 Direvin û dikenin  
 Li ser gul û çiçekan  
 Her dadinin û radibin  
 Dema ji wan dîyan bin  
 Dibe pîrçe-pîrqa wan  
 Dawî di hev dibanin  
 Hinek dibên dîlokan  
 Bisk û zilfên zerîyan  
 Li ser dêm û rûyên gewr,  
 Dilê xortan ji evîn  
 Bi nêhrîna zerîyan  
 Kal û pîrên qerçimî  
 Demên borî dibîrin  
 Lê çi feyde, nayê dest  
 Vedikujînî derdan,  
 Tuyî cejna me kurdan  
 Bîst û yekê Avdarê,  
 Me digihînî beharê,  
 Dibîşkivin di baxan,  
 Heta perav û şaxan  
 Bes dimînin belekî,  
 Dilgeş dikin gelekî.  
 Giya dertê kesk û şîn,  
 Ji her alî didin bîn,  
 Welatê kurd ser û bin,  
 Kal û pîr û bûk û jin,  
 Bi xweşî û ken û bang,  
 Bi xirroşme qîr û bang,  
 Nan û den û sîranî,  
 Hinek bi sergiranî,  
 Keçên xweşik û dîlber  
 Hinek jê çûrr û gulîzer,

Kezî dirêj gewr û boz,  
 Divê gelek dew û doz,  
 Di nava bax û bostan,  
 Cihan dibe gulistan  
 Ew surperî weke hing,  
 Tekra dikne vinge ving,  
 Xortên çeleng û şapik  
 Dibin çiman wek xezal .  
 Vedigerin çend bi çend,  
 Dibe dîlan û govend.  
 Ji duzanê der tîn,  
 Dipengizin, derrin tîn,  
 Tijî dibe, dike coş,  
 Tev dibin gêj û serxoş,  
 Her ew didin keseran,  
 Dixwezînin dîlberan.  
 Emrê çûyî carek din.  
 Wekî gula çilmisî,  
 Dilê xwe yê perritî  
 Wê birîna bê derman  
 Dijwarîyek mezin e  
 Bizan gelek kirêt e,  
 Hersê rojên cejna xwe  
 Tev kêr û saz û sowet  
 Divîya bû tiştêkî bêjim  
 Zanîna min hinde bû  
 Belgê wê dikevin bin,  
 Bi hezringa dax dîkin,  
 Bi xeyalan sax dîkin.  
 Qelsîya xwe bîrbirin,  
 Pirr jê xweştir e mirin,  
 Derbas dîkin bi başî,  
 Reqs û dîlan di xweşî,  
 Çend gotinan di newroz  
 Gelo cejna we pîroz.

### **ALA RENGÎN**

Min divê her tu bilind bî  
 Ala rengîn kesk û zer.  
 Him xweşî him ceng û rûmet

Tê n zanîn ji sor û gewr  
 Dûr, nêzîk ezê te hildim.  
 Tu yî xemla banê min.  
 Ger bi vê derman mirin bî  
 Bo te gorî canê min!  
 Sê salan bi te kêfxweş bûm,  
 Agrî, Zîlan, Tendûrek,  
 Li pêş suhna te bûne ax.  
 Leşkerên Turk lek bi lek  
 Dêrsîm û Sasun û Pijder  
 Bo te xwînê dirêjin.  
 Herçî xort in, herçî Kurd in  
 Bo te lavjan dibêjin,  
 Leşker im bot e ala min.  
 Min divê gurmîn û şer  
 Duwanzde mîlyon bûne pandî,  
 Bo te Kurdên pir huner.

Osman Sebrî, 1936



### **BERÎ HATINA FIROKEYÊN KU BAJAR ŞEWITANDIN**

Van zarokên di bin şeveqa leylankên vekirî bimirin heger  
 Heger van dîwarên di bin hîva kevzeş bimirin  
 Ji bo tehlîyê nekişine bi me, divê her tiştî binerd bike tu  
 Bêdeng gorevan

Jibîrkinê daxwaz dîkin kulav û mêxik ji te  
 Gava li mêrgên şil datanîn pinpinîk  
 Ji bo mirîyan maçî bikin

Dîwarên dirûxin wê kî his bike gorevan  
 Wê kî his bike qîrîna zarokên tîn eciqandin  
 Naxwe ma qey tê şeveqê jî binerd bike  
 Di gora mij û moranê de

Gava her tiştê di bin wê hîva kevzeş ya dûr bimire  
 Ji bo tahlîyê nekişine bi me, divê her tiştî binerd bike tu  
 Bêdeng gorevan

Zarokên genim bîhndidin ji bîr meke zinhar!  
 Zinhar ji bîr meke dîwarên dîrok bîhndidin!  
 Şeveqa bilûra birîndar bîhn dide ji bîr meke zinhar!



### WELATÊ MIN KA EM BIÇIN

Rojekê xwe gihand welatê min azadî  
 Di rêçika sibeh destpêkir ji nû de  
 Kulîlkên hêvîyê hebûn di destê zarokan de  
 Di her simbilê ku taqetek veşartî şîyar dibû  
 Min bi destan girt û meşîya welatê min yê bi jorketî.

Ji bo te ez strana pêşerojê qîrîyam  
 Çîrokên herî berketî min ji bo te gorî kir  
 Ji bo tu bibîne min pêşkêş kir çavên xwe  
 Mirovên teze yên ciwan can dan ji bo te  
 Wê berxwedariya pîrozwer bû ya alê bir  
 Ji çîyan hatin bi jorketin berbi pêşerojê.  
 Bîranîna navê te mîna jîyanê bû  
 Bîranînek ji xeman, ji êşan, ji îşkencan  
 Di dozek bilind ya ku têgehîştinan zêde dike  
 Bi her kenî re berxwedariya min bisûn.

Tu xeta ku lê rojhilat şîyar dibin  
 Şervanên ku ji şevên bi jan diweste  
 Evîn e tu, bi jorketîye tu, tu welatê min e

Berxwedana taqeta min ya li hember pênûsên firotîye tu  
Tu xof e ji caşan re, tu têkçûn e ji zordarîyê re  
Bi navê te gumreh dibe serhildan.

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)





### HIN TIŞTAN EŞKERE DIKIM

Hûn`ê bipirsin: leylaq li kunin kanî?  
 Metafizîka bi pelên batînokan li ku ye?  
 Barana ji gotinên te re qunên hûrik vedike  
 Û wan direşîne li ku ye?  
 Çivîk li ku ne kanî?

Ez`ê her tiştî bêjim.

Dervî bajêr dijîyam,  
 Dervî Madrîd`ê, bi naqosan re,  
 Bi saetan re, bi daran re.

Ji wê dera dihat dîtin  
 Rûyê Kastîlya yê zuha bûbû  
 Mîna okyanûsek ji çerm.

Ji mala min re digotin mala kulîlkan,  
 Çimkî di dîwarê wê re  
 Derzîlokan didan der  
 Malek delal bû  
 Bi sehên xwe, bi zarokên xwe.

Hat bîra te Raul?  
 Refael hat bîra te?  
 Hat bîra te Federîco?  
 Di binê erdê,  
 Hat bîra te, di balkonên wê malê  
 Tava Hezîranê devê wê tije kulîlk dikir  
 Birayê min, birayê min!

Her tişt,  
 Wan awazên stûr, xwêya dezgehan,  
 Firneya ku nanê hilatî derdixist  
 Û bi heykelê xwe bazara Arguelles  
 Te di got qey hibirdankek zuhabûyî bû di nav xapînokan de:  
 Rûn diherikî kevçîyan,  
 Terpîna lingan û destan ya kûr  
 Mezin dibû li kuçan,  
 Metre, lître, bingeha pîvana jîyanê,  
 Komê masîyan, kiremîtên bi roja xwe ya sar  
 Ku gulbak jî dida behitandin,  
 Tenikî û sipîtîya kartolan ya harbûyî,  
 Pêl bi pêl firingî digindirîn dengizê.  
 Sibeyekê vana tev vêketin  
 Ji bo daqurtîne hemû jîndaran sibeyekê  
 Ji erdê pijiqî  
 Agirê şahîyan,  
 Çek hebû êdî,  
 Êdî barûd hebû,  
 Xwîn hebû êdî.

Bi firokên xwe keleş hatin,  
 Bi gustîlên xwe, bi duşesên xwe keleş  
 Bi keşîşên xwe yên reş ku teqdîs belav dikirin  
 Keleş hatin ji perê ezmana ji bo zarokan bikujin,  
 Xwîna zarokan herikî li kuçan  
 Ripîrast xwîna zarokan herikî.

Wawîkên ku wawîk jî ji wan dinefirin,  
 Kevirên ku devîyên hişk jî tif wan dikir,  
 Marên ku maran jî didan xelandin!

Gava rû bi rû hatim bi vana re  
 Min xwîna Spanya dît,  
 Hildibû  
 Ji bo we bifetisîne di pêlek şeref û kêran de!

Generalên xayin:  
 Mala min ya mirî bibînin,  
 Binerin li Spanya`ya tar û mar:  
 Madenê helîyayî diherike ji her malê  
 Ji şûna kulîlka ve,  
 Ji her korta Spanya  
 Spanya bilind dibe,  
 Ji her zarokekî mirî tivingek bel dibe,  
 Tivingek ku dibîne,  
 Gulle çêdibin ji her kuştinê,  
 Wan gulleyana rojek ji rojan  
 Wê ji duwanzdan de li dilê we keve

Hûnê bipirsin: helbesta wî çima  
 Xeyalan nabêje, pelan  
 Ê çiyayên agirîn yên mezin yên bav û kalên wî  
 Werin bibînin xwîna li kuçan.  
 Werin bibînin  
 Xwîna li kuçan.  
 Werin bibînin xwînê  
 Li kuçan.

### **DI DIL DE JI ÎSPANYA**

Birano pêşde  
 Pêşde di erdên ajotî re  
 Di nav rezan re pêşde  
 Kevirên sar bicûn  
 Di şeva zuha de pêşde  
 Di şeva bi niqre û ya bêxewn û wirêne dike  
 Silav silav bidin pey, ji dengê zivistanê tûjtir  
 Ji pêlûya çav hesgîrtir  
 Ji brûskê ewletir  
 Mîna elmasê lezgîn tam  
 Mîna ava erdên naverast ya bi tehlî şervan  
 Li gorî şerabê û kulîlkê

Li gorî dilê erdê yê lefandî  
 Li gorî kokên hemû pelan  
 Li gorî berên erdê yê bi bîhnên bêhejmar  
 Silav leşkero, şûvên sor, nefela hişk  
 Silav gelên ketîye ber pêtiyên brûskê  
 Silav silav silav  
 Pêşde pêşde pêşde  
 Li madenan, li goristanan, dilbijîna mirinê ya tirsehêz  
 Berî vemirîna terora xayinan  
 Gelê bi bandor dil û tufeng  
 Tufeng û dil pêşde

Wênekêşno, madenkirno, karmendno, rêhesinkirno  
 Birayên komirê û kevir  
 Bav û kalên mîrku  
 Cejnên şadîya daristanên widakirî, pêşde  
 Cengdarno, serdarno, çawîşno, qomîserên sîyasî  
 Pîlotên gel û yên di şevê de şer dikin  
 Yên di dengizê de şer dikin pêşde  
 Li pêşiya we tiştek nîn e ji xeynî zincîrek mirî  
 Hîna nîn e tiştekî din ji xeynî çalek masîyên genî  
 Tiştekî din nîn e hîna li vira ji xeynî mirîyên can didin  
 Avzêlek sawêr ya ji nêma û xwînê hey e  
 Nîn e dijmin, Spanya pêşde  
 Pêşde naqosên gel  
 Welatê fêkîyan  
 Pêşde direfşa geniman  
 Pêşde sertîpên agir  
 Li çiyê û di şeveqa îsota tûj hilgirtî  
 Di cenga li ser pêlê û li mêngê  
 Hûn zincîrek nayê qetandin hildigrin  
 Ê zayinek bi berdewamî

Di vê demajoyê de  
 Ji bo li bendî serketina madenî bimîne  
 Koka kûr û çeleng bêdeng bilind dibe  
 Her pergala her tekerê sor  
 Her destikê xîzarê her hesinê hewcar  
 Her tiştê ji axê tê kişandin û derxistin  
 Her lertzîna xwînê dide ser şopa te  
 Ey artêşa gel..

### LÎWAYA NAVNETEWÎ\* YA KETÎNA MADRÎDÊ

Di sibehek heyvekê ji heyvên sar  
 Di sibehek heyvek azarde bi herî û dûmanê qirêj bûye  
 Heyvek ji çongên xwe û berjêr de nîn e  
 Rojên xemgîn yên bi gemaro û bêhêvîyê tije  
 Li seranserî mala min û camên şil dihat hiskirin  
 Dengên wawîkên Efrîqa  
 Yên bi çek û diranên xwe bi xwîn dizûrîyan

Wê demê

Ji dêvla hêvîyê tenê me barûd xeyal dikir  
 Gava me raman dikir ku gerdûn bi kesên har  
 Bi dêwên çavbirçî tije ye

Wê demê

Bi  
 Qelaştina mija Madrîd`ê ya sar  
 Di mijên şeveqê  
 Bi van çavên xwe min dît, bi vî dilê xwe  
 Min dît hatina neferên mêrxas  
 Qolên tenik, dijwar, leheng, agirmend û ji kevir

Kêlîyek bi şîn bû wê gavê  
 Tiştêkî tirsehêz bû, tirsehêz  
 Tirsehêz bû, mîna komirek zînde bizê  
 Zayina jînê ya tunebûnekê  
 Û mirîyên Spanyolî hene  
 Tehltir û notir in ji mirîyên din  
 Di ser zevîyan re difirin, heta bi genim  
 Bi rûmet bibin

Xwîna mirovan ya qurifî li kuçan  
 Tevlî ava ji dilê malên hilşiyayî diherike, dibe  
 Hestîyên zarokan yên hûrhûrî bûne  
 Bêdengîya dilşikên ya di şîna dîyan  
 Dîsa nema vedibe çavê wan yê hatîye girtin, bêgunehên  
 Dest û mil girêdayî  
 Mîna xem û wendayîyê bûn, mîna bexçakî hatibû tifikirin

Yên cardin jînde nebin, bawerî û kulîlkên mirî bûn

Hevalno

Piştire

Min we dît

Hîn jî niha bi serbilindî dinêre bîbilkên çavê min

Seranserî sibeyek bi mij ku layiqî enîya başnîjad ya

Kastîlê

Bêdeng, hêmin û tebût

Di hilatina rojê de hûn mîna naqosekî bûn

Bi giranî û çavên xwe yê şîn hûn ji derên dûr

Dihatin

Ji niştîmana xwe, ji welatên xwe yê wînda, ji xewnên xwe

Hûn bi çekan û bi xwînsêrînîyek şewitî hatin

Ji bo parastina vî bajarê Spanya

Azadîya li vî bajarî hatîye dîlkin

Dibe bikeve û bibe xwarin ji teban re

Birano ji niha û pêde

Dilpaqijîya we, taqeta we û serpehatîya we ya bilind

Bila zanibin zarok, bila jin û mêr zanibin, bila kal û pîr zanibin

Bila bigehê herkesê bêhêvî maye, li jêr

Yên di madenan ku di dûmana zacê de diqedin,

Ji pêlingên nemirovîya koletîyê,

Loma bila hemû stêr, loma bila

Hemû simbilên Kastîlê û cîhanê binivîse

Navên we yê mîna darek berû xurt û gerdûnî

Û şerên we û serketinên we yê bi jan.

Û ji axê

Bi fedakarîya we çê bû

Bawerîyên wînda ji nû de,

Li rûyê erdê ewlekarî, dilê kuta bûye,

Di nava bereket, başnîjadî û mirîyên we re

Wek di nava rojeke ji latên hişk yê bi xwîn

Wî robarê muhteşem bi kevokên ji pola û bi hêvî diherike.

\*Lîwaya Navnetewî (International Brigade); di şerê Spanya yê hundirî de, hêzeke ji bo alîkarîya komarparêzên Spanyolî hatibû damezirandin. Ev hêza, ji canfedayên welatên cûr bi cûr ava bûbû.

**HER TIM**

Vê meydanê hezar salî bicûn jî pê  
Nikarin paqij bikin xwîna ji wan rijîyayî li vira.

Bi hezaran deng vê bêdengîyê  
Behitî bihêlin jî  
Wê kata hûn ketin  
Nade jibîrkin  
Di meydanê û di nav keviran re baran  
Belkî kari bifetisîne baran kevirên meydanê  
Lê nikare vemrîne navên we yên bi pêtî

Bi baskên reş bi hezaran şev wê bikevin vira  
Lê wê paqij neke roja ji alî van miriyan tê hêvîkirin

Gelek gelên ku li vê dunya mezin wê roja hêvî dikin  
Roja janên dawîn.

Di roja dadmendîyê ku bi şer hat destxistin  
Û hûn, birayên di şer de ketin, hûn  
Bi bêdengîya xwe,  
Di wê roja bi qudret hûn`ê bi me re bin  
Di wî şerê bêdawî, mîna wê roja bêdawî.

**STRANA GENIM**

Gel im ez, yê nayê hejmar bi tiliyan  
Di dengê min de hêzek ronak hey e  
Bi kêrî qamdana di tarîyê  
Xerakirina bêdengîyê tê

Mirî, mêrxas, sî û qeşa, çî hebe  
Dibe tov ji nû de  
Û gel, di bin axê de  
Dibe tov li derekê  
Genim çawa zîl bide  
Derê ser rûyê erdê  
Bi destên xwe yên sor û delal  
Kun dike bêdengîyê mîna xilçekî

Em gel in, ji nû de çêdibin ji mirinan.

### YÊN NEYAR

Hatin bi tivingên xwe yên tije barûd,  
 Fermana teqandinê dan bi dilhişkî,  
 Li vira rastî gelekî sitran digotin hatin,  
 Gelekî bi hezkirin û bi evîna vatiniyê bûbû yek,  
 Û keça ziravik tevî ala xwe ket,  
 Û li rex wê ket  
 Xortê ciwan yê dibişirî,  
 Di hundir kerb û janê de dît  
 Tirsê gel ketina mirîyan  
 Lê li vira  
 Vî cîyê ku mirî lê ketin  
 Ketin erdê al ji bo bi xwîne bîn şuştin  
 Û ji nû de hatin hildan berbi rûyê kujeran de

Ji bo van mirîyan, ji bo mirîyên me,  
 Dixwazim heyfê hilînim.

Ji yê ku welat di xwîne dan,  
 Dixwazim heyfê hilînim.

Ji celatê ku vê fermana mirinê da  
 Dixwazim heyfê hilînim.

Ji xayinê ku bi sîcî werê bilind bûye  
 Dixwazim heyfê hilînim.

Ji yê fermana vî şerê mirinê daye  
 Dixwazim heyfê hilînim.

Ji yê vî sîcî diparêzin  
 Dixwazim heyfê hilînim.


Ez naxwazim ew destên xwe, yê xwîna me mêtîye  
 dirêjî min bikin.  
 Dixwazim heyfê hilînim.



Naxwazim ew li mala xwe ewle rûnên  
Yan jî wek balyoz bibînim,  
Dixwazim li vir bibînim wan, li vê qadê,  
Li vê dera, ku hatiye darizandin.

Dixwazim heyfê hilînim.

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



## AZADÎ

Li defterên dibistanê  
 Li masa xwe li daran  
 Li xîzan li berfan  
 Dinivîsim navê te

Li pelên xwendî  
 Li rupelên sipî-boz  
 Kevir, xwîn, kaxet an xwelî  
 Dinivîsim navê te

Li wêneyên zêravî  
 Li topan tufengan  
 Li tacên keyxanan  
 Dinivîsim navê te

Li rêlan û çolan  
 Li hêlînan, li sosinan  
 Li bîranînên zarotîya xwe  
 Dinivîsim navê te

Li şevên ecêb xweş

Li nanê gewr yê rojan  
 Li demsalên bi dergîstî  
 Dinivîsim navê te

Li ezmanê belek  
 Li birka bi efnika royê  
 Li golên heyva zêndî  
 Dinivîsim navê te

Li zevîyan û asoyê  
 Li baskên teyran  
 Li aşê sîyan  
 Dinivîsim navê te

Li her bêhnvedana şeveqê  
 Li dengizê, li keştîyan  
 Li ser çîyayê asê  
 Dinivîsim navê te

Li kevza ewran  
 Li xwêdana bahozê  
 Li rerşêşka barana dexezar  
 Dinivîsim navê te

Li kêsimên dibiriqîne  
 Li zengilên rengan  
 Li rastîya xwanê  
 Dinivîsim navê te

Li şiverîyên şiyar bûne  
 Li rêyên dirêj dibin  
 Li qadên xuroş dibin  
 Dinivîsim navê te

Li lempa vêketî  
 Li lempa vemirî  
 Li odayên tenîşt hev  
 Dinivîsim navê te

Li fêkîyên du parî  
 Li oda xwe û li neynikê

Li nivîna xwe ya bê rûber  
Dinivîsim navê te

Li sehê xwe yê xure  
Li guhên wî yê bel  
Li lepûşkên wî yê lawaz  
Dinivîsim navê te

Li şêmûga derîyê xwe  
Li firax û folên xwe  
Li pêtîyên tifika xwe  
Dinivîsim navê te

Li her canê tê pêşkêşkirin  
Li enîya heval û hogiran  
Li her destê dirêj dibe  
Dinivîsim navê te

Li camên behitî  
Li lêvên giramgir  
Li ser bêdengîyê  
Dinivîsim navê te

Li stargehên rûxandî  
Li fanosên vemirî  
Li dîwarên azardilîya xwe  
Dinivîsim navê te

Li nebûnek bêdaxwaz  
Li tenêtîya şûtîtazî  
Li pêlika mirinê  
Dinivîsim navê te

Li xweşîya rindbûyî  
Li tahlûka nemayî  
Li hêvîya bêbîranîn  
Dinivîsim navê te

Û bi hêza gotinek bi tenê  
Vedigerim jîyanê  
Ji bo te çêbûme

Ji bo gazî te bikim

- Azadî

**GABRIEL PERI\***

Mirovek mir  
 Tiştêkî wî nebû xwe pê biparêze  
 Ji xeynî milên wî yên li jîyanê vebûyî  
 Mirovek mir  
 Nebû rêya wî ya pê de biçê  
 Ji xeynî rêya diçe aşitîyê

Mirovek mir belê  
 Didome hîna şerê wî  
 Li hember mirinê li hember jibîrkirinê

Çimkî me jî xwest  
 Tiştên wî dixwest  
 Aniha jî em dixwazin  
 Ê em dibêjin ku  
 Bila kamiranê biçirise  
 Di hundir çavan de, di hundir dilan de  
 Bila dadmendî biçirise li rûkê erdê

Tu zane gotin hene, mirov didin jîyandin  
 Gotinên paqij delal zela  
 Gotina germîyê, mînak gotina ewlekarîyê  
 Gotina azadîyê, dadmendîyê, evînê  
 Mînak gotina zarok, gotina nazikîyê  
 Hinek navên kulîlk û fêkîyan  
 Gotina mêrxasîyê, gotina xebatê  
 Gotina xûşk û bira, gotina heval  
 Ê navê hinek welatan, gundan  
 Navê hinek jinan, hogiran

Perî`yê me jî yek ji wan e  
 Perî mir, di rêya tiştên me didin jîyandin  
 Kunkunî bû sînga wî  
 Lê me wî çêtir nas kir  
 Me dît ku hêvî dijî

## Sipîsax

\* Nivîskarê Fransî û mirovê dewletê (1902-1941). Li hember dagîrîya Alman, tevî Tevera Berxwedana Welatperwer bû. Ji alî Gestapo hat girtin û kuştin.

**RONAHÎ**

Tu demê bi tûmî ne tarî ye şev  
 Li ser xwe ceribandîye min  
 Guh bide, guhdar be  
 Li dû her tengasîyê paceyek vekirî hey e  
 Paceyek ronî  
 Tiştêkî bê xeyalkirin hey e  
 Daxwaza bête cîh  
 Birçîbûna bête têrkirin  
 Dilekî camêr  
 Destekî vekirî ku dirêj bûye  
 Çavên zînde, zînde dinerin hey e  
 Jîyanek hey e, jîyan  
 Ji parvekirinê re amade

**XÛŞKÊN HÊVÎYÎ**

Hey jinên wêrek hey xûşkên hêvîyê  
 We got kevir biqelişe em`ê bihevgehînin  
 Evîne û qencîyê li hember mirinê

Hey xûşkên min yên sax manin sipîsax  
 We got ne xema me ye mirin  
 Divê jîyan bidome

Vay ew roj hat û tê  
 Hey xûşkên min yên pîroz  
 Vay ew roja li vira  
 Ma Şer çî ye xizanî çî ye  
 Wê kulavek bê kişandin ser hemû xeman  
 Kulavek bû û çû  
 Wê rojê tevê mirovan mistdan hey xûşkino  
 Wê rojê tevê mirovan hezkirin heq kirin




### **EZMAN WERÊ ŞÎN**

Ezman werê şîn, werê bêliv  
 Li ser banîyan  
 Bira şaxek şîn kilbibe bilive  
 Li ser banîyan

Vediciniqîne rûyêzman bicarekê  
 Naqosek dike çingeqing.  
 Çivîkek e li ser wê darê dixwîne;  
 Strana xwe dibê.

Vaye jîyan! Çavê xwe veke bibîne;  
 Binere çiqas xweriste.  
 Gurîna her roj ya aram e  
 Ji bajêr tê.

Hey lê tu ku hertim digirî,  
 Tu li çongê xwe dixê;  
 Were bibê ji min re te çi kir,  
 Te çi kir bi ciwanîya xwe?



### DARISTANA DOST

Em tiştên pak hizirîn, pîrûpak;  
 Seranserê rêyên dirêj, bi hevre;  
 Destên me di hevde, li rexhev, bêdeng;  
 Li dora me kulîlkên tarî.

Tikîtenê, li çolê, di şeva kesk de;  
 Em dimeşîyan, mîna dergîstîyan;  
 Li ezman hevv, mêwakî di çîrokê de;  
 Me parkir, wê mêwa efsûnî;

Û em mirin li ser kevzan,  
 Dûr, tenê, bi wê nûrîna,  
 Li bin sîyên wê daristana dost.

Piştî li ezman, bi nûran pêçayî,  
 Min te dît, çavê min tijî hêstir,  
 Havrêya min yara bêdeng.





### NEVROZ (Sorani)

Em rojî salî taze ye, Newroze hatewe  
 Cejnêkî konî Kurde, be xoşî û behatewe  
 Çend sal, gulî hîway ême, pê pest bû, ta ku par  
 Her xwênî lawekan bû, gulî alî newbehar  
 Ew renge sûre bû, ke le asoy bilindî kurd  
 Mijdey beyanî, bû gelî dûr û nizîk ebird  
 Newroz bû, agirêkî wehay xiste cergewe  
 Lawan be 'eşq eçûn, be berew pîrî mergewe  
 Ewa rojhelat, le bendenî berzî wilatewe  
 Xwênî şehîde, be rengî şefeq şewq edatewe  
 Ta êste, rûy nedawe, le tarîxî milleta  
 Qelxanî gulle, singî kiçan bê, le helmeta  
 Pêy nawê bo şehîdî weten, şîwen û girîn  
 Namirin ewane, wa le dilî milleta ejîn

### NEVROZ (Kurmancî)

Eva roja sala taze ye, Newroz hatiye  
 Cejna kevnê kurd e bi xweşî hatiye  
 Çend sal e gula hîvya mebest bû heta par  
 Her xûna lawan bû gula ava nû bihar  
 Wî rengî sore bû ke asoyê bilindî kurd

Mizgîna beyanê bo gele dûr û nêzîk bîr  
 Newroz bû agrekî weha xiste nav cergewe  
 Lawan bi eşq diçûn pêşber pir mergewe  
 Wa roj hilat ji bedena berza welatewe  
 Xûna şehîd e, rengê şefeq şewq vedatewe  
 Heta niha li tarîxa millet da rû nede  
 Qelxana gulê sîngê keçikan be hilnede  
 Bo şehîdê weten naxwaze şîwen û girîn  
 Ew namirin, wa li dilê miletan de dijîn.

### ŞEHÎD HATIN

Hatin şehîdêd bi cilê sore xûnin,  
 Dayka weten, de rabe, silava wan hilîn,  
 Şêx Qadire li pêşê û ser qablê ewan,  
 Çiqas ciwan e, xûn û rîşî spî, pîr û nûciwan,  
 Seyrî van ke, hemû kurdê sef şekîn,  
 Canê xwe pêşkêş kirin û gotin: bijî weten,  
 Qurbana te berêze, ku xem li ber nebe,  
 Bo me mirdine, eger azadî ser nebe,  
 Megrî, menale, ku bi xefet dilşkest nebin,  
 Hinekî li cem te bimîne ber bihuşt herin,  
 Ez wa dixwezim, ku heşir bigrim, xûn berkeve,  
 Bi eşqa millet, bi kizîn û sozîna cergeva,  
 Ew agrê ji dilê min ber be, kefen nakim,  
 Heta dijmin neke zoxal, şert be pif nakim.

### TENÊ DILSOZÎ


Rengê zengê putê siruştî,  
 Qalibê min î kurdî têda riştî,  
 Heta bimirim wê bimîne,  
 Ku wusa ne, wê çi bê serê min,  
 Belê, her kurdim, kurdê ser çil,  
 Pejarê hejar kirme jêr gil,  
 Herze girêkim li ser yalê,  
 Serî datînim ser berd bi dev nalê,  
 Dibînim her çi bange, ez dikevime,  
 Devê min girtî bo hevdemî,  
 Eva qewma mîna peza bê ziman,  
 Dû her kesî ket, ne birne nav wan,

Bi hurî û şûr dest nayê hildanê  
 Bo goşt serê pez nayê birînê,  
 Nika destek peyda bû, xeybûn,  
 Dengê wan heye, rengê wan nabînin,  
 Ketne xola bilind perwazî,  
 Bi rîşîyê baba ketne nav bazî,  
 Bi baskê xeyal û bi belaf û kezaf  
 Em hilfirîn ser banê qaf  
 Em li axa îraqê da dijîn,  
 Çawan em bo hello jê der biçin,

îraq zûda hatîye xulqandin,  
 Toxmê du qewman tê da hatîye çandin,  
 Çawan tê da here rîya bîgana,  
 Bikeve nav van cî û mikana.

#### **BESTEKA KURDÎ**

Wa beyanê gizînga tavê derket,  
 Nema şevê bi tîrêja rojê ser ket,  
 Xunçegul xwe xuyan kir li dara,  
 Bilbilî jî şêwra xwe kir nav gulzara,  
 Lale taraye, li ber perê çîyan,  
 Hênika can e bayê leylexan,  
 Dema êvarê sîbera baxan,  
 Xweş e bo yarê bayê ser şeher,  
 Ev tirana gul û milê can e,  
 Bê te li cem min jîna zindan e,  
 Cejn û şaya min hergav girî ne,  
 Ez û bilbil cote zar û hejar,  
 Hînî hesra me, gulala dewrim,  
 Wa ji daxa te bêwefa bimirim,  
 Çaverîya min ke, wa tîm ser qebrê,  
 Bi hêwa te zêndî bibim du carê..



### **VEBIN ZÎNDAN**


Xizir Paşa me li sêdarê xist  
 Jêkir milên min li tawigê xist  
 Hezkirên ku bihîstin her xwîn girîyan  
 Vebin zîndan em herin dergahê pîr

Deriyê kelê ji kevir û hesin  
 Kêlekên min riziyan ji şilî û baranê  
 Kesî min nîne ku delal bidim bangkirin  
 Vebin zîndan em herin dergahê pîr

Deriyê kelê ji kevir rê nade  
 Pacea wê li Şahê bilind nanere  
 Bi mirina min tenê cîhan narûxe  
 Vebin zîndan em herin dergahê pîr

Dertêm dinerim ji serê kelê  
 Momin û musulm diherin karê xwe  
 Tenê ez ketime tatoleka canê xwe  
 Vebin zîndan em herin dergahê pîr

Ez Pîr Sultan Abdal im hey Xizir paşa  
 Çarenûs çi be tê serê mirovê dijî  
 Te min hesret hîşt ji qewm û bira  
 Vebin zîndan em herin dergahê pîr



### HETA KU LI HEV NEYÊN QEBÎLÊ KURDA

Heta li hev neyên qebîlê kurdan,  
 Her wê ewha bibin xirabe mal,  
 Hemû dinya mezin û biçûk,  
 Xemîlîye bi milk ke wek bûk,  
 Yek berg in, yek ziman û yek reng,  
 Bê xeybet û bê eyb û ar û bê deng,  
 Dinya bi tiran dixun û didin,  
 Her çi meremê wan e, dikin,  
 Her kurd in, tenê bi pakî merd in.  
 Pamalî zeman e, mexsusî kurd in.  
 Her mane bê deng û mezlûm,  
 Mîna erdê xerabe zarê mesûm.  
 Ger bahsê vê dipirsî kîjan e,  
 Şertek e ku bû, hemû temane.  
 Ew şert e bi kullî îtfaq e,  
 Ger Mereş û Wanê, ger Iraq e,  
 Qesrek e awaxî ew îtfaq e,  
 Ger wa ne be, her bi taqe.  
 Sed şêx û mela û mîr û xanî,  
 Bo lezeta îş û zindeganî,  
 Li vî alî wan, bi hîlebazî,

Li wî alî wan, bi teqlebazî,  
 Qir kirin hemû li welat da,  
 Heta milk û re`ya fewta  
 Çi te kir, wan ne kird,  
 Xema wan nî bû ku mirin hemû kurd.

### **TU WERE HÎNÎ FEN BE**

Tu were hînî fen be, çî te li wî ye,  
 Gawur e, Hind e yaxût Cihû ye,  
 Di vê esra dirîxda,  
 Şûrê min qelemteraş e,  
 Û kalanê min qelemdan e.  
 Hesinê sar bi fû nerm nabe,  
 Bi tirane jî hemam germ nabe,  
 Eger karekî nekin li vê navê bi zû,  
 Tu yê wextekî bibînî welat ji dest çû.  
 Merg û jîn wek sîber û tav in,  
 Awa baqî bimînin, her bi tav in  
 Çimkî çî li dara dinê ye,  
 Tê û diçe, hemû wek ba ye,  
 Sed şahînşa û padîşah mirdin,  
 Seyr ke, kurdê me her Kurd in.  
 Her ji Cafî heta bi Goranî,  
 Hesreta min her ew e li dinê da  
 Hacî wê bimre, nagîje dewra wan da,  
 Çi menşûr û gire-girê kurdî,  
 Çi bi nazamî û kitêbê hurdî,  
 Sadî heyama xwe mabû pê nanî,  
 Wek min bû gerok û bê xanî,  
 Nika xelq ji hesretê dimirin,  
 Beytên wî bi zêr û zîv dikirin,  
 Axirê rojekê jî wê bê û ehdî,  
 Xefetê bo min bixûnin weku Sadî.

### **HER KURD E QISA BAVÊ XWE NIZANE**

Ger kurdek qisa bavê xwe nizane,  
 Muheq dayka wî hêz e û bavê wî nizan e,  
 Were, bo te bikim bahsa nîhayet  
 Tifin xweş e, ger tu çakî bizanî,

Salahedîn û Nûredînê kurdî,  
 Ezîzanê Cizîr û Mûş û Wanî ,  
 Mihelhel şerda şêrê Deysemî şêr,  
 Qubad û baz û mîrê Erdelan,  
 Evîn pakê wan kurd in nihayet,  
 Ji ber bêdefterî wunda bûn û Xanî,  
 Kitêb, defter û tarîx û kaxez  
 Ger bi kurdî bihata nivisandin bi zemanî,  
 Mela û zana û mîr û padşayê me,  
 Heta mahşer dema nav û niştîmanî.

### HER KURD E LI NAV HEMU MILET

Her kurd e li nav hemû millet  
 Bê behr e ji xwendin û kîtabet,  
 Bîgane ji tercima zimanî,  
 Esrarê kitêbê xelqê dizanî.  
 Yekser alim, mezin û çûk,  
 Nexwendine qet du herfê kurdî,  
 Ustadê xetên ji van her sêyan e,  
 Wek gund zimanê xwe nizane,  
 Mumkîn e der here ji binçengî,  
 Heta reqem û Xeta Frengî,  
 Bo çi kifrê bi zimanê me nûsîn?  
 Milletê bê kitêb û bê nûsîn  
 Xeyrî kurdan tune li rû zemîn.  
 Qazî, nesir û muftiyên nîzam,  
 Wê ta bigehên ta medres û alim  
 Bo nesîheyê zimanê kurdan e,  
 Şîêrên min delîl û birhan e.

### HAKIM Ê MIRÊN KURDISTANÊ

Hakim û mîrên Kurdistanê  
 Her ji Botan heta Baban,  
 Yek bi yek hafizê şerîyetê bûn,  
 Seyda û şêxê qewm û millet bûn,  
 Seyeda û şêx ji tirsan wan  
 Ew ku mirin, rê ketî ber wan,  
 Seyr ke çawan bûne pûş û agir û neft,  
 Yek li vî alî rû dike ber bi Ecem,

Yê din li wî alî dibine dijminê hev.  
Ka axa Cizîr û Botan,  
Ka welatê Kurdistan?  
Ka ew dema kurd azad û serxwebûn?  
Siltanê milk û millet û xudanê çî û erfana bûn

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



## KURDISTAN



## QEDRÎCAN-EBDILQADIR EZÎZCAN

1911 Dêrika Çiyayê Mazî – 1972 Şam

## DADÊ

Buhara jiyîna min bê te payîz e, dadê!  
 Bo min dîyarê cenet bê te faiz e, dadê  
 Çêlkewa lingşikestî li pê hevalên xwe ma  
 Çêlkew ez bim û negrîm ma qey caiz e, dadê!

Dadê, pir kûr menal, te ceger li min ne hişt,  
 Dewsa ken û lorînê, ah û zarîna xwe hişt  
 Girîn tirsê dide min, xerab dîke sîng û pişt,  
 Êdin xwîn, kême dizên kanî û karêzê, dadê.

Her çend pot û pertalên ji ber xanûmanan man,  
 Gelek qenc girê bide li birînên xwe eman!  
 Bijîşkên me çêdikin ji bo derdê te derman,  
 Hinek ji wan Sekban in, hin jî Nafîz e dadê!

Daw ne ma me maçkir, paqij ne paqij be dest  
 Her kê ev halê me dît gotin "parsekî ye, geşt",  
 De wer ji ber vî derdî me be perîşan û mest,  
 Ne 'eqil ma, ne şîûr, ne jî hafize, dadê!

Xwarin, vexwarin tune, hebe jî me sond xwarî,  
 Parîyek bi hêsanî di qirika me narî,  
 Dîtina te miyeser meke xudayê barî,  
 Gav û demên me hemî, rojî ... pehrîz e, dadê!

Ji ber kêmaniyên xwe, li cem te şermisar in  
 Tenê tu kûr menal e, em ji te hêvîdar in,  
 Ji çavên me yên melûl hêstirên xwîn dibarin,  
 Jana zirav tov meke, eman! Pakîze dadê

### DI ŞOREZAREKEDA

Ez û hevaleyê xwe li ser rêkê da dimeşîn,  
 Em ji kêra hatine , kuda diçin dipirsin,  
 Ji halê xwe dizanim em rêwînin qedîm in.  
 Çiqas zeman dibore, xwe bê mal dibînin,  
 Sol di lingê me neman, peritîne cilê me,  
 Neynukên me dirêj in, bûne gulî porê me,  
 Tenê tiştê bi mera ku wekî berê mane ,  
 Keşkulê û gopalên di me, ewan bi mera wefa ne,  
 Histiriyên çavbeloq carna diket lingê me,  
 Êşa di van mîratan davêt ta ser dilê me,  
 Gava dibû zivistan diricifî canê tazî,  
 Ku havînan germ dihat bêfêde bike gazî,  
 Hêdî -Hêdî canê me qeşm û qetîş derdixe,  
 Ber afatan hîn dibin, bivê nevé xwe bi xwe,  
 Bi vî halî em diçin bi aqilê xwe bi şûr,  
 Ev rêya me bê dawî, pêva diçû dûr bi dûr ,  
 Rojek dîsan ji rojan qet hal di me ne bû,  
 Ne gund û ne gundîyek, ew cîh pêda tenha bû,  
 Çima şunda hinek deng hate ji nagihanî,  
 Lê bala xwe didimê ew deng pir kûr dinalî,  
 Min dil kir ku bibêjim: Mêze bike bê kî ye hevalo,  
 Meger ew jî bihîst, ku gotê :  
 - Ey delalo\_ ev çi deng e, dinale, gelo li vî cihê ha?  
 Nebe ew jî weke me keraşperê ber bi ba,  
 Wusan derket' texmîna hevalo jê niktedan  
 Bextreşekî kurdmanc bû, dikir ax û ox û aman,  
 Min jê ra got: -Ey bira te çi hal û hewal e?  
 Çima wusan li erdê veketî û dinale?  
 Wî jî li min veşand û got : "Derdê min giran e,  
 Çîroka min dirêje, bêt nivîsîn roman e ,  
 Ez ji kurdên serhedê, Milazgêr de gundê min,  
 Ez derketî heft sal e, bi hiş û bi dilê min,  
 Zimanê me bû sebeb, bû telûke ji bo me,

Merovên çavsor hatin, jêra digotin rom e,  
 Zimanê me î delal "yasax" kirin bi zorî,  
 Zimanê xwe î di xwar bo me kirin mecbûrî,  
 Edîn curmek mezin bû bi kurdmancî xeberdan,  
 Guhnedanî hedê kê, heps û sungî û zindan,  
 Edîn wusan ne dibû, me çendekan xwe kar kir,  
 Li hemberê dijmin, me hespê xwe pir xar kir,  
 Lê felekê bi me ra ne bir serî, em qela man  
 Weke nokên li kevir, em li deran bê kes man,  
 Dê û bavê min hemî bi tevayî wunda ne".

Hevalê minî ewil xwe avête nav-

- Gelo tu qet nizanî li kîjan alî ma ne ?  
 - Lo birao, zinaro, çima tu min nas nakî,  
 Ez Ferzendê bira me, em in ji dê û bavekî!  
 Herdu bira himbêz bûn, bi kul û girî û keser,  
 Erd û ezman hejîyan, agir kete dar û ber!

### REŞBELEK

**-Ji xortên Cezîrê re –**

Gerçî ez dûrî we me, îro, erê..  
 Lê bi dil ez ba we me, mîna berê.  
 Hûn dizanin ez ji bo çî dûr ketim,  
 Herçî zana dizane ku dabû cegerê.  
 Ez hevalê we me, ger dûrî we bim,  
 Para min bêtir dibe ji kederê.  
 Yek roja ku min bi wer derbas dikir,  
 Ne dianî bîra min salê berê.  
 Yek nêrîna Mêrdîn û Burca belek,  
 Bi Xwedê nadim bi (eswed hecer)ê.  
 Neynûka yekî ji we na guhêrim,  
 Bi hezar (Zêd) û bi hezar (Ûmer)ê  
 Ez glî û gazinan ji kê bikim?  
 Nijdevanê me bûbûn swarê kerê.  
 Lê bizanin rojeke min jî heye,  
 Qelema niştir ji kalan ê derê .  
 Hingî hîsab û kîtab tête kirin,  
 Ji cewrên wê dêlika derbederê.

18/3/1943

**GULA SOR**

Gula sor ;  
 Hilbû jor ;  
 Bîn da dor,  
 Gula sor ...  
 Gula sor  
 Li paş çayê Qaf şîn bû,  
 Alem jê ra evîn bû,  
 Gula geş,  
 Bi me xweş,  
 Da me heş,  
 Em bi bîna wê sermest,  
 Em pê şabin serbest.  
 Nazenîn ...  
 Xemrevîn ,  
 Xemilîn,  
 Pê zemîn,  
 Guleke bê kelemê,  
 Di nav baxê Îrem e.  
 Gula sor,  
 Em li dor,  
 Bicivin,  
 Bîn bikin  
 Dor bi dor.

Şam 1943

### **KARWANÊ ME**

Em hîç ne westiyan û nawestin  
 Li ser vê riya dûr  
 Ser vê riya dijwar  
 Em diçin û emê biçin  
 Ber bi armanca xwe  
 \* \* \*

Ser deryayê bi xwîn  
 Ji çiyayên dar û devî  
 Deştên bi kelem û histirî  
 Newalên teng û tarî  
 Em derbas bûn  
 \* \* \*

Li bin baran

Li ser berfan  
 Ba û bager  
 Li şikeftan  
 Di bin dilopan  
 Bi lingê xwas  
 Bi can tazî  
 Karwanê me diçe  
 Ber bi armanca xwe  
 \* \* \*

Bi koviyan re pence pence  
 Bi dêwan re rû bi rû  
 Me ceng kir  
 Wan em kuştin  
 Me ew kuştin  
 Em ne tirsiyan  
 Ne bezîyan  
 Karwanê me diçe  
 Ber bi armanca xwe  
 \* \* \*

Em gehiştin çiyayê qaf  
 Nizîk bû, nizîk bû armanc  
 Xuya kir, xuya kir behiştê Kurmanc  
 Ah...  
 Ew ne xweş giyan  
 Ew kulîlkên ji karwan  
 Bi şûn da man  
 Ew rebenên bêçar  
 Man, ji beheştê me bê par

Şam 28/9/1959

## ZÎNDANA MEZÊ

### Li zîndanê şoreşa me

Bi dengê me zîndana we hejand  
 Bi qîrînek me kela we helweşand  
 Hûnê derbê me bibînin celadno!  
 Ji paş hesin me heybeta we şikand  
 \* \* \*

Di nav postê şêran de wek rovîyan  
 Zar û zêçê me bizdand van kovîyan

Digotin qey ji meydana mêr kişîyan  
Destê bi zincîr maske ji rûyê we kişan

\* \* \*

Me bala xwe, bi wer gelek dirêj kir  
Lê roj bi roj we dilê xwe qirêj kir  
Çend dilopên xezebê ser we rêj kir  
Geşta kerameta we, pê xesiqand

\* \* \*

Me serma dî, dilê me hîç sar ne bû  
Di bin barê bermîla, serxwar ne bû  
Îşkenceya bi şev û roj, kor ne bû  
Bi vîna xwe, dev û lêvê xwe çîrand

\* \* \*

Bijî yekîtiya şêrê qefesan  
Hevalê me perwaz dîkin li ezman  
Em in ronahîya tarîya cîhan  
Lênînê me tovê aşîtiyê çand .

**Zîdana Mezê 7/11/1960**



### JI MIN RE BÊJE HÊSÎRO (LAWIJ)

“Ji min re bêje, hêsîro, yê te girêda kî bû?”

Hêsîr, “Efendiyê min bû”, got.

“Min got qey ezê bi maldarî û desthilatîyê  
li ser rûyê cîhanê di ser herkesî re bim  
û pereyên keyxan di xezîna oda xwe de min civand.  
Gava xewa min hat, ez li ser nivînê  
ku ji efendiyê min re hatiye amadekirin dirêj bûm;  
gava şiyar bûm min xwe li oda xwe ya xezînê hefsî dît”

“Ji min re bêje hêsîro, kê vê zincîra ku nayê şikandin kuta?”

Hêsîr, “Vê zincîra min bi destê xwe kuta” got,

“hêza min ya têk naçe serbestiyek hêsan da min,  
min got qey kare alemê hêsîr bigire.  
Loma bi agirên niwaze û bi lêdanên bêînsaf û hişk  
li ser vê zincîrê bi şev û roj xebitîm.  
Gava xelek qediyar û nema dihat şikandin  
û dawîn kar xelas bû,  
min xwe pê ve hişk girêdayî dît.

**STÊRK**

Çirûsandina hemû stêrkan his dikim di nava xwe de.  
 Mîna lehiyekê tije dike jiyana min a dunyayî.  
 Di laşê min de kulîlkan vedike.  
 Di dilê min de hemû ciwaniya erd û avê vêdikeve  
 Mîna bixurekî.  
 Ê bi deng dike mîna bilûrekê ramanên min  
 pêjna hemû tiştan.

**WENDANEBÛN**

Zanim, vê jiyana,  
 ji stewardina hezkirinê bêpar,  
 bi temamî wenda nebû.  
 Zanim, bi hilatîna rojê re çilmisandina kulîlkan,  
 çemê li çolê zuha bûn  
 bi temamî wenda nebûn.  
 Zanim, çi tiştê bi şûnde ma,  
 di vê jiyana ku hêdî hêdî dimeşe, b  
 i temamî wenda nebûn.  
 Zanim, hîna pêk nehat xeyalên min,  
 stranên min nehat gotin,  
 lê tev li ser tîlên tembura te digerin,  
 bi temamî wenda nebûn.





### ROJA PAYİZÊ

Xwedêyo: niha dema wê ye. Havîn gelek dijwar bû.  
 Siya xwe bera ser katjimêra rojê bide,  
 û bilefîne bayê zeviyan.

Fermana sitewandinê bide mêweyên dawîn;  
 Du rojên din yê başûrî bide wan,  
 wan vexwendî amadebûnê bike  
 û bide dewamkirin tama şeraba giran ya dawîn.

Yê niha mala wî tunebe, wê avaneke piştî niha.  
 Yê niha tenê bin, wê hê gelekî tenê bimînin,  
 wê binêrin, bixwînin, nameyên dirêj binivîsin û  
 li papûrê geh berjêr geh berjor bi diltepîn  
 wê bixerbin, gava ber bê dikevin pel.

### LAWIJ

Ax çawa her tişt ji zûde ji holê hatiye rakirin  
 û ji zûde tune bûye.  
 Zen dikim ku roniya stêra ku li rûyê min dibiriqîne  
 ji hezar salan de  
 mir û mirîbû.

Min xewna keştiyek ku derbas dibû dît  
 û min hinek deng bihîst bi endîşe.  
 Seetek li zengil dixist min bihîst ji malek dûr...  
 Belê li kîjan malê?...

Ez bi hisreta aramkirina diltirsiya xwe me  
 û bi hisreta sekna bin perê ezman.  
 Bêriya kirina dia dikim...  
 Ê ji stêran yek  
 belkî hîna dijî.  
 Zen dikim ezê zanibim  
 Kîjanê bi tena xwe  
 xwe ragirt,  
 û kîjan disekine  
 mîna bajarekî sipî li dawîn  
 gurzê roniyê li ezmanan dibiriqîne.

E N E D O L

**REFIK DURBAŞ**

10 Sibat 1944 Pasînler-Erzerom

**QELAÇO**

Çiyayên hêviyê wêran, ava wê şikestî  
 Ku bi janê hatibe dan baca evînê  
 Di vê şeva mahkûm qelaçoya biharê de  
 Di dilê te de şitlên xwînê yên can ba  
 Ê xeynî hilberandina sewdayên hefsî  
 Ji bo tebata tenêtîyê te çi kir.

www.drsivakurd.org



**RÊNAS JÎYAN**

Di 1974'an de li Qoser a Mêrdînê

## JANYA

xwedê û wext xelet hatiye xitimkirin

naqosên dêran kerr...

minare kin...

doktrînên dekolte lixwekirî evdal... sarincên ku ji baranên

derengmayî, derengbarî hatibû damezirandin, bi derbeke neşterê

ya dirinde, şolî bûne... barûyên ji evînên nukleerî, di serdabên ku

ji krîstalên rokoko hatibûn kemilandin qîtik-qîtikî bûne...

ji xewnên bêxwedî xeyîdîme, pekiyame û hatime janya,

ji nalînên min re vokalîstiyê bike

*(ji qevmê pezkoviyayî re xew heram e)*

peykerekî antîk, derîzî û mîtolojîk im, nêma ji min dihere... li

ezmanê hundirê min, qaqlîbaz firrînên kamîkazeyî li dar dixin...

kovanên genimî li ber aşên êşan, kêliyekê jî aş nebin, aj nabin,

hûr dibin û hey hûr dibin... ji alfabêtan tîpek kêma

dibe gava ku dimirim... weeeeey waweylê janya kezeba min

dike di devê min re derkeve ji qehra!...

çiqas êvarên şînboz bihurîn û çûn ji keştiya xeyalan

çirûskeke serzer peya nebû, li peravên hestên min

ên hestî û çermmayî... pêxemberekî sexte di nav kirasê xwe yê

gewrîboz de bi derewan be jî dest dirêjî min nekir,

min venexwend cemaeta xwe... ferîşteyeke fahîşe sîng venekir...


maran jî ji kom û refên xwe ez aferoz dikirim...  
 bi qasî yezdanekî bêqûl tenê dimam... mezhebên şêx û mirîdên  
 wê ez min diafirandin di çarmixan de, min her çavê xwe  
 li destmalka bixwîn a destê weronîkayê digerland...  
 bi îskeîskeke zengarî mîna guran tim dizûrriyam,  
 hosteyê dînîtiyê mam.  
 goştê hov ji te ricifeke ruhê divê,  
 nêrîneke şêtiya şûran divê,  
 ez heta qirrikê niştecihê tîrbê...  
 hilnayê janya  
 hilnayê porrkurrê  
 di tirban de hilnayê ha!!!

a ku li eniya te nivîsî ne qeder e, soneya serpêhatiya temenê  
 min e... dengê min diêşe, weha bi sewteke berz û perritî  
 min dilê xwe têr rehet nekir li qîrrîniya navê te...  
 çirrek e şîr didoşim ji ewrên spîboz ji bo çivîkên çavên te...  
 xwezî janya min îmana te ya rewnaq bihebenda...  
 xwezî berxê ji xeynî te pê ve bi tu fikaran min tahma hişê xwe xera  
 nekira...

bêxem min tu li suqulîka xwe bikira û sûk bi sûk bigerenda...  
 di şaneşînên nêrgiz û nesrînan de  
 min devê te bikira zîndana zîmanê xwe  
 lê xwedê û wext xelet hatiye xetimkirin  
 ez hêmayeke heyama hewaran,  
 di herban de nîşangeha rîman  
 serî gog, çav xar, zik çirrîyayî

fermo janya êdî tu dikarî xwe bikujî!...

HAÎTÎ

**RENE DEPESTRE**

29 Tebax 1926 Jacmel

**CEWHERÊ REŞ**

Gava royê zuha kir xwêdana xwecîyan  
 Û azwerîya zêr ya ji nişka de li bazarê  
 Gava zuha kir dilopa xwîna xwecî ya dawî  
 Gava di kanan de tevlî nebûnan bû xwecîyê dawîn  
 Dema serlêdana çemê masûlkê yê Efrîqa hat  
 Diviya nobeta belengazîyê bihata guhertin êdî

Êrîş destpêkir  
 Bi ser wê koma goşt ya dewlemend û bêdawî  
 Rev destpêkir bi helkihelk ji çirûska nîvroja reşik

Û bi dengê tevirkan re bû gurmîna erdê  
 Li cewherê reş dihat xistin  
 Dest bi xebatê kirin kîmyageran di vî madenî de  
 Ji bo amêjenekî nû û hêja biafirînin

Jinan beroşên ji Seneglîyan çêbûyî xwestin  
 Çaydankên ji Antîlîyan çêbûyî xwestin  
 Naqosên ji xwîna reş darêjbûyî xeyal kirin keşan  
 Û gava di sersalê de dîyarî belav kir Kalê Noel  
 Hizirî ku leşkerên zrêç yên reş bikişîne tawiga xwe  
 Serbazên gernas xwestin şûrên xwe bi vî madenî bisûn

Bi lêdanên tevirkan hejîya erd  
 Xwe bera kûrahîyên gelê min dan  
 Xwe bera mexela masûlka reşik dan  
 Bi sedsalan ji çendîn kûrahîyan  
 Taqeta nîjada reşik ya şaşmî hat derxistin

Ey cewher - gelê min  
 Reha xûsika mirov ya bêdawî  
 Çendîn keleşên derya tê rakirin xencerên xwe  
 Di tarîyên xalî yên laşê te  
 Û di rêyên te yên ronak çendîn talanker  
 Şax û dirî birîn û pêşde çûn  
 Golên firmêskan afirandin li dû hev

Hey gelê ji serî heta pîyan hatiye talankirin  
 Ji bo têr bikin bazarên cîhanê yên mezin  
 Mîna axa bi halet mirovên hatine serûbinkirin  
 Ji şeva veşartî ya laşê xwe re veşêrin arê xwe  
 Bira kesek topan û drafên ji zêr darêj neke êdî  
 Bi madenê ji kerba lehîya we ya reş hatîye afirandin

## AZERBAIJAN



RESUL RIZA

Rzayev Resul İbrahim oğlu 19 Gulan 1910 Goyçay-1 Nîsan 1981 Baku

### JI DESTÊ MIN BÊ

Ez dixwazim ku  
Ewr bigirîn  
Zarok negirîn  
Tu ji wan bêkesî  
Sêwîfî nebîne

Ez dixwazim ku  
Bipeyive her kulîlk  
Bi zimanê xwe  
Bê birîn  
Dengê selehan

Ez dixwazim ku  
Li sermê, li tarîyê  
Bên girtin derî  
Çav neyên girtin  
Neyên girtin gotin

Ez dixwazim ku  
Vemirin şewat  
Hêvî venemirin  
Bistewe her fêkî  
Di dema xwe de  
Li dila nekevin  
Gotinên tehl

Ez dixwazim ku



Xwar bibin şax  
 Ji berketinê;  
 Kurê mirov  
 Xwar neke serê xwe  
 Ji fedîkarî an ji qelsî

Ez dixwazim ku  
 Ji dêvla hêstirên çavan  
 Kanî biherikin  
 Paqij zela  
 Li rûyê erdê  
 Mîna kanîyan  
 Neherike hêstirên çavan  
 Li tu dera rûyê erdê

Ez dixwazim ku  
 Tenê stêr  
 Bimînin bê razan  
 Bila mirov razên û biramin  
 Bi taqetek teze  
 Ji bo bi hêvî  
 Dest bi rojê bikin

Ez dixwazim ku  
 Her tişt xwar bibe  
 Li ber mirov  
 Mirov ji mirov re  
 Dîl nebe

Ez dixwazim ku  
 Kamiranî, şadimanî  
 Bira zêde be  
 Ji dil heta dil  
 Ji welat heta welat  
 Bira rêka vekirî hebe

## FRANSA

**ROBERT DESNOS**

04 Tîrmeh 1900 Parîs - 08 Pûşer 1945 Terezîn

**KULÎLKÊN HEYVA GULANÊ**

Kulîlkên heyva Gulanê  
 Di nava sê rojan de wê vebe  
 Bi çavên dikene Marie  
 Wê ji dildarê xwe re vebe.

Bi destên hişk wê mist bide  
 Mêrê çavşîn  
 Wê Marie him bibe jina wî  
 Him kolê wî mêrî.

Piştî Gulanê Pûşper e  
 Evîn, pişt re nefret tê  
 Dema çinîna gîha  
 Wê mêr zincîrê bişikîne

Wê gustîlê bişikîne bavêje  
 -keştîno, bigerin li deryayê-  
 Sonda xwe, xeyalên xwe...  
 -em li kevîşenê radizên!-

## FILISTÎN



SAMIH EL-QASIM

11 Gulan 1939 Zarqa Urdun- 19 Tebax 1014 Rameh Îsraîl

## JI ROJANÊ

Min li gerdûnê gazî kir serpêhatîya xwe ya bi jan  
 Wê tîrêja jikestî di paca min ya rûxîyayî  
 Wê kulîlka eciqandî ku ji mirinê re delîl  
 Wê şewata şevê ku di porê te de vêket

Min dûrika me got ji şevên dêyan re  
 Di wî koxên kelpîçan ku kamiranî lê binerd bû  
 Fîncanek sipî ku nevexwarî hatiye hîştin  
 Min gazî kir kuça lê gîha mezin bûbû  
 Ji her şeva xalî ku deng li bîranîna dîkir

Hezkirinek bû ku ji nişka de bû girêk  
 Ya berî da bîra min, ji rûyê te yê ji bîra min çûbû  
 Di her bîranînê de janek dervî raveya ne  
 Tu vedigere di şevê di hemû dengên lîngan

Çi delal bû bi hevrebûna me, bêyî ku ji hev biqetin  
 Lê ji nişka de min wenda kir çavên te  
 Li wê erda ji berî sedsalan dayika me bû  
 Min gazî kir li hemû gerdûnê ji bo veke destên min

## DI SEDSALA BÎSTAN

Hînî nefret nekirinê bûbûm  
 Seranserê sedsalan  
 Min bi zor ji rê derxistin  
 Min tîrek bera mirûzê marê girsepîr da  
 Şûrê ji agir min li mirûzê yezdanê ejderha xist  
 Bi zor wan ez kirim Îlyas Pêxember  
 Di sedsala bîstan

Hînî bilêvnekirinê bûbûm  
 Ramanên rêşaş  
 Seranaserê sedsalan  
 Îro qamçîyan dişelpînim îlahan  
 Wan îlahna ku di dilê min de bûn, pîrozwer bûn  
 Bi du pula firotin gelê min  
 Wan îlahan  
 Di sedsala bîstan

Hînî girtîhîştinê bûbûm  
 Derîyê xwe li mêvana  
 Seranserê sedsalan  
 Lê rojekê min çavê xwe vekir  
 Û min dît ku  
 Çî min hey e, çî min tune ye malê mîratê ye  
 Û min dît ku jina min dardakirine  
 Û di piştî zaroka min  
 Ciyê birînan  
 Ha wanî wanî  
 Ne mêvan bûn ew, têgehîştim dijmin bûn ew  
 Mayin, kêr dan hev ji derabzûna xwe min  
 Dûvre min sond xwar, bi navê hemû birînen xwe  
 Min got wê nema pêga xwe bavêjin ji derabzûna min  
 Mêvanekî bi tenê jî  
 Di sedsala bîstan

Ji hozanekî pê ve ne tişteki din bûm  
 Seranserê sedsalan  
 Yê ji îlah hêvî dikir  
 Lê niha ez  
 Volkanek im  
 Di sedsala bîstan  
 Volkanekî diteqe!



### **SULEYMAN DANIŞMAN**

1948 Çakan, Dep, Xarpêt

Wênekêş, peykersaz, nivîskar, helbestvan, sîyasetmedarê Kurd

#### **JI NÛ VA DENGÊ LINGAN**

Gava Tê Dizîn Berketa Rojê

1

Gava tê dizîn berketa rojê

Nava ebrû û çavan bêdeng

Sûcekî dayika Besê tunebû

Sûcekî gundîyan tunebû

Dema palîyê destpêkiribû

Gava seridîbûn simbil

Li asoyê bi rojê re xuyabûn

Li rêzegiran birên tankan

Te digo qey mîna ejderhayên di çîrokan de

Bi heft serîyan ji bo heft terhên can meşîyan

Gava pêtî vedirşîyan li zevîyan

Ji alîkî ve roj

Tank ji çarhawîr daketin

Belavbûn ji giran berbe bestan

Sûcekî demê tunebû

Yanî têkilîya rojê bi tankan tunebû

Ji alîkî talan bû


Ji alîkî şewat bû

Derewa çerokan tunebû

Sûcekî mekîna tunebû

Dilê dagîrkeran tunebû  
 Mîna gilokên ji pêtîyan  
 Bi salan dan dûv me  
 Ji xwînê têrnebûn tucarî  
 Ji mirinê têrnebûn tucarî

Di çetelê de nîne ciyê kederan  
 Sernermîya me peristgeha kêmanîyê  
 Herroj yên nuh tên şewitandin  
 Kedên nuh tên dizîn  
 Ji Hamûrabî û virde  
 Ne dayika Hawa van rastîyana dît  
 Ne jî xwedawend Heppa tiştêk got  
 Destê me de qevdek xem  
 Ajotine berketa rojê  
 Ji berî Kardokan û virde  
 Em diçînin û dinerin ji giran berbe bestan  
 Sûcekî rojan nebû hîna  
 Ji derên şewitî naqete çavên me  
 Li nexşeyî ciyê aşîyê hatîye dizîn  
 Hayê tukesê jê nîn e  
 Yan jî qîmetek xeberê tuneye



### HELEBÇE

Çardehê mehê bû  
 Bayê pênuşa min firand li Goyje yê  
 Dema ku min ew dît û dest bi nivîsê kir  
 Pêl bi pêl firîyan peyvên min

Panzdehê mehê bû  
 Sîrwan pênuşa min girt û çû  
 Dema ku min ew girt û dest bi nivîsê kir  
 Bûn masî helbestên min

Şanzdehê mehê bû  
 Axx! şanzdehê mehê  
 Şarezûr pênuşa min girt  
 Dema ku li min vegerand  
 Min xwest binivîsînim  
 Tiliyên min wek Helebçe hişk û zuha bûn

### ÊVÎNA MEZINTİRÎN

Berfa li ser Cudiyê weha dibêje  
 Ejderha hat... Ejderha çû  
 General hat... General çû  
     Le tiştê her ma û  
 Tucar neçû qet naçe  
 Dar û kevirên Kurdistanê ma.  
 Bircên Amedê dibêjin:  
 Navên Siltan û Walîyan  
 Weke navên hinek kuvarkên bi jahr  
 û  
 Weke navên hinek gur û berazan  
 Hatin jibîrkin û di dîrokê de bûn xweli  
 Lê tiştên ku ji bîr neçûn û  
 Her man û bûn nan û bûn av û  
 Bûn kulîlkên malên me

### **BAJAR**

Qudis ji min re wisa got:  
 ‘Îro tenê di navbera du saetan de  
 di nav sînga bajarê min de  
 pênce çem xeniqandin’

Hîva şeva ezmanê Santîago ji min re wisa got:  
 ‘Îro tenê di nav saetek de  
 di nav serê bajarê min de  
 sed stêrkên min serjê kirin.’

Hespekî reş î bijsor ê Afrîkai ji min re wisa got:  
 ‘Îro tenê di nav nîv saetê de  
 li ser kevirê reş î piştî min  
 mêjiyê gelek mirovên min perçiqandin.’

Min jî got;  
 ‘Birano !  
 Tenê cudahiya navbera me ev e  
 Bajarê min wisa kuştin ku deqîqe jî pê nehisiya.’

### **HEJMARTIN**

eger karibî  
 guliyên vî baxî



yek bi yek bijmêrî  
 eger karibî  
 hemû masiyên gir û hûr  
 yên nav çemê pêşberî xwe bijmêrî  
 eger karibî  
 dema koçberiya teyran  
 yên ber bi jêr û ber bi jor ve  
 yên ber bi jor û ber bi jêr ve  
 yek bi yek bijmêrî  
 wê demê ez jî soz didim  
 heçî qurbanên  
 vê axa şîrîn ya kurdistan  
 yek bi yek bo te dijmêrim.

### EVÎN

min guhê xwe da dilê axê  
 ji min re qala evîna xwe û baranê kir  
 min guhê xwe da dilê avê  
 ji min re qala evîna xwe û kaniyê kir  
 min guhê xwe da dilê darê  
 ji min re qala evîna xwe û pelan kir  
 dû re min guhê xwe da dilê evîne  
 ji min re qala azadiyê kir

### JI BO 8`ê ADARÊ

baskê bazekî şikandin  
 asîman firînek wenda kir

çavê xezalekê kor kirin  
 awirek ji kîsê deştê çû

gulleyek ket qirika kewekê  
 çîya stranek wenda kir

kulîlkek bêhnek wenda kir  
 bilbil bêhnek wenda kir

lê dema ku jinek kuştin  
 evînek ji kîsê hemû dunyayê çû

**ŞÎRET**

gelek tişt hene  
zengar digrin û  
paşê jî dimrin  
weke tac û  
kopal û  
textê bin lingê padîşahan  
gelek tiştên din jî  
di dinyayê de hene  
narizin  
jibîr nabin û  
tu caran namirin  
weke şewqe û gopal û  
sola  
**Charlie Chaplin**



### YÊN BIRÎNDAR

Em xizan in

Ji zarokên me re pêsîrên zipîzuha

Ji gedê me re nanê tisî yê tisî

Tu av bêje hindik kinc jî nine

Belav bûne em li çar nîkarê welêt

Li nav çiyayên dûr li gelîyên sar

Ya me diparêze ji bahozê ji avîyê

Ya konîkek e yan holîkek teneke

Lê li tenîşt me

Di malên xwe yên germagerm de sipîsax

Hemnîjadên me birayên me

Ya dîtîne tê dîtîni di demajoyê de

Ji derdên kesên xemgîn bêhêvî re çare

Lê dem teng e, birîn kûr in

Li alîkî yên bi kinc, yên zik têr


Li alî din yên pêxwas, yên xwarîne pêde nakin

Du cîhanên hevraneborî ji hev cuda

Dem teng e, dest bi jandanê dîkin birîn

Ew yên bi gumana bi hev kelîyabûn jî  
Birçiyên dibên hewar  
Yên pêxwas di nava janê de

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)



### LI BIRA MIN TÊ

Li bîra min tê Sulêmanî, ku dar ul-milkê Baban bû,  
 Ne mehkumê Ecem , ne suxrekêşê Alî-Osman bû,  
 Li ber tabûrê esker rê nebû bo Meclîsa Paşa,  
 Sedaya muzîkê û neqer ta eywanê keyvan bû,  
 Çaxê meydana cirîdbazî li dora kanî Askan bû,  
 Bi zerba hemle Bexda teksîr kir, te hilda,  
 Sulêmanî zeman, rast tu divê bavkê Sulêman bû,  
 Ereb înkârî fesla we nakin, efselîn, emma  
 Selaheddîn ku dinya girt ji zumra kurdê Baban bû,  
 Qebra pir ji nûra Alî-Baban pir jî rehmet be,  
 Baranê kefi ehsana wan mîna ewrê nîşan bû,  
 Çaxê Ebdilla Paşa leşkerê walîyê Sinnê şûr kir,  
 Riza wî wextî emrê wî pênc û şeş tiftlê debistan bû.

### QEHBEJINEKE MAMÊ MIN

Qehbejineke mamê min î Dewletî Şîdadî heye,  
 Tahle ya rahber û bextê wî xwedê dadî heye,  
 Yek-du gundê wî bi daweta siltan heye,  
 Her yek bi qedera xiznê îrdayê wî heye,  
 Çi firoş û çî ziruf û çî zîa û çî aqar,  
 Ji hemû cinsî metay sed û heştad hê ne bes e!  
 Ev hemû genc û xezna wî heye , hela hê teres e,

Ne hewa cud û ne mêla kerem û ne dada wî heye,  
Ne jî aba wî heye û ne ecdada wî heye,  
Ger serî û rûyê wî yê mêran in, pê bawar meke,  
Batnî Cuhud e, zahrî zuhada wî heye,  
Rengê ker, dengê beqer, heyata seg, bi xwe çeqel



### KIZÎNA DêRDÊ COTKAR

Feqîr û hejar im, gemar û xwelî,  
 Ne têr û birçî, cîyê min deşt û çol,  
 Xulamê axa bûm heft sal tamam,  
 Zevî, deşt û dol jêra dikola,  
 Bi heqê mehê yan bi kirêkarî dimam  
 Carnan bê peran û parî nan.  
 Li zivistanê bi deste cilê dirî,  
 Bi cote pêlav-çarixê pan  
 Tifing li destê min bû,  
 Bêzar bûm, şev li çolan  
 Carna ez pawan bûm li Dehol,  
 Zivistanê cotkar bûm, havînê tûtinvan  
 Li ber berf û baranê bo garana axan  
 Dar min tanîn bi mal û piştan.  
 Ez dû wî diketim, kuda ew diçû,  
 Bi kişîn û fişîna eba pir qul  
 Xwêdanê li ser min dikire xule-xul,  
 Nav li min kir bû "Kabrayê Kirmol".

Neçar bûm, revîyam cem şêx,  
Min dest û pê wî maç dikir,  
Bûme xizmetkar, bûme devrêş,  
Pirça serê min mabû li şûna kakol,  
Çend bavê min kuştin bo bênder,  
Çend birê min kuştin bo parî nan  
Bo wî şewitîm çend caran  
Bûme merivekî heramzade û zor,  
Bi rojan li cerdê bûm li çîyan,  
Êşk min digirt li şûna parxan,  
Pêpes bûm li bin piyê şêx û axan  
Ez berade bûm, mala min kor,  
Li Kurdistanê rez û tirî bû,  
Ji min standin,  
Nadine min yek pol .



## BULXARISTAN



VESELIN ANDREEV

16 Sibat 1918 Pirdop-11 Sibat 1991

## RAMAN


Hesta evînê dişidîne dilê min yê li ber teqînê  
 Mîna dînamîtê, ya kevirê sar vêdixe  
 Çawa jî em bi hesreta afirandinê, hilberînê  
 Maçîkirina enîya zarokekî nûbar in

Ma qey çêdibe? Gund tên xilîxerakirin  
 Zaro tên kuştin. Ê hawîrdor di bêdengîya mirinê de  
 Em vezeliyane, disekinin di kozikê de  
 Ji bo bipelêxin, bikujin û xilas bikin

Em dibînin, dişewite û dibe xwelî ciwanîya me  
 Em seh dikin wê nefreta, wê dipijîne  
 Lê wekî din, çawa em`ê karibin bisitirînin,  
 Evçend tiştên em jê hez dikin û pîroz dizanin?

(Li Çiyayên Balkan, Hezîran 1944)

## FRANSA



VICTOR HUGO

26 Sibat 1802 Besançon-22 Gulan 1885 Paris

**JI BO MIROV BIGIRÎ MA DIVÊ JI ÇAVAN HÊSIR BIBARIN?**

Ji bo meriv bigirî, ma divê ji çavan hêstir bibarin?  
 Ku lêv bikenin, ma mirov nikare bigirî?  
 Ji bo meriv hezbike, ma divê meriv li ya xweşik binêre?  
 Di canekî kirêt de ruhekî bedew, ma nikare dil girêbide?  
 Bêrîkirin; ma ji yê tê bêrîkirin dûr man e?  
 Ku yê tê bêrîkirin nêz be, ma qey êş nayê hiskirin?  
 Dizekî; ma qey dizîya pere û mal e?  
 Dizîya kamiranîyê, ma qey nabe dizî?  
 Ji bo biçelmise, ma divê gul ji şaxê bê jêkirin?  
 Gava bişkojek pembe be, ma gul di şaxa xwe de naçelmise?  
 Ji bo kuştinê, ma divê çek yan xencer hebe?  
 Ma por nabe destmal, çav nabe çek, ken nabe gulleh?

## GURCÎSTAN-RÛSYA



## VLADIMIR VLADIMIROVIÇ MAYAKOVSKY

19 Tirmeh 1893 Baxdadi, Kutais, Gurcîstan-14 Nîsan 1930 Moskowa

## EWREKÎ BI DERPÎ

Bidin bala xwe  
 Xeyalek di hişê we yê sewsî de,  
 Mîna xulamekî qelew vekeve li ser textekî gemarî,  
 Bi dilê xwe yê ji qîtîtkê xwînê, ezê dîsa pê qerfan bikim.  
 Bi pozbilindiyek çavsor, ezê dilhişk û dilşikên bim.

Di nava min de qet dilovaniya kalekî nîn e,  
 Di ruhê min de qet pirça boz tune ye!  
 Bi qîrîn û bişîrîna xwe cîhanê dilerizînim,  
 Ez di te dibihurim, delalo,  
 Di temenê bîst û du salî de.

Can nazikno!  
 Hûn yên bi kemanê evînê dijîn.  
 Yên li ber gurmîna daholan lotikan davêjin.  
 Lê ma hûn karin xwe biguherin, nava xwe vekin, wek min  
 Ê tenê mîna ji du lêvan pêk werin?

Wer û fêr bibin  
 Tu, endama komela ferîştayên brokratên xwedî kêf!  
 Pêka xwe ji oda bi qedîfan hatiye xemilandin bavê der  
 Ê tu, kî kare lêvên te bigire  
 Mîna aşpêjekî pelên pirtûka saloxdana xwarinê bizivîrîne.

Ger tu bixwazî  
 Ezê mîna hovekî li ser goştê xav har bibim  
 An bi lêdana tava rojê re bêm guhertin, Ger tu bixwazî  
 Ez karim bibim kubarekî bêhempa,  
 Ne wek mirov lê mîna ewrekî bi derpî.

Bi kulîlka Niceyê baweriya min nîn e!  
 Lê dîsa jî ezê pesnê te bilind bidim,  
 Mêr, mîna çarşefên nexweşxaneyan diqermişin,  
 Ê jin, mîna peyvên pêşiyên ku ne di cîh de dieciqin.

### GOHDAR BIKE!

Gohdar bike,  
 Gava stêr diçirisin  
 Tê wateya ku pêwîstiya yekî jê heye.  
 Tê wateya ku yek dixwaze bibe ji wan,  
 Yek jî gava van rohnîyên niwaze dibîne  
 dixwaze tîfkê.

Ê bi hêrs,  
 Di nava babîsoka toza nîvro de,  
 Ew bi Yezdan ve teqîya,  
 Ji bo tirsê ji Yezdên belkî dereng mabû.

Di nava rondikan de,  
 Maçî destê Yezdanê xurt kir  
 Ê ji bo wî bide bawerkirin lava kir  
 Misoger bû diviya bibûya stêrek.  
 Ew sond dixwe  
 Teqez ew natebite  
 Di vî ezabê nestêrbûn de.


Pişt re,  
 Ew digeriya, bi xemgînî  
 Lê bi rûyekî aram.

Ê ji bo her kesî, wî got:  
 `Niha,  
 Ew tamam e.

Tu nema zêdetir ditirse,  
Ne wanî?

Gohdar bike,  
Gava stêr diçirsin,  
Tê wateya ku pêwîstiya yekî jê heye.  
Tê wateya ev pêwîst e  
Di her êvarê de  
Bi kêmanî divê stêrek bilind bibe  
Li jora rûyê cîhanê

## KURDISTAN



WEFAYÎ – MÎRZA EBDULREHÎM

1838 Mahabad-1902 Çola Erebîstan

## JI DÎWANÊ

Xûdanê ser rû ra berda ji ber pêkenîna te,  
 Şebnem gul jê barî, roj girt perwanê te,  
 Tu bi xwedê, zilfê xwe bide alîkî, têr gulumên te maç kim,  
 Rê bide bilbil, bira negirî ji ber baxê perjîna te,  
 Zilfê te xetakar in bo çavê te, birû daxistine ,  
 Were em hev maç kin, bi destan hev himêz kin,  
 Çavbazîyê meke ji wê badeya elestê,  
 Destê min bigre, rabe, tu ji dîn eynatê  
 Ketime nav zilfê te, de tu bigre destê min,  
 Kafir bûm bê îman, heta bême ser dînê te.  
 Şev heta seher wek gul dil pir xûnavim,  
 Ya xwedê, şemal bike bin araqçîna te ,  
 Qurban! ew reng min rengand rengê te ,  
 Zilfê te roj veşart, birûyê te xwê nadin,  
 Wan roj li min kirne şev bi meh û perwînê te,  
 Rehma te pê nehat, şîrîn xudagir bî,  
 Bo çi her Wefayî, bo dîn bûyî, bi çîya ketî?  
 Sed Xosrov û Ferhad bo şîrîn lêvên te?

Serabstan xerabstan e îro,  
 Behara Eyşê her zivistan e îro ,  
 Bi zerîna payzê rengê min dîyar e,

Bi xalî rût e, tabistan e îro ,  
Jîyîna emrê min bê te ziyan e,  
Gulîstan bûm, xaristan e îro,  
Temamî zîndegana te bê wucud e,  
Serapa wek qumarîstan e îro,  
Tava axa germîna te bi min çi?  
Bo min her weku çîyastan e îro ,  
Gula min bê nezîra tu temaşa  
Welat pakî baxistan e îro,  
Xedenga te karê hejmara bi miqat  
Hemû mêşe û çinaristan e îro  
Wefa mezlumê beyrûte bi rûtî  
Hetîwê şêherê Kurdistan e îro.

## BRÎTANYA

**WILLIAM BLAKE**

28 Mijdar 1757 London-12 Tebax 1827 London

**AX BERBIRO**

Ax berbiro, westiyaya zemên,  
 Tu pêgên rojê dişopîne;  
 Piştî gera li warê zêrînî şêrîn  
 Rêwî gera xwe diqedîne;

Gava ciwan bi azweriyek kûr bêrî dike,  
 Û bakîra çilmisî di kefenê wek berfê de,  
 Ji gorên xwe rabin, û daxwaz bikin  
 Cîhê ku Berbiroya min dixweze herê!

www.arsivakurd.org



## BRÎTANYA



WILLIAM SHAKESPEARE

26 Nîsan 1564 Stratford-upon-Avon – 26 Nîsan 1616

**DITIRSIN**

Ji bo ku pirañya mirovan ji wendakirinê ditirsin, ditirsin hezbikin.

Ditirsin bê n hezkirin, ji bo ku xwe bi kêr hezkirinê nabînin.

Ji ramandinê ditirsin, ji bo ku wê berpîrsiyariyê bîne.

Ji peyvandinê ditirsin, ji bo ku ji rexnegirtinê ditirsin.

Ji ravekirina hestên xwe ditirsin, ji bo ku ditirsin bê n redkirin.


Ji pîrbûnê ditirsin, ji bo ku rûmeta ciwanîya xwe nizanin.

Ji jibîrkirinê ditirsin, ji bo ku tişteki baş nedan dunyayê.

Û ji mirinê ditirsin, ji bo ku birastî nizanin bijîn.

www.arsivokurd.org

## LUBNANA



XELÎL CIBRAN

06 Rêbendan 1883 Lubnan – 10 Nîsan 1931 New York (DYA)

## STRANA MIROV

Bi destpêka deman re ez hatim  
 Hîna li ser rûkê vê cîhana kevnar im  
 Bi dawîhatina deman re dîsa ez`ê herim  
 Loma naqedin êş û jan di dilê min de

Yê di bêdawîya ezman digerîya ez bûm  
 Firîyam ez di ser beşê xeyalan re  
 Min dît her alîyê fezaya pîrozwer  
 Lê dîsa ez dîl xistim qanûnan

Min li doktrîna Konfuçyûs gohdar kir  
 Di Brahma de vebûn çavên zanînê  
 Min Bûda dît di bin dara pisporîyê  
 Lê dêsa ez têkbirim hestan

Ez bûn şahid ji bilindîya Babîlon ya nayê şîrovekirin  
 Min Ramses dît yê nav û deng da demek dûdirêj  
 Bi artêşan re xwanê bû Roma şerok  
 Lê dîsa ez di xeman de fetisandim seretayan

Ma bê min çi kişand di azînên tadeyan de  
 Destê min li zincîrê xistin mêtinkaran  
 Min birçîtî naskir di zîndanên stemkaran de

Lê dîsa taqet ma di nava min de, ez bernedam  
Ya ji min re hêvîyê tîne, bi rojên nuh diçirûse

[www.arsivakurd.org](http://www.arsivakurd.org)

## YEWNANÎSTAN



YANNIS RITSOS

01 Gulan 1909 Monemvasia – 11 Mijdar 1990 Atîna

## AŞTÎ

Aştî, xeyala ku zarok dibîne.  
 Aştî, xeyala ku dayik dibîne.  
 Aştî, gotinên evîne yên li bin daran tên gotin.

Di belekîya êvarî, di çavên xwe de bi bişirînek şa gava bav vedigere  
 Ku di destê wî de selikek tije mêwe;  
 Û ji bo hênik bibe av, mîna kûzê ji axê li ber pacê hatîye danîn  
 Niqutên xwêdanê li enîya wê..

Gava bên girtin şûna birînên rûyê erdê  
 Gava dar bên çikandin di çalên ku gulleyên topan vekirîye,  
 Gava xuya bibe bişkojên hêvîyê yên pêşî,  
 Di dilên ku şewatê ew helland û qedand,  
 Gava karibin bi aramî razên mirî, xema nexun êdî,  
 Bi zanîna ku vala neherikîye xwîna wan,  
 Vay aştî ev e.

Aştî, bêhdana xwarinên germ yên êvarî ne  
 Gava dil ji tirsê nede lerezandin, dengê firêna ji nişka de li kuçê  
 Û deriyê bêt lêdan, tenê heval bêt zanîn.  
 Aştî, çi gavê dibe bira bive, ji paceyek bêt vekirin  
 Tijebûna hundir ya rûyê ezman e;  
 Rûyê ezman, yê bi naqosên xwe, yên ji rengên xwe dûr ketine

Ku di rojên cejnan, di çavên me de lêdidin.  
Vay aşî ev e.

Tasek şîrê germ e aşî, û vegirtina pirtûkekê ya li ber çavê zarokekî şiyar dibe.  
Gava simbil dirêj bibin û bi pispis ji hev re bêjin rewşen! rewşen!  
Gava ji hewdê asoyê bixurişe rewşen.  
Vay aşî ev e.

Gava zîndan bibin pirtûkxane  
Gava derî bi derî bigere stranek di şevê de  
Û hîva li çarde, rûyê xwe yê pak û teze rê bide di pişt ewrekî re  
Mîna karkirekî ku êvara şemiyê pîr û pak derkeve ji berber;  
Vay aşî ev e.

Her roja ku diçe, ne rojêke hatibe windakirin  
Gava bibe kokek di şevê de  
Ji jîndarbûna pelên şahîyê re  
Gava her roja derbasbûbe, rojêke hatibe qezenckirin  
Li pey xewek kûr ya mirovekî tendurist  
Û dawîn, gava em ji nû de hisbikin  
Ji bo biqewirîne êşan ji hemû derdorên demê  
Ku gava dîzmeyên xwe yên diçirûsîne bikişîne ro  
Vay aşî ev e.

Aşî, li zevîyên havînê gurzên tîrêja ne,  
Alfêba qencîyê ye ew li ser çongên şeveqê.  
Gotina herkes bêje bira ji hev re,  
Bêje em`ê sibê cîhanek nû avabikin;  
Û avakirina me ya vê cîhanê ya bi sitranan.  
Vay aşî ev e.

Roja di dilan de pir hindik cîh bigire mirin  
Gava kamiranî rê bide tilîyên rêyan yên ji xwe ewle  
Roja hozan û karker karibe bikişîne hundirê xwe bi wekhevî  
Mêxika mezin ya tarîya gewrik..  
Vay aşî ev e.

Aşî, destên mirov yên bi şîd hevdû zevt kirine  
Nanekî gewr e ew, li ser maseya cîhanê.  
Aşî, ji xeynî bişîrandina dayikekê ne tiştêkî din e.

Û haletên di erdê de xetên kûr vedikin  
Her yek gotin e nivîsandina wan:  
Aştî.

Û trênek pêşde diçe berbe pêşerojê  
Diherike di ser rêyên ristên min re  
Trênek ji genim û ji gulan barkirî.  
Vay ev trêna aştî ye.

Birano, di aştîyê de encax  
Wê kûr kûr bêhn vede gerdûn.  
Hemû gerdûn, hilgire hemû xeyalên xwe.  
Birano, dirêjkin destên xwe.  
Vay aştî ev e.

## YEKÎTÎYA KOMARÊN SOSYALÎST ÊN SOVYETÊ (R Û S Y A)

**YEVGENY YEVTUŞENKO**

18 Tîrmeh 1933 Zîma, Irkuts

**KULÎLK Û GULLE**

Gulle hez nakin ji te Allîson  
 Ji bo tu evîndara kulîlka ye  
 Gulle werê dexsok in  
 Werê dilhişk in nikarim bêjim  
 Tu bihara nozdeh salî  
 Tu kulîlkek di nasnama mirov de  
 Dîsa nikarim binerim li wêneyê te yê min dît  
 Tu bedewîyek ku dest lê nayê gerandin  
 Çawa te kuştin

Hestên herî paqij di dilê te de bûn  
 Hêvî, ronahî, serbilindayîya sibehan  
 Tu rehjena ûjdanan, tu bîrewerî bû  
 Te tije kulîlk kir lûleyên hemberî xwe  
 Û te got ku: "kulîlk ji guleyan bilintir in"  
 Lê wê kî di te bigehîştta li wira  
 Tu keçkulîlkek bû, tu teyrîkek aştiyê bû Allîson

Te rahîşt û kulîlk reşand li wî welatî  
 Li wî welatê ku rastî ceza dibû hingê  
 Li wî welatê şetî di ser rûmetan re bû  
 Û tu çend kes bû Allîson  
 Li hember kulîlkê gulle

Li hember hezkirinê nefret  
Va ye dawîya bi jan ya te berê xwe dayiyê

Li temamê gerdûnê kulîlkên sêva niha  
Bi kincên reşîqîr xwe nixwamtin  
Bîhna xamekan ji wî bayê bi jan tê  
Bîranînekê mezin dike, bi pêlên tije şûn  
Tu di nav xwînê de vezelîyaye Allîson  
Û bi ser te de diqîre serok Nîxon:  
«Engizvanino, serserîno, pêxwasno»

Tu dirêjbûye û maye li ser gîhan  
Li çarhawîr belav bûne pirtûkên te Allîson  
Êdî ne kinc hene ji te re bîn lixwekirin  
Ne wêje heye bê domandin, ne pîşeyên-delal  
Lê rastîyek reş mezin dibe ji nû de  
Derew, qirkirin, mirin  
Bibêm Hîtlar, ji nişka de wê bîranin bilerizin  
U hemî dêyên cîhanê niha  
Wê bibên: «Ax Xwedêyo, ax Allîson`a min, ax Kulîlka min»

Wê dîsa dîlan be li ser keştîyan mirin  
Mirin li Vîyetnam, mirin li Kamboçya  
Rabin ser pêya keçên Tokyo  
Rabin bimeşin xortên Roma  
Rabin kulîlk kulîlk, zêde bibin şînêşîn  
Hûn laleno, beybûnino, yasemînino  
Bigirin devê durûtîyê  
Bipelêxin û derbasbin derewên bi rûpûş

Rawestînin perwaneyên keştîyên cengê  
Hûn lavlavkê zevt bikin ji qevzan  
Hûn xamekên robarê Ganj  
Hûn zerînên li perava Nîl  
Bişikînin baskên jetên mirinê  
Hûn gulên bi fêz, hûn jî tevî çalakîyê bibin  
Kunbikin tankên benzîne  
Û bila bibînin hêza kulîlkan


Kulîlk ji gulleyan bêhempa delaltir in  
Belav bikin vê rastîyê hûn Allîson`ên kulîlk



Girêbidin destên mêrkujan li her deverê  
 Mezin bikin rastîyê, li welatê xwe pêl bi pêl  
 Bişkînin destên li pitikan digerin

Li hemberî derewan derên, artêş bi artêş  
 Dîwarên berxwedariyê bilind bikin  
 Rewşen bikin bi kamiranî wan çavên bi jan  
 Bedewîyê biparêzin, rastîyê biparêzin  
 Ji rêyê gundan, ji çiyar, ji deştan  
 Mîna lehîyê biherikin ber be bêdawîyê de

Koman pir bikin, kom kom bi hezkirin  
 Û tu keça pîrozwer Allîson  
 Tu keçkulîlk, rabe ji goristana xwe  
 Bilind bibe mîna qirnekî nemir  
 Bilind bibe kulîlka bi kelem ya berxwedariyê  
 Ne bêeger e xwîna ku te da rijandin



**YILMAZ GUNEY**

01 Nîsan 1937 Sêwreg – 09 Ilon 1984 Parîs

### **CANÊ, YARÊ, DILÊ**

Ev dîwar têrnakin me ji hev biqetîne tu zanibe...  
 Ev tilîyên hesin, ev derîyên hesin, ev hewa, bawer bike...  
 Carna bi qasî ku bi kulmekê bixim xurt,  
 Carna mîna serçeyekî qels bim, egerekî wê hey e...  
 Ma zora kîjan zahmetê nebirîye mirov.  
 Serde jî xwedî bike di nava xwe de vê hezkirina mirovane.  
 Rojên xweş di rawestgehê dijwar re derbas dibe yarê.  
 Dilop dilop dicive mirov.  
 Dilop dilop yarê...  
 Rojekê emê di nava jîyanê de wenda bibin...  
 Wê dîwar hilweşin, hemû derî vebin tu zanibe.  
 Niha dilê min tu ye, li te dide û dajo...  
 Ê dîsa dilop dilop zêde dibe tu di nava min de.



**YILMAZ ODABAŞI**

15 Tebax 1962 Amed

## HEY JÎYAN

Hey jîyan, tu şewqa heyvek çardeyî li avan e.  
Bi rastî tune me di vê lîstikê de,  
Bila min tune bihesibîne temenê min.

Jîyan darekî bîlardoyê;  
Tê li coşa temenê te dixê.  
Gava zimanê te tê girtin,  
Tu nikare bipeyive...

Çiqas tu radipelike bilind dibin çîya.  
Tu têkdiçe tu tenha  
Û di dilê te de goristana çivîkan;  
Tu nikare xwe pê bigire!

Xelk ji sewdan dem digire,  
Evînê mezin dîke ji stêran;  
Lê tu xeyalên te qedexene,  
Tu nikare pê bibe...

Ger te ji yekê hezkiribe di salên borî.  
Mîna birînek axivîye hîna.  
Hîna jî tê çiqas pir bêrîyê bikê,  
Tu nikare bigirî...

Li ser rêya te pira dirizin.  
 Dengê te, dibê qey bêdengî ye di himînê de.  
 Berbadike jîyan te dike arî,  
 Tu nikare rabe!

Baneşanek tikîtenê ye tu  
 Di wan baranên dunyayê şildike.  
 Hertişt dikişîne û dehf dide,  
 Tu nikare bêje...

Jîyan darekî bîlardoyê;  
 Va ye tê li coşa temenê te dixê.  
 Di dengê te qîrîn difetisin,  
 Lê tu nikare biqîre...

Piştî dem digehê, ax bi te re dibişire;  
 Di nivê temenekî dûdirêj de  
 Ne jîyan ne mirin  
 Li te nayê...

Divê tu bide nivîsandin li kevirê gora xwe:  
 Hey jîyan, tu şewqa heyvek çardeyî li avan e,  
 Bi rastî tucar nebûm di vê listikê de,  
 Bila min tune bihesibîne temenê min...



**YUSUF HAYALOGU**

1953 Dêrsim – 03 Adar 2009 Îstanbû

### ÊŞÊN MEZIN

Ji rûyê min firarkir çavîn min  
Niha li deryakê dinerin  
Di nava çar dîwaran de mame  
Yên li ba min werê dibên

Hesinê ranzê ku serê xwe lêdixim  
Dîwarê sar ku kezeba min dimije  
Min berfên serê xwe pirkirîye  
Yên li ba min werê dibên

Roja min `î serdanê nebû hîna  
Hîn nû destpêdike êşên mezin  
Û hîna têra xwe ez`ê biêşim  
Yên li ba min werê dibên

Ez`ê te nebînim êdî  
Jixwe qedîyabûn bîranîn  
Dibe ku sibê min bibin  
Yên li ba min werê dibên

Hêvî dikim tê baş li çavên min binêre  
Rojê mîlyoncaran li te digerin  
Min devji hestên din tevan bernedaye  
Yên li ba min werê dibên